



K.T.

**ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ**

**RENGVEDANA BINEMAYÊN NÛXWAZÎYÊ DI HELBESTÊN HIZIRVAN
EBDULLAH DE**

TEZA LÎSANS A BILIND

AMADEKAR

Ramadhan Ameen Mohammed BANKÎ

ŞÊWIRMEND

Doç. Dr. Seyit Battal UĞURLU

WAN - 2019

**T.C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**HIZIRVAN EBDULLAH'IN ŞİİRLERİNDE MODERNİZMİN
YANSIMALARI**

YÜKSEK LİSANS TEZİ

HAZIRLAYAN

Ramadhan Ameen Mohammed BANKİ

DANIŞMAN

Doç. Dr. Seyit Battal UĞURLU

VAN - 2019

TEZ KABUL TUTANAĞI
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Doç. Dr. Seyit Battal UĞURLU danışmanlığında, Ramadhan Ameen Mohammed BANKİ tarafından hazırlanan “**Rengvedana Binemayên Nûxwazîyê Di Helbestên Hîzirvan Abdullah Da**” adlı bu çalışma, 07/10/2019 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı’nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan(Danışman) : Doç. Dr. Seyit Battal UĞURLU

İmza:

ÜYE : Dr. Öğr. Üyesi Kemal KAYA

İmza:

ÜYE : Doç. Dr. Üyesi Ayhan TEK

İmza:

ÜYE :

İmza:

ÜYE :

İmza:

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylıyorum.

Prof. Dr. Murat DEMİRKİTİ



(Teza Lîsansa Bilind)
Ramadhan Ameen Mohammed Bankî

ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
Îlon, 2019

**(RENGVEDANA BINEMAYÊN NÛXWAZÎYÊ DI HELBESTÊN
HIZIRVAN EBDULLAH DE)**

KURTE

Wêjeya Kurdî xwedîyê gelek xalên bi hêz û lawaz e ku dikarin bibin mijara xebatên lêkolînê. Yek ji wan mijaran jî nûxwazî û bandora wê ya li ser zimanê Kurdî ye. Armanca sereke ji hîlbijartina vê mijarê jî ev e ku em bikaribin li ser bîngeha şewaza û şîrovekirina lêkolînê, bandora nûxwazîyê li ser edebiyata Kurdî di devera Behdînan de û bizavên girêdayî vê zelal bikin û hin rûpelên nexwendî di vê derbarê de bidin nîşandan.

Di vê lêkolîna xwe de me qederek behsa edebiyata nûxwazîye kiriye di destpêkê de peyva modêrnîzm anko nûxwazîyê kirîye ji alîyê ziman ve. Her weha di vê xebatê de tarîxa edebiyata nûxwazîye jî hatîye zelalkirin. Cihê derketin û peydabûna wê ya li Ewropayê û di nav Iraqê de jî hatîye zelalkirin.

Di tezê de hemû komên nûxwazîyê yên li deverên Kurdên Îraqê hatine nasandin. Yekemîn grûp di destpêka sala 1970an de hatîye damezrandin ku ew grûba Kerkûk-Kîfrî bû. Piştî vê grûbê bi çend mehan grûbeke din a nûxwaz ava dibe ku ew jî gruba Rewange ye ya ku helbestvanê navdar Şêrko Bêkes serkêşîya wê dîke. Piştî van her du grûban, grûba Wêran û Nûkirina Her û Her di sala 1994an de grûba Nûxwaza Akrê di sala 1995an de hatîye damezrandin.

Hizirvan Ebdullah ji yek damezrînerê Koma Bajara Duhokê ye. Di vê tezê de rengvedana binemayên nûxwazîyê li ser helbestên wî hatîne piraktîze kirin. Ji hêla zimanê helbestê ve her weha hêmanên helbestê û awaza helbestê ya derekî û navekî,

qafîye di nav helbestê de. Yaxîbûn yêk ji bingehên nûxwazî ye û ev bingeha nûxwazîyê di vê tezê de hatîye zelal kirin.

Peyvên Sereke : Nûxwazî, Nûxwazîya Kurdên Îraqê, Nûkirin Her û Her, Herêma Behdînan, Helbestên Hîzîrvan Ebdullah.

Hejmara Rûpelan : 122 + XIII

Şêwirmend : Doç. Dr. Seyît Batal UĞURLU



(Yüksek Lisans Tezi)

Ramadhan Ameen Mohammed Bankî

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
Eylül, 2019

**(HİZİRVAN EBDULLAH'IN ŞİİRLERİNDE MODERNİZMİN
YANSIMALARI)**

ÖZET

Kürt edebiyatı araştırmalara konu olabilecek birçok güçlü ve zayıf noktalara sahiptir. Bu konulardan biri de yenilikçilik ve bunun bilhassa Kürt dili ve farklı ağızları üzerine olan etkisidir. Bu konunun seçilmesindeki asıl amaç; araştırmanın yorumlama üslubunun temeli üzerine, yenilikçiliğin Kürt edebiyatı bilhassa Bahdînan yöresi üzerindeki etkisi ve buna bağlı edebi grupları ortaya çıkarmak ve bu grupların bilinmeyen hususiyetlerini ortaya koymaktır.

Bu çalışmada yenilikçilik kavramına yer verdik. Yenilikçiliği açıkladık ardından modernizm kavramının tanımlarına yer verdik. Aynı zamanda bu çalışmamızda modern edebiyatın tarihini açıklığa kavuşturmaya çalıştık.

Modernizmin Avrupa'daki ve Irak'taki gelişim evrelerine de değinildi ve . Bu çalışmamızda modernizmin Kürt yörelerindeki akımlarına, kabul görmüş gruplarına yer verdik. İlk grup “Kerkük Kifrî” adı ile 70li yıllarda ortaya çıkmıştır. Bu grubun temsilcileri durma noktasındaki edebiyatlarını geliştirme fikrini savunmaktadırlar. Muhim şairlerinden biri Şêrko Bêkes e. Buna benzer birçok grup ortaya çıkmıştır. Örneğin; “Kerkük Kifrî” 1971 de, “Wêran” 1994 de kuruldu ve “Akrê” ile “Koma Nûkirin Her û Her” 1995 senesinde Behdînan yöresinde ve Duhok şehrinde ortaya çıkmıştır.

Hizirvan Ebdullah, Duhok şehrindeki grubun temsilcilerinden biridir. Bu çalışmamızda yenilikçiliğin temelleri söz konusu düşünürün şiirleri üzerindeki yansıması, aynı zamanda dil açısından şiirin unsurları ve şiirdeki kafiye açısından

yorumlanmıřtır. Eleřtiri modernizmin temelleriden biridir ve bu tezde bu konu aıęa kavuřturulmuřtur.

Anahtar Kelimeler : Modernizm, Irak Krtlerinin Yenilikiligi, Her u Her Yenilikiligi, Behdınan Blgesi, Hızırvan Ebdullah'ın Őiirleri.

Sayfa Sayısı : 122 + XIII

Tez Danıřmanı : Do. Dr. Seyit Battal UęURLU



(M.Sc. Thesis)

Ramadhan Ameen Mohammed Bankî

VAN YÜZÜNCÜ YIL UNIVERSITY
INSTITUTE OF LIVING LANGUAGES
September, 2019

**(THE REFLECTION OF MODERNISM IN POETRY OF HIZIRVAN
EBDULLAH)**

ABSTRACT

Kurdish literature has many strong and weak points that can be the subject of research. One of these issues is innovation and especially its effect on Kurdish language and different dialects. The main purpose of selecting this subject is to reveal the effects of innovation on Kurdish literature, especially in Behdînan region, and the related literary groups and the unknown characteristics of these groups on the basis of the interpretation style of the research. We have included the concept of innovation in this study. We explained innovation, and then included definitions of modernism. At the same time, we tried to clarify the history of modern literature in this study.

The emergence of modernism based on Europe and the Iraq has been discussed. In this study, we have included modernist movements in Kurdish regions and accepted groups. The first group emerged in 1970s named “Kirkuk Kifî”. The representatives of this group advocate the idea of developing their literature which is came to a standstill. Şêrko Bêkes is one of the representatives. Many similar groups have emerged. For Example, “Kirkuk Kifî” was founded in 1971 and “Wêran” was emerged in 1995. Besides, “Akrê” and “Koma Nûkirin Her û Her” have emerged in 1994 in Behdînan Region, Duhok.

Hizirvan Ebdullah is one of the representatives of the group in Duhok. In this study, the foundations of innovation were interpreted in perspective of reflection on the poems of the thinker, the elements of poetry and rhyme in poetry. Criticism is one of the foundations of modernism and this topic has been clarified.

Key Words : Modernism, Innovation of Irai Kurds, Her û her
Innovation, Behdînan Region, Poetry of Hîzirvan Ebdullah.

Quantity of Page : 122 + XIII

Supervisor : Doç. Dr. Seyit Battal UĞURLU



KURTEBÊJE

b.	berg
c.	cild
ç.	çap
g.	gotar
h.	hejmar
hwd.	herwekî din
K.T.	Komara Tirkiyeyê
r.	rûpel
s.	sal
T.C.	Türkiye Cumhuriyeti
z.	zayînî

NAVEROK

KURTE	ii
ÖZET	iv
ABSTRACT	vi
KURTEBÊJE	viii
NAVEROK	ix
PÊŞGOTIN	xii
1. DESTPÊK	1
BEŞA YEKEM	
1.1. PÊNASE Û DÎROKA NÛXWAZÎYÊ.....	1
1.1.1. Pênaseyên Têgeha Nûxwazîyê.....	1
1.1.2. Dîroka Nûxwazîya Ewropî.....	5
1.1.2.1. Qonaxa Yekem (1849-1880).....	6
1.1.2.2. Qonaxa Duyem (1880-1910).....	6
1.1.2.3. Qonaxa Sêyem (1920-1930).....	7
1.1.3. Dîroka Nûxwazîya Îraqê.....	8
1.1.4. Dîroka Nûxwazîya Kurdî.....	10
BEŞA DÛYEM	
2. DI EDEBÎYATA KURDÊN ÎRAQÊ DE NÛXWAZÎ	13
2.1. Wêjeya Nûxwaz ya Kurdên Îraqê.....	13
2.2. Girintirîn Komên Nûxwaz yên Kurdên Îraqê.....	14
2.2.1. Koma Kerkûk - Kifrîyê (1970).....	14
2.2.2. Daxûyanîya Komê.....	15
2.2.3. Armancên Daxûyanîya Komê.....	16
2.3. Koma Rewange (1970).....	21
2.3.1. Egerên Serhildana Vê Komê.....	22
2.3.2. Damezrandina Komê.....	22
2.3.3. Kûrteyek ji Bangewazîya Wan.....	25
2.3.4. Kovara Rewange.....	26
2.4. Koma Wêran (1994).....	29
2.4.1. Kovara Komê.....	31

2.4.2. Kurtîyek ji Armancên Daxûyanîya Komê	33
2.5. Koma Nûkirina Her û Her (1994)	36
2.5.1. Hizra Avakirina Koma Her û Her	36
2.5.2. Armanca Damezrandina Komê.....	38
2.5.3. Hizirvan Ebdullah Armancên Komê Di Wan Xalan De Dîyar Dike	39
2.5.4. Çalakîyên Komê	40
2.5.5. Kovara Nûwxaz	41
2.5.6. Nebûna Daxûyanîyê.....	42
2.5.7. Rola Hizirvan Ebdullah di Nava Koma Nûkirin Her û Her de	42
2.6. Koma Nûxwazên Akrê (1995).....	45
2.6.1. Damezrandina Komê	45
2.6.2. Daxûyanîya Komê	47
2.6.3. Xebatên Komê	48
2.7. Di Nav Kurdên Iraqe De Bingehên Nûxwazîyê	50
2.7.1. Naverok.....	50
2.7.2. Şikl.....	51
2.7.3. Yaxîbûn (Rikberî).....	51
2.7.4. Çemk û Pênasyên Yaxîbûnê	52
2.7.5. Yaxîbûn Ji Hêla Zaraveyê Ve	54
2.7.6. Yaxîbûn Ji Hêla Ferhengê Ve.....	54
2.7.7. Girîngîya Yaxîbûnê.....	55
2.7.8. Egerên Yaxîbûnê.....	55

BEŞA SÊYEM

3. JÎYAN Ê PIRAKTÎZEKIRIN DI HELBESTÊN HIZIRVAN EBDULLAH DE	57
3.1. Jiyana Kesokî.....	57
3.2. Zarokîya Wî.....	57
3.3. Xêzana Wî	58
3.4. Jiyana Edebî.....	58
3.4.1. Taybetiyên Wî yên Edebî	60
3.4.2. Taybetmendiyên Romanên Hizirvan Ebdullah.....	62
3.5. Hizirvan û Fikrên Wî.....	67
3.5.1. Huner	67
3.5.2. Civak.....	70

3.5.3. Siyaset.....	72
3.5.4. Berhemên Wî.....	74
3.6. Zimanê Helbestê.....	76
3.6.1. Zimanê Helbesta Nûxwaz.....	76
3.7. Hêma di Helbestê de.....	80
3.7.1. Hêmayên Efsaneyî.....	82
3.7.2. Hêmanên Sirûştî.....	83
3.7.3. Hêmayên Dîrokî.....	85
3.8. Wêneyên Helbestê.....	86
3.9. Awazên Helbestê.....	90
3.9.1. Awaza Têgeh.....	90
3.9.2. Awaza Derekî.....	90
3.9.3. Ristên Helbestê, Hejmara Birga û Yekeyên Şîrî.....	91
3.9.4. Ristên Wekhev û Hevdij.....	92
3.10. Awaza Navekî.....	93
3.11. Serwa (Qafîye).....	96
3.12. Xalbendî.....	100
3.13. Topogirafî.....	101
3.14. Binyadên Hizrî.....	103
3.15. Yaxîbûn (Rikberî).....	104
3.15.1. Civakî.....	104
3.15.2. Derûnî.....	107
3.15.3. Sîyasî.....	109
ENCAM.....	112
ÇAVKANÎ.....	115

PÊŞGOTIN

Nûxwazî mîna bizaveka edebî di sedsala nozdehem de li Ewropayê serfihilda ye. Bizava nûxwazîyê serzemîna Ewropî tevahî wergirt û sinorê welatên Ewropa derbaz kir, gehîşte gelek welatên cîhanê û welatên ‘Ereban, yekem bizava edebiyata nûxwazîyê dinav ‘Ereban de li welatê Misrê destpêkir.

Nûxwazî bi vî awayî li hemû cîhanê berbelav bû û pir girînge di warê edebî de bi taybet jî di warê helbestê de. Cîhanê pêşwazî li vê edebîyatê kirîye lê hatina vê pêla nûxwazîyê ji bo cîhanê tevahî, lê her welatekê bi reng û şêwazekê cuda pêşwazî li vê pêla nûxwazîyê kirîye.

Ev pêla edebîyata nûxwazîyê gehîşte tevahîya cîhanê. Lê ev welatên pêşkeftî û pêşveçûyî her zû ev edebîyate gehîşte wan, lê di welatên paşkeftî ku dezgehên çapê belavkirinê û wergeranê li wan kêmbûn li van cihan ev pêla zû negehîştîyê, wan dereng pêşwazî li vê pêla nûxwazîyê kirine.

Lêbelê hinek cîh û welatan nûxwazî rasterast negehîştîye wan, belkî bi rêya berhemên wergêrandî yan karîgerbûna bi komeka hebestvanên cîran û hevsinor, bi rêya wan nûxwazî gehîştîyê. Anko nûxwazî rasterast ji Ewropayê negehîştîyê wan welatan.

Heman dem ev bizava nûxwazîya edebiyatê gehîştîyê deverên Kurdistan jî. Lê ev bizava edebiyata nûxwazî bi rêya helbestvanên ‘Ereban gehîştîyê deverên Kurdistan. Helbestvanên me çavlêkirina helbestvanên ‘Ereban dikirin, helbestvanên ‘Ereban çav li helbestvanê Ewropî dikirin anko rasterast ev edebiyata nûxwazî negehîştîyê wan. Belkî bi rêya berhemên edebî yê wergêrandî gehîştîye Kurdên Îraqê.

Nûxwazîyê cihê xwe di nav hemî edebîyatên cîhanê de girtîye. Gelek netewan nûxwazî wergirtîye belê neşîyane weke xwe binemayên nûxwazîya Ewropî wergirin. Çunkî ji ber egerên sîyasî, cîvakî û ayînî neşîyan bi temamî binemayên nûxwazîya Ewropî di nav xwe de biçespînin.

Mirov dikare bibêje ku nivîskarên me piranîya wan şarezayî di zimanê Ewropî de nebû. Wan zimanê ‘Erebî dizanîbû çunkî ji berî hatina vê pêla nûxwazîyê,

edebîyata ‘Erebî ya îslamî bandor li ser wan kiribû. Wan berhemên xwe li jêr karîgerî ya vê edebîyatê nivîsîn piştî gehîştina edebîyata nûxwazîyê van nivîskarên me şîyan çendekê xwe ji edebîyata ‘Erebîya kêşa aruzî dûr bixin. Hatina pêla nûxwazîyê bo nav Kurdên devera Behdînan bi rêya berhemên ‘Erebî yên wergêranî gehîştîye dinav helbestvan û nûxwazîyên deverê. Şîyan tamamî xwe ji edebîyata ‘Erebîya klasîk xilas kin, zimanekê Kurdî yê resen bikarbînin û digel peyvên tam û tevlihev, gorankarîyeka mezin di şikl û naverokê de bikin. Bi tamamî berhemên xwe bi edebîyata nûxwazî nivîsîn.

Berhemên li vêrê, li def helbestvan Hızırvan Ebdullah hatine wergirtin ku di vê tezê de binemayên nûxwazîyê li ser helbestên wî piraktîzekîn ji hêla şikil û naverokê ve. Helbestvan Hızırvan Ebdullah çend pirtûkên helbestên xwe xistin berdestê me û çend Hevpeyvîn li gel me sazkin.

Ev xebate jî, ji despêk, du beşan û encamê ve pêk tê.

Beşa Yekem: Ev beşe binavê “*Pênase û Dîroka Nûxwazîyê*” ku qederek me dinava xebata xwe de behis kirîye.

Beşa Dûyem: Ev beşa bi navê “*Di Edebîyata Kurdên Îraqê De Nûxwazî*”. Di çande behis li komê nûxwaz yên kurdên îraqê, yaxîbûnê kîn.

Beşa Sêyem: Ev beşe li jêr jî nav û nîşan behsa “*jîyan û Piraktîzekirin Di Helbestên Hızırvan Ebdullah De*” dike. Her weha ji jîyana wî û taybetîyên edebîyata wî hatîne behiskirin.

Ez berîya her tiştî spasîya Xwedayê mezin û mamosteyên hêja û rêzdar ên beşa zimanê Kurdî li Zanîngeha Van Yüzüncü Yıl ê dikim ku bi ked û dilsozîyeke herî zêde bi me re westîyan. Her weha ez pir spasîya Doç. Dr Seyit Battal Uğurlu dikim ku erkê serpereştîkirina vê lêkolînê bi stûyê xwe ve girtîye. Ji ber parvekirina fikir û ramanên xwe yên nirxbilind.

Spasî jibo lijneyê û rexne û şirovryên wan. Doç .Dr.Ayhan Tek û Dr. Öğr.Gör Kemal kaya.

Her weha pir ji dil spasîya mamosteyên qedirgiran Hizirvan Ebdullah û Dr. Abdulqadir NURÎ û Şivan QASÎM li Zanîngeha Zaxo dikim ku bi pêşniyarî û rê nîşankirina wan va gelek arîşe li ber min ronbûn. Hem di warê Kurdîzanebûnê de hem jî di warê akademîk de alîkarîyên wan gelek çêbûn. Her weha Abdurehman Bamernî ku alîkarîyên mezin bi me kiriye.

Ji bo sererastkirin û xwendina tezê û wergera zimanê tirkî birêz lêkolîner Ehmed SERHEDÎ û Mamoste YEHYA re jî gelek spasdarim û mala wan ava. Her weha di pêvajoya vê xebatê de ji bo sebr û tehemûl û alîkarîya wan kesên ku alîkarîya me ya manewî kirine spasdarim.

Her weha ez ji hevalên xwe yê hêja û delal yê beşa zimanê Kurdî re jî bi dilgermî spas dikim. Ku gelek alîkar bûn digel min, her ji destpêkê û heta dawîyê.

Dîsan vê xebatê pêşkêşî dayîk û bavên xwe dikim ku her tim alîkarên min yê maddî û manevî bûn, zêdebarî xweşik û bira û hemû malbata xwe dikim. Û di dawîyê de dîsa spasî ji bo her kesê ku alîkar bûye digel me ji bo bi dawî anîna vê xebatê.

1. DESTPÊK BAŞA YEKEM

1.1. PÊNASE Û DÎROKA NÛXWAZÎYÊ

1.1.1. Pênaseyên Têgeha Nûxwazîyê

Nûxwazî yek ji mijarên herî girîng e di cîhana me de bi taybetî edebîyata nûxwazîyê di sed sala 19an de li Ewropayê serî hilda bi rengê bizav û pêlên edebî, paşê van pêlên edebîyata nûxwazî sînorê Ewropayê derbas kir û gihîşt piraniya welatên cîhanê. Peyva nûxwazîyê di gelek zimanan de bi rengên cuda hatîye gotin, her welatekî li gorî edebîyata xwe peyva nûxwazîyê di nava zimanê xwe de bi kar anîye.

Di pir çavkanîyan de behs li têgeha nûxwazîyê hatîye kirin, li gorî edebîyata zimanên cuda guherîn di vê têgehê de çêbûne. Her zimanî bi rengêkî cuda peyva nûxwazîyê wergirtîye. Di zimanê ‘Erebî, Îngilîzî û Fransî de têgeha nûxwazîyê bi peyvên cuda hatîye bikaranîn û bi vî awayî sûdê ji vê têgehê werdigirin. “Modernîzm di zimanê ‘Erebî de li hemberî peyva “El-Hedaset”ê, di zimanê Îngilîzî û Fransî de li hemberî peyva “Modernite”yê hatîye bikaranîn. Modernîzm weke pêvajoyekê di wêjeyê de bi wateya “Modernîzm”ê hatîye nasandin” (Touraine, 1998: 3). Di zimanê Kurdî de “modern, modernîzm, nûgerî, nûjenxwazî, nûxwazî h.w.d tên bikaranîn” (Resûl, 2005: 17). Ji wan zimanên ku me amaje pê kir, her yekî li gorî wêjeya xwe peyva nûxwazîyê wergirtîye, bi taybetî di zimanên cîhanê de ev têgeh bi rengên cuda hatîye pê, di zimanê kurdî de jî bi çend peyvên cuda cih girtîye. Ev yek jî bûye sedem ku “Nûxwazî” ji hêla têgehê ve aloz bibe.

Têgeha nûxwazîyê di pirtûka Yadgar Resûl de tê vekolîn. Li gorî vê çavkanîyê di zimanê Îngilîzî de li beramberî têgeha nûxwazîyê peyva “Modernism” û “Innovation”ê, her weha di zimanê Erebî de jî li beramberî vê têgehê “El Hedase” û “Tecdid” tê gotin” (Resûl, 2005: 17). Anko têgeha nûxwazîyê têgeheke berfireh û aloz e, her zimanekî li gorî wêjeya xwe peyvek li hemberî vê têgehê bi kar anîye.

Her wekî me amaje pê kir pir çavkanîyan li ser vê têgehê xeber daye. Di pirtûka Rêzan Şivan de der barê têgeha nûxwazîyê de wehahatîye gotin: “Nûxwazî di

eslê xwe de têgeheke Latîni ye ku ji peyva “modern”ê hatîye girtin ku tê wateya “nû yan dawî”yê (Şiwan, 2012: 184). Anko nûxwazî di eslê xwe de ji peyveke Latîni bû ku jê re “Moderin” dihat gotin, paşê ev peyva latîni guherîn bi ser de hat, heta di qadên wêjeyê de jî ji vê guherînê peyva “Nûxwazî”yê hatîye dariştin.

Her der barê peywendîya peyva nûxwazîyê ya bi têgeha Latîniyê ve Şemal Akrey weha amaje pê dike: “Peyva “modernus” a Latîni ji bo cara yekem di sedsala 5an a zayîni de bi armanca ji hev veqetandina serdema Mesîhî û Putperestîya Romayê bi wateya “nûbûn û nûkirinê” dihat bikaranîn (Akrê, 2010:175). Anko ev peyv her ji mêj ve hebûye, lê der barê nûkirinê de her bi heman wateyê bûye. Bi tenê ji aliyê wêjeyê ve dûr bûye. Di serdema mesîhîyetê de her ev peyv ji bo nûkirinê hatîye bikaranîn, her wekî çawa di sedsala 19an de li Ewropayê ji bo wêjeyê dihat bikaranîn

Her der barê hatina têgeha “Nûxwazîyê” ya di nava qadên wêjeyê de, nivîskar û romanîvîsê navdar Bavê Nazê(1946),di pirtûka xwe de wehazelalî pê anîye: “Nûxwazî ji têgeha Fransî ya “modern”ê hatîye ku tê wateya serdema nûkirinê û nimûneyeke ji hizra hunerî ye û rêyeke ji rengvedana realîteyê ye. Di dawîya sedsala 19an û destpêka sedsala 20an de, wekî metodeke hunerî hatîye damezrandin. Li gorî vê metodê, nivîskar wênekêşîya jîyanê bi têgeh û helwestekê nû dike. Têgeha nûxwazîyê ji bo destnîşankirina dîyardeyên nû di huner û edebê de, destpêka sedsala 20an hatîye bikaranîn ku wekî arasteyeke felsefe û hunerîya nerealîstî xwe daye nasîn. Hizra nûkirinê bi awayekî din nêrîna li bingehên felsefî, pîrensîbên afirandinê û zimanê klasîkî yê wêjeyî bixwe ye” (Nazê, 2001: 179). Li gorî ku vê çavkanîyê weha daye zelal kirin, dumahîya di sedsala 19an de yan destpêka sedsala 20an ku têgeha nûxwazîyê ji bo aşkerakirina dîyardeyên nû û edeb û hûnerên nû, her wehaji bo merem û hizrên nû di despêka sedsala 20an de hatîye rojevê.

Peywendîya vê têgehê bi edebiyat û helbestê re û peywendîya wê bi zanistên din re heye, derbarê vê yekê de nivîskar Îmad Weysî weha dibêje: “Li vir dîyar dibe ku modernîzm têgeheke sosyolojik, siyasî an jî dîrokî nîne. Lê belê dariştineke nû belavbûyî ye ku reng û hizrên kevn red dike. Anko berevajî hemû çandên kevn û kevnare ye” (Weysî, 2003: 40). Li gorî vê çavkanîyê nûxwazî dariştineke nû ye û reda tiştên kevn dike ku ev têgeh li dijî kevnatîyan radibe, hizir û avakirina tiştên nû

û nûxwaz bi xwe ve digire, ev peyv bi vî awayî ji alîyê navborîyê ve hatîye zelal kirin.

Li dûmahîyê ji bo me zelal bû ku têgeha nûxwazîyê di ‘eslê xwe de ji têgeha Latînyê hatîye wergirtin ku di serdemên kevin de jî her bi meremên nûbûn û nûkirinê dihat ‘emilandin. Li gorî van çavkanîyên ku me amaje pê kir di destpêka sedsala 20an de ketîye bizavên edebî û hunerî û bi armanca nûkirin û xelasbûna ji kevnatîyan bi kar hatîye. Ev têgeh di her zimanî de bi rengên cuda bi cih bûye da ku li gorî edeb û wêjeya wan bigunce û bihête qebûl kirin, di zimanê kurdî de bi gelek awayan ev têgeh bi cih bûye û ji ber vê sedemê ev têgeh di nava kurdan de aloz û xumamî maye.

Pênaseya nûxwazîyê di gelek çavkanîyan de bi rengên cuda hatîye pênasekirin. Her kesî li gorî alavên li ber destê xwe pênaseyek ji bo nûxwazîyê daye. Yekem pênaseya me divê em amaje pê bikin pirtûka wergêra ya li ser modernîzmê ye ku ji alîyê Behzad Hewêzî ve hatîye wergêrandin, li gorî wê pirtûkê: “Nûxwazî dîyarkirina têgehan cuda ye, ji ber vê yekê navlêkirinên nûxwazîyê bi wateyên cuda dihête danîn. Wateya nêzik xwe bi paş de dibe yan jî bêjeyên cuda ji wateya xwe ya ferhengî derdikeve, ev jî ji ber hindê ye ku hizra wan ji alîyê Eqlî ve her tiştêkî nû bi hev re girêdide. Wateya nû, wateya her tiştê pêşketî, tiştê eqlane û tiştê zanistî ye, lê belê em her tim destnîşankirinên weha nabînîn, ya ji bo me zelalkirî hevgirtineke li gel nûxwazîyê bi vê çendê rûdanek li qonaxekê dîyarî kirîye û li serdemekê bi encam hatîye” (Bradbury, 2008: 2). Li gorî vê çavkanîyê nûxwazî weha hatîye pênasekirin ku nûxwazî ji wateya xwe ya ferhengî derketîye. Ev jî ji ber vê yekê ye ku nûxwaz her tiştê zanistî û pêşketî bi hev re girêdide, wehadaye aşkerakirin nûxwazî yê rûdanekê li serdemekê gihiştîye encamê ku nûxwazî wek rûdanek yan jî bûyereke serdemî pênase kirîye.

Her di derbarê pênaseyên nûxwazîyê de Yadgar Resûl di pirtûka xwe de weha amaje pê dike: “Her nûkirin çavlêkirina berî xwe ye, lê dema digihêjin bilindahîya çavlêkirinê xwe bi dawî dikin û tiştê nû derdixin holê, bi vî awayî tiştê li xwe zêde dikin û bi cih dikin û tiştên din di heman demê de çêdibin. Pêdivîyên nûxwazîyê aşkere dibin, ji ber vê yekê tiştên nû digel tiştê kevin danûstandinê dike, pêşketin dibe rêgeza sereke ya nûxwazîyê” (Resûl, 2005:18). Li gorî vê pênaseyê ku hemû

tiştên nûxwazî çavlêkirin in, ew çavlêkirin her tim di firehbûnê de ne, heya êdî tiştên nû diafirînin, ew danûstandina nû digel tiştên kevn dibe havênê pêşketina wan, bi kurtî her tiştêkî nûxwaz çavlêkirinek e.

Di heman çavkanîyê de di derbarê pênaseya nûxwazîyê de weha tê gotin: “Nûxwazî berovajî têgehên din ne girêdayî demê ye û hemû nûxwazî rojekê ava dibe û berbelavî pêvajoyeke domdar dibe, lê dema ezmûna nûxwazîyê serî hilda, danûstandin li ser çêbûn, ev danûstandin bûne dîyardeyeke zîndî ji bo her bizava nûxwaz” (Resûl, 2005:18). Di vê pênaseyê de têgeha nûxwazîyê ji têgehên din cuda ye bi demê girêdayî nîne, weha zelal kiriye her nûxwazî ava dibe û dûmahî têt. Li gorî vê çavkanîyê nûxwazî jî bi dûmahîk têt. Herweha danûstandinên li ser nûxwazîyê bûye dîyardên zîndî û sûdewar ji bo bizavên nûxwazîyê.

Wek me amaje pê kir nûxwazî bi pênaseyên cuda hatîye dariştin, herweha di pirtûka Şivan Qêsim ya bi jênavê *Rêbaz û Mijarên Edebî* de weha çêl bi vê mijarê dibe: “Nûxwazî hizreke nû ye bi renekî nû, şêwazeke nû ye, li cihê tevgera kevn an şêwaza kevn, çî ji hêla civakî û komelayetîyê be û çî hemû hêlên jîyanê li xwe bigre (Nerweyî,2018: 76). Li gorî vê çavkanîyê ku nûxwazî hizr û regvedana nûye û li hizir û rengên kevn digre ji hemû alîyên civakî hunerî ve weha di vê pênaseyê de zelal bûye tiştê nû li cihê tiştê kevn didanin.

Her kesekê li gor nêrîna xwe pênaseyek ji bo nûxwazîyê danîye. Lêbelê faktora herî girîng ji bo hevnegirtina pênaseyekê li gorî vê têgehê ev e “ku nûxwazî bi hemû bûyer û hêlên jîyanê ve girêdayî ye. Li ser vê esasê jî em nikarin pênaseyeke bingehîn ji bo nûxwazîyê diyar bikin. Ji ber vê jî em dê çend pênaseyan ji bo zêdetir zelalkirina vê peyvê pêşkêş bikin. Emîn Rîhanî zana û ronakbîrekî ‘Ereb di derbarê nûxwazîyê de dibêje: Nûxwazî tê wateya rastîyeke felsefî” (Berwarî, 2010: 269). Têgeha peyva nûxwazî li gorî vê pênaseyê hemû alîyên jîyanê nûxwazî bixwe ve girtîye ji bo vê yekê heya niha pênaseyeke bingeh ji bo pê peyvê ne hatiye, her çavkanîyekê de û her zana yekê li gorî alavên xwe pênasekiriye.

Li dumahê ji bo me zelalê bû, nûxwazî bi çendîn rengên cuda cuda hatiye pênasekirin, pênaseyeka bingeyên heya niha ji bo vê têgeyê nehatiye. Bi reng û

şêwên ji hev cuda pê nase tê kirin ji aliyê feylesof, ronakbîr, nivîskar û vekolîneran ve û evajî bîte egerê fireh wateyê ji bo vê têgehê.

1.1.2. Dîroka Nûxwazîya Ewropî

Dema ku me guh li nûxwazîya ewropî dikin bi eşkerahî em dibînin ku weke jêderê nûxwazîya hemû cîhanê dibînin. Ku her welatekî çî zû çî dereng nûxwazîya xwe di bin çavlêkirina nûxwazîya ewropî de avakirîye. Nûxwazî li hemû cîhanê belavbûye, ew milletên ji hêla çandî û kulturî nêzîk Ewropayê bûn, her ku ev nûxwazîyê pêşwazîya vê pêla nûkirina edebî kir. Kurdan jî her cihekê bizava wergitina edebê nûxwazî kirîye. Li vê rê em bînin li ser mijara xwe, bizava nûxwazîya Ewropî, her çendê di biwarê felsefî, civaknasî h.w.d hizr û fikrên nûxwazîyê her ji kevn de hebûne lê ji sedsala 18an hêr ve bi awayeke zelal, “piştî derketina danezana mafê mirovan li Firensayê di sala 1789an, kartêkirneka mezin li ser firehkirina çarçoveya nûxwazîyê gêra, giringtirîn xalên vê carnayê kartêkirin li ser hizra nûxwazîyê hebû. Eve jî di madeya 10an de dibêjî; ku nabit tu kes ji ber hizr û bîrên xwe, eger hizr û bîrên eynî jîk be bitise” (Cihan, 2002: 51). Li gorî vê çavkanîyê yekem fikra nûxwazîyê li danezana mafê mirovan li Firensayê vedigere, bi taybetî di maddeya 10an de bandoreke mezin fikra nûxwazîyê li Ewropayê kir.

Her derbarê derketina dîroka fikrên nûxwazan li Ewropayê, geşkirina hizra şaristanî. Nîqaşkirinên hizrî li ser, şaristanî û komelayetî. Nûxwazî nîqaşkirineke zehmet darişt, evajî ji bo hindê vedigere, nûxwazî weke arasteyeke teknîk aloz e, zelalkirineke rîyalîstane rasterast yek alî nekire, derbare ew hêrza komekayetî pêknehate, aşkere ye nûxwazî li cîhanê hertim di nûkirinê de ye. Cîhan çanda xwe û pêşketina sanayî, teknoloji, cîhan çalakîya komelayetî tê de fireh dibe” (Biradbury, 2008: 51). Wehaji bo me zelal dibe, nûxwazî nîqaşên li ser komalgehê, civakî û çandî zehmet dariştîye, çunke nûxwazî berêxwedaneke îstatîkî aloz e, herweha nûxwazî fireh dibe çunke di cîhanekê de ye hertim ew cîhan di pêşveçûnê daye.

Derbareyê erdnîgarîya nûxwazîyê bajarên Ewropayê vê pêla nûxwazîyê cihekê fireh girt di nava bajarên Ewropî de. Erdnîgarîya nûxwazîyê ew bajar û cihên

nûxwazîyê ne, ew bajêrin di nava wan de derket ber bi cîhanê ve çû. Belê li hinek bajar hene hedibijêrin û bi mezintirîn bajarên nûxwazîyê tên hejmartin. Bajarên destpêkê navedên nûxwazîyê wekî Berlîn, Vîyana, Pirag, Mosko ...hwd Ew herdu bajarên li ber şoreşa “Rus” bi simbolîzim nav dibûn. Û bajarê Parîs mezintirîn şoreş bixwe ve dîtîye ji bo bicîhkirina hewl û bizava nûxwazîyê. Ji bilî bajarê London New York...hwd” (Biradbury, 2008: 93). Li gorî vê çavkanîya girîng ku eve ew bajarên girîng navedên şoreş û serhildana nûxwazîyê. Bi taybetî bajarê Parîs bi navenda şoreşa nûxwazîyê dihête qelendan, ji hemûyan diwartir şoreşa nûxwazîyê tê de serî hildaye.

Sebaret dîroka nûxwazîya Ewropa li çendîn serdeman de derbas dibe, ev nûxwazîya li Ewropa serî hildaye bi awayeke qonax qonax derketiye, di her qonaxekê de şoreş bizavên sertaserî hatine kirin ji bo ev bizav û pêlên nûxwazîyê cih bigre wekî li serî me amajekirî piranîya bajarên Ewropayê bûne navendên serhildana bizava nûxwazîyê. Derbarê dîroka wê piranîya dîroknivîsan wêjeya nûxwazîya Ewropayê li ser sê qonaxan de dabeş kirine.

1.1.2.1. Qonaxa Yekem (1849-1880)

Di sala 1848an û ligel serhildanên seranserî Ewropayê de destpê dike. Tepeserkirina wan bi awayeke bêwijdane ji alîyê desthilatdarên vê serdemê ve hat kirin. Piştî nûkirina babetên edebî yê klasîkî û realîzmî ji alîyê “Charles Baudelaire û Gustave Flaubert” î ve ev qonax bo destpêka teşenekirin û berçavbûna nûxwazîya edebî” (Ziyab, 2005: 22). Eve yekem qonaxa destpêkîna bizava edebîyata nûxwaza ewropê bûye, ev qonaxe bûye dergekek ji bo qonaxên din yê bizava edebîyata nûxwaz li Ewropayê serî hildide.

1.1.2.2. Qonaxa Duyem (1880-1910)

Di sala 1880an de destpêdike, dema ku çendîn pêlên wêjeyî û hizrî yê berwext serhildidin, wekî “Impresyonizm, Ekspresyonizm, Naturalîzm, Sembolîzm, Futurîzm, Kubîzm, Îmagîzm, Dadaîzm, Surrealîzm û hwd” (Yusuf, 2012: 185). Bi rastî jî ava pêlên nûxwazîyê kartêkirineka mezin li ser bizava nûxwazîya Ewropa kir, ji van pêlê û bizavan nûxwazî fireh bû heya sinûrê Ewropayê hemû vegirt.

1.1.2.3. Qonaxa Sêyem (1920-1930)

Di vê qonaxê de girîngtirîn pêlên nûxwazîyê di bizavên wêjeyî de wekî “Dadaîzm, Surrealîzm û Ekspresyonîzm” û çendîn bizavên din yên hunerî û wêjeyî gihîştine bilindtirîn xala bernîyas û şîyanên xwe. Bandoreke mezin li ser hemû hêlên din yên civaka Ewropayê û Amerîkayê kirin” (Ziyab, 2005: 22). Vê qonaxê de girîngtirîn pêlên nûxwazîyê wekî Surrealîzm û Ekspresyonîzm û çendîn bizavên di yên hunerî û wêjeyî gehiştine kopîtka xwe bandoreke mezin li ser civaka Ewropî û Emerîka kirine.

Her di nava dîroka nûxwazîya Ewropayê de çendîn bizav û pêlên edebî derketin ji encamê wan nexweşî kavilkirina cenga cîhanî ya yekem. Li vêrê me divêt amajeyê bi pêleka girin bidîn ew jî “Dadaîzm”e ku ji hêla fikra yaxîbûnê ve nêzîkî wan komê nûxwazîyê yên li bakura îraqê serhildane: “Di nava malvêranîya piştî şerê cîhanî yê yekem li salên 1914-1918’ê de, hejmarek wêjevan û nivîskarên çîna borjowazê biçûn nerazîbûna xwe anîn ziman û derbirîn li hember kawilkarî û rûxandina bihayê madî û menewî yê mirovahîyê. Beyannameyek belav kirin ku têde ji dayîkbûna rêbazê wêjeyî û hunerî ya nû hate ragihandin. Li welaê Suwêra çand edîb û hunermed, li ser bi welat û bajarên cuda cuda bûn, xastin hizra xwe li hember wêjeyê biguherînin dibêjinê “Tristan Tzara” bi raberê vê pêlê hatiye hejmartin û di gel çend nivîskarên bê alîgir dijî vê şerî bû.” (Husên, 2007: 211). Ku vê pêla nûwxaza Ewropî li dijî wê zulim kavilkirina şerê cîhanî, daxuyanîyeke nerazîbûnê anî ziman li hember vê çendê. Bi rêya huner û edebîyata xwe yaxîbibin û vê rewşê biguherînin ji bo baştirkirinê.

Piştî ji bo me dîyar bû bi sedema çî û ji ber çî vê pêlê serhilda, bêguman vê pêlê hinek taybetî bixweve dîtin; alîgirên vê dibistanê awayekê yaxîbûnê li dijî huner û exlaq û civakê” (Reza, 2006: 205). Li vir diyar dibe ku wan xwastîye yaxîbûnê li dijî civak û huner û sîyasetê bikin, rewşê bi guherînin ji bo baştir kirinê, yaxîbûna li ser wêjeyê alîyê helbestê digirt, li ser civakê wan xastîye bi rêya wêjeya xwe yaxîbûna xwe bikin li ser civakê herweha Dadayan: “Hewl dida ziman ji wateya vê wala bike û peyv û delalet û wateya wan ji hev cuda bike, di hin cihên ne bi hevdu ve girêdayî bikin” (Berwarî, 2010: 120). Li derbarê yaxîbûna wan li ser zimanî kirîye,

hewldan nezelalbûnekê bixine di nava zimanê helbestê de, ku xwandevan bi hêsanî di zimanê helbestên wan negehe.

Bi vî awayî dîroka nûxwaziya Ewropî bi awayeke pêl û bizav serhildaye, ku van pêlan di qonaxên cuda cuda derketîne, li gorî derbazbûna qonaxan pêşkeftin û geşe bixweve dîtîye. Yek ji giringtirîn pêla nûxwazîya Ewropî Dadaîzm bû, ku ji hêla yaxîbûnê ve nêzîk helbestê em li ser mînakên helbestên bingeîn ên nûxwazîyê aşkere dikîn. Ew jî weke Dadayan yaxîbûn li ser civaka xwe kirîye, di beşa dûyem di piraktîzekirna helbestan de yaxîbûna civakî ya helbestên bo vê xebatê hatine hilbijartin dê zelal bikin.

1.1.3. Dîroka Nûxwaziya Îraqê

Îraq weke hemû welatên ji aliyê urf û adetên civakî civakeke girtî bû, zû bi zû qebûlkirina tiştê nû nekir. Edebîyata wan ketibûye jêr kartêkirina edebîyata Erebi ya îslamî, ku piştî ev pêla nûxwazîyê pêlên wê li Ewropayê derketî û fireh bû, sinûrên welatên xwe debazkirîn, gehiştê welatên cîhanê. Welatên Erebi jî ku îraq yek ji wane pêşwazîya vê pêla nûxwazîyê kir. Her çende astengî hebûn çunko civaka îraqî tiştê nû bi hêsanî qebûl nedikir.

Li îraqê komeke helbestvan, nivîskar û rexnegirên jêhatî derketin û xwastin edebîyata xwe ji wê sinûra berteng ya edebîyata kilasîk ya îslamî xilas bikin, ber bi cîhana serdem biçin, nûkirinê di nava edebê hunerê de bikin. “Li Îraqê di sala 1908an de komeka helbestvanan li hev civiyan, hewldan ji yasa û destûra helbesta kilasîk derkevin. Bi nav û dengtirîn endamên wan pêkhatibûn ji Abdulmihsin Kazimî bi mezintirîn bangewaz ji bo nûxwazîyê dihê hejmartin. Her weha Cemîl Sidqî Zehawî taybetîyên helbestên wî pêkhatibûn ji hêsanîya dariştinê, wateyeke zelal û çareserkirina kêşên felsefî û civakî. Her weha nivîskar Usman Berîtanî – Melekî ku pitir wek helbestvanek sîyasî dihate naskirin, helbestên wî derbirînek bû li dijî dagirkirinê û dest bi serda girtinê, behis li gîyanê netewa Erebi dikir” (Resûl, 2005: 25). Li Îraqê wekî welatên din yê Ereba komaka helbestvanan li hev civiyan li ser wêjeya xwe dan û sitandin kirin, xwastin rewşê edebîyat û hunerê ber bi nûxwazîyê ve bibin. Pir helbestvanê mezin û jêhatî ji nava civaka Îraqê derketin bizava vê çendê kirin, helbestên wan derbirîn li kêşên civakî û dagirkirina sîyasî dikir. Beriya wan ev

çende di helbestê de nehatibêye dîtin, wêjeya wan di bin bandora edebîyata kilasîk de mabû.

Sebaret hizir û nerînên wan ji bo edebîyatê, ew hizra guherînê ya derbarê helbestê de çêbûye û modernîzmê serhildaye di nava xwe de ev nûxwazîye pirojeyeke bi pîlan nebû, belko têgehiştineka hizrî û gîyanî bû û rêkdan û sinûr bezandin, derbasî helbestê bû. Ji bilî vê çendê, ji encama bersivdana daxwazîyekê nebûye, belko ji encama guherîna derunî beramber cîhanê bû. Her weha bizaveka helbestvanan bû ku bikaribin azad bin li ser hunerê (Xeyrî, 2006: 49). Weha dîyar dibe ku ev modernîzm têgehiştineha hizrî bû. Ev hizr dibine rêyeka girîng ji bo guherîn û pêşketina nûkirinê li ser helbestê. Her weha egereke helbestvan hizrên xwe darêje û xwastin van hizran bi reng û teknîkêka nû biafirînin, bi vî awayî sinûrê nû yê edebî nabe rêgir ji bo zelal kirina hizir û fikrên wan.

Derbarê hatina nûxwazîyê ji bo wêjeya Îraqî û Erebi, dîyardeyên edebî weke cihgîrek ji bo şewazeka ji navçûyî yan rengeke bi bihatir dihê guherîn. Pîranîya caran wergir dibe rêxweşkerek ji bo evan şewazan û divê bûwarî de û egerê duyem ji bo modernîzmê guncawtir e, ji ber ko weke valahîyê peyda nabît yahatî ji bo hembêzkina rewşekê (Nasir, 2007: 29). Anko modernîzm ji valahîyekê negihiştîye ku rewşek yan qonaxek dihê pêş, helbestvan hewl didin wêjeyê biguherînin digel vê qonaxê yan wê serdemê edebîyata xwe biguncîne. Helbestvanên îraqî yên me amaje pêkirî her tim hewl dane nûkirinê ava bikin li ser wêjeyê û digel serdema xwe birêvebibin.

Îraq jî beşeke ji civaka erebî ew guherînên li welatên din yên ereban hafîn wekî misr, sûrîya û hwd. Wan guherînan kartêkirina xwe li ser civaka îraqê hebû. Her weha ji encamê serhildana komeka şoreşan wekî şoreşa milî ya misrê û şoreşa milî ya îraqê li dijî îngilîzan û her weha şoreşa serbixwe ya sûrya, edebîyata erebî û îraqî nûkirin bixweve dît. Giringtirîn ew qotabxaneyên di wê serdemê de eve bûn.

Qotabxana “Dîwan” li misrê; dîroka vê qotabxanê ji dîroka pirtûka “Dîwan” di sala 1921an de destpê dîke. Ev qotabxane berhemên wan rengkirin û têkelkirina, her du rewşenbîrîyên erebî û rojavayî bûn. Ketibûne jêr bandora helbestvanên bi nav

û deng wekî “Shakespeare, Shelley, Byron û hwd û pêşengên vê qotabxanê “Ebas Mehmûd E'qad, Abdurrehman Şukrî, Îbrahîm Abdulqadir Mazinî” bûn.

Qotabxana helbestvanên “Mehcer” di destpêka sedsala 20an de bi destpêka peydabûna helbestvaên “Mehcer” dihê danan. Ji ber du sedeman nûkirin xistin helbestên xwe. Yek, xwastin jîyaneka nû bi destxweve bînin ku hemû pêdivîyên wan tê de be. Du, bîrhatina xak û niştîmanê wan, eve jî bûye sedem nûkirinê di nava helbestê de bikin, berev hesteka niştîman perwerane bibin” (Resûl, 2005: 24). Di derbarê vê çendê de li îraqê, surîya û misrê ev şoreş çêbûn û bûne sedemê derketina qotabxanên nûkirina wêjeyê di nava civaka ereb û îraqê de. Ku hewl dan nûkirina rojavayî bînin nava wêjeya xwe.

Piştî van agahiyan weha diyar dibe ku civaka îraqê digel civaka erebî ji encamê komeka serhidan û şoreşan helbestvan û nivîskarê wan bizav kirin, bi rêya edebîyata xwe rê li dagîrkirinê bikin. Di heman demê de hestên xak, welatparêzîyê ava bikin di nava wêjeya xwe de eve jî bûye sedema nûkirina rojavayî di nava edebîyata xwe de bi cih bikin.

Kurdên Îraqê li bakurê wî welatî dijîyan ketibûne li jêr bandora wêjeya Îraqî û Erebi di dema ev guherîn di wêjeya wan de çêbû, rasterast kartêkirin li ser wêjeya kurdên Îraqê hat kirin. Di derbarê vê çendê de Abdulqadir Nûrî dibêje; piranîya helbestvanên me yên Hewlêr, Silêmanîyê û devera Duhokê şarezayê zimanê Erebi bûn, demê guherîna nûkirinê di wêjeya wan de rûda. Kartêkirin li ser wêjeya kurdên Îraqê kirin ber bi nûkirinê ve çûn (Nûrî, 17. 9. 2018). Anko ev komên li bakurê Îraqê derketine li jêr bandora nûkirina edebîyata Îraqî û Erebi, nûkirin xistin di nava wêjeya xwe de. Weke nêwxazên Îraqê wan jî bizav kirine, wêjeya xwe nûkirina rojavayî bi ser de bînin. Li vêrê weha aşkere dibe ev nûkirin rasterast ji rojava ne gihiştiye kurdên Îraqê belko çavlêkirina Îraqê kirine ewa ji Rojava hatiye wergirtin.

1.1.4. Dîroka Nûxwazîya Kurdî

Kurd weke her miletek cîhanê xwastine edebîyata xwe ber bi nûkirinê ve bibin ji bo vê çendê hewl û bizav hatine kirin. Di destpêka sedsala 20an de piranîya welatên cîhanê bi taybetî rojhelata navîn li jêr kartêkirina edebîyata nûxwaz mabûn.

Piştî şerê cîhanî yê yekem guherînên mezin ji alîyê civakî, sîyasî û hunerî çêbûn, bizavek hate pêş ji bo nûkirina edebîyatê. Ev guherîn bi ser edebîyata dewr û berda hatin, kurdan jêr kartêkirina wan hewl dan edebîyata xwe nû bikin. Bi taybetî li ser helbestê bû e hewldana wan lew cureya herî berbelav ew bû di nava kurdan de.

Li dû belgenameyên dîrokî, rexneya helbesta kurdî, yekemîn hewl û bizava nûkirinê helbesta kurdî ji bo Ebdurrehman Rehmî Hekkarî vedigere ku li bakur bi dîyalêkta kurmancîya jor 20 parçe helbest li kovara *Jînê* li Îstanbulê ji sala 1918an heya 1919an hate belav kirin. Ku yekemîn helbesta nû ya bi navê “Bang” di hejmara yekê de di kovara *Jînê* de di sala 1918an de weşiya (Pîrbal, 2002: 23). Li vir weha zelal dibe ku yekemîn hewla dîrokî ji bo nûkirina helbestê vedigere bakur ku Ebdurrehman Rehmî Hekkarî li Îstanbulê nûkirina helbestê di nava helbestên xwe de çêkirîye.

Li deverên başur hewl hatiye dan ji bo nûkirina helbestê, helbestvanên jêhatî ev bizave kirin, li nîva yekê ji sedsala 19ê komeleka nû li bajarê Silêmanîyê çêbû. Her sê helbestvanên navdar Nalî (1800-1856)^z, Salim(1800-1866)^z û Kurdî(1809-1849)^z, pêşengî kirin teknîkeke mezin bi edebîyata kilasîka kurdî de. Kartêkirina wan bi ser Silêmanîyê tenê nebû, çendîn bizavên din li deverên kurdên îraqê payda bû. Destpêka helbestên Hacî Qadirê Koyî yêr vê komelê di qelem didin, Hacî Qadirê Koyî çendêk xwe bi helbesta “Didarî û Xembarî” ve mijûl dikir û li dûv de kodeta bi ser hizra xwe ya kilasîk de îna. Ew perde dirand û perdeyeka nû raxist (Resûl, 2005: 64). Li gorî vê çavkanîyê weha aşkere dibe li başur ku yekemîn bizava hatiye kirin ji alîyê van helbestvanan bû Nalî, Salim û Kurdî, ku xwastin xwe ji qeyda hizra edebîya kilasîk xelas bikin. Hacî Qadirê Koyî ew perdeya kilasîka li ser helbestên xwe rakir perdeyeka nû pêde da. Xwast nûkirinê bike li ser wêjeya xwe, vê çendê bu dergehêk deverên di yêr başur vê bizavê bikin perda edebîyata kilasîk ji ser helbestên xwe biqetînin.

Her derbarê wê nûkirina Hacî Qadirê Koyî şîya guherîneka mezin li ser helbestê bike bi taybetî ji alîyê naverokê ve ev guherînên navborî kirin bu du egeran vedigere.

Çûna Hacî Qadir bi bajarê Îstabilê agehdarîya wî ji wê livîna rewşenbîrî ya edebî ya li wî bajarî hey, bi rêya wan navborî ageh ji wê bizava nûkirê hebû ya li ewropa ser hilda, bi vê çendê hizra guherîna nûkirina helbestê li cem çêbû.

Rewşa bajarê Koye li ser wê demê ji hêla sinûrî ve dikete nîva mirdişîna Baban û Soran, çend carêk ji egerên şerê di navbere her du mirnişînan de nexweşî gihîştîye wî. Ji ber vê sedemê kartêkirin bi ser helbesta navborî de hat di nava helbestên xwe de behsa yek girtin û birakujîyê dike, ji alîyekê din ve bajarê Koye rêya bazirganîyê bû di nava deverên bakura îraqê de. Her weha bajar bi xwe navendeka rewşenbîrî bû û çendîn helbestvanê mezin li wêrê jîyan kirîye (Resûl, 2005: 64). Li vêrê zelal dibe ku ev nûkirinên navborî ji rewşenbîrîya bajarê Îstabilê bûye, hem jêr kartêkirina bajarê wî bi xwe bûye ku navendeka rewşenbîrî bû, ji bo hemû deverê her biveka di wê demê de di nava kurda li wêrê serhilda.

Bi vê çendê û bi bizavên helbestvanê mezin ê kurd Hacî Qadirê Koyî (1817-1897)^z, di nava dîroka nûkirina helbesta kurdîya başur de eve yekemîn hewla nûkirina helbesta kurdî bû. Ew jî ji alîyê wan helbestvanê me amajekirî hatiye kirin û bi taybetî navborî, li bakur jî yekemîn hewla nûkirinê ji bo Abdulrehman Rehmî Hekkarî vedigere. Jêderê serekî yê nûkirina van her du helbestvanan bajarê mezin Îstabil bû, ku rewşenbîrîya Ewropî her zu gehîşte wî bajarî, çunko ji alîyê cugrafî ve nêzîk Ewropa ye.

Piştî vê bizava nûkirinê çendîn salan di sala 1970an de komên bizavên rewşenbîrî li bakura îraqê serhildan ku rewşa rewşenbîrî û sîyasî di salên 1970-1974an de kartêkirineka mezin li ser civaka kurdî hebû. Di wê demê de guherîneka berçav di rewşenbîrîya kurdî de çêbû. Bizavên xurt ên edebî û berhemên nûxwaz ji alîyê kom û takekesan ve hatkirin û piştî sala 1991an rewşeka nûtir û xurttir li jêr barê azadîyê li deverên kurda hate holê (Hîtu, 2012: 119). Van bizav û koman nûkirina wan bi nûxwaz hatîya aşkere kirin, wan jî bizav û hewlên nûkirinê dan destpêkirin li ser wêjeya kurdî bi taybetî li ser helbesta kurdî. Her weha gelek dijayetî li ser nûkirina wan hatiye kirin ji alîyê civakî ve. Helbestvanê em li ser mînakê helbestê wî xebata xwe dikin endamê yek ji van koman bû. Heta vira ev wek derazînk û destpêk bû, di beşa yekem ya tezê de emê zêdetir li ser van koman bisekinin.

BEŞA DÛYEM

2. DI EDEBÎYATA KURDÊN ÎRAQÊ DE NÛXWAZÎ

2.1. Wêjeya Nûxwaz ya Kurdên Îraqê

Heta salên berîya heftêyan bi giştî li def Kurdên Îraqê wêjeya klasîk û modern di nava berhemên wan de dihat dîtin û karîger bû. Di wêjeya ‘Erebîya îslamî de heta vê dema tu bizavên wêjeya nûxwazî nebû. Piştî wan bizav û pêlên modernîzmê li Ewropayê bi awayeke rasterast li ser jîyana xelkê bandor kir, ji hêla aborî, civakî, sîyasî û candî wêjeya nûxwazî sînorên welatên Ewropî derbaz kir û gehiştê hemû welatên cîhanê.

Di nav welatên ku zûtir pêla modernîzmê qebûl nekir welatên ‘Erebî cih digirtin. Ji ber ku civaka wan tiştê nû qebûl nedikir û pêla modernîzmê ji bo yekem car di nava ‘Ereban de li welatê Misrê destpêkir. Piştî ku ev bizav li welatên ‘Ereban belav bû Kurdên Îraqê jî weke wêjeya ‘Erebî ji vê pêla modernîzmê bêbehîr neman. Bi rêya berhemên ‘Erebî yên wergerandî ev bizav gehiştê Kurdên Îraqê jî (Hevdîtin, Xelîl, 16. 01. 2019).

Tevî hemû astengîyan civaka Kurdî ev tişt qebûl nedikir, lê di destpêka salên heftêyê de grubeka modernîst derket bi navê koma “Kerkûk-Kifrî”. Endamên vê gruba nûxwaz hewl dan ku wêjeya xwe ji vî qalibê berteng derxin û wêjeya xwe li gel serdema xwe biguncînin û kêşeyên gelê xwe çareser bikin bi rêya wêjeya xwe. Piştî vê komê jî koma Rewange hate damezrandin. Damezrînerê vê grubê di destpêkê de wêjenasê navdar Şêrko Bêkes bû ku hewl da bi şêwazeke nûxwazî girîngîyê bide wêjeya Kurdî. Vê komê jî kar û çalakîyên berçav encam dan. Piştî vê komê, koma “Wêran” hate damezrandin. Piştê jî li devera Behdînan koma “Nûkirina Her û Her” hate damezrandin, gelek helbestvanên jîr û jêhatî beşdarî vê komê bûn û berhemên xwe yên nûxwazî di kovar û rojnameyan de belav kirin. Di nava wan kovaran de kovara “Peyv û Metîn” gelek jimarên nû derhistin, li gel çend rojnameyên din. (Nêrweyî, 16. 1. 2019).

Her weha komeke din ya nûxwazîyê li navçeya Akrê hate damezrandin bi navê “Koma Nûxwazên Akrê” ku li jêr bi awayeke têr û tijî behsa ew kom û bizavên nûxwazîyê hatiye kirin.

2.2. Girintirîn Komên Nûxwaz yên Kurdên Îraqê

2.2.1. Koma Kerkûk- Kifrîyê (1970)

Piştî ku hizra modernîzmê ket nava hêlên jîyana gelê Kurd. Bi taybetî di nava hêla wêjeyê de, ronakbîr û nivîskaran hizra avakirina koman kirin da ku bikaribin vê bizavê di nava berhemên wêjeyî de piraktîk bikin û bikaribin vê bizavê xurt bikin. Di encamê de û berî koma Rewangeyê li Silêmanîyê koma “Kerkûk-Kirfî” di sala 1970ê yê zayînî hate damezrandin. Yek ji egerên serhildana koma Kerkûk -Kirfî yê ev bû ku koma Rewange xwedî hin xalên lawaz bû di bizava xwe de ku nedikarîbûn guherîneka berçav di rûxsar û naveroka helbest û wêjeya Kurdî de bikin.

Komeka nûxwazîya helbestê bû, li Kerkûk Kifrî hate damezrandin, her bi navê cihê xwe yê erdnigarî hatîye navkirin. Hin ronakbîr û helbestvanên vê deverê beşdarî vê komê bûn. Di nav wan de jî nivîskar û helbestkarên wek Letîf Helmet, Letîf Hamid, Ferhad Şakelî, Ehmed Şakelî, Kenan Medhetim, Ebdulla Tahir Berzencî, Hîşam Tahir Berzencî, Sedredîn Arif û Ebdulezîz Xaneqa hebû (Hîto, 2012: 120).

Ev kom bi taybet bi nûxwazîya helbestê dihête hejmartin. Endamên vê komê navê bajarê xwe yan cihê damezrandina komê, weku navê sereke ji bo koma xwe danîn. Ku evan komên din yên nûxwaz navên cuda ser xwe deynane li cihê navê bajêr daynin. Her weha pir helbestvanên jêhatî hebûn di nava komê de.

Ji ber vê jî ronakbîrên koma Kerkûk û Kifrîyê bi armanca modernîzekirina helbesta Kurdî dest bi xebatê kirin û berhemên wan di destpêkê de bi babetên ayînî û îbadet li xwe digirtin, piştê jî ji hêla naverokê ve hemû babet li xwe girtin (Hîto, 2012:120). Anko vê koma Kerkûk Kifrî armanca wan ew bû, nûkirinê di hemû cureyên wêjeyê de bikin. Babetên vê komê hemû babet bi xwe ve girtin anko li ser gelek babetan dinivîsîn. Li ser bingehe nûxwazîyê deriştin, bingeha nûxwazîyê xistine li ser hemû cûreyên wêjeya kurdî ya serdema xwe.

Bîrûboçûnên wan heta astekê wek nêrînên koma Rewange bû. Armanca vê komê bangewazîya guherîna çarçoveya kevin a helbestên Kurdî bû ku bi nerîna wan helbesta Kurdî çî guherîn têde nehatîbû kirin ne ji hêla naverokê û ne jî ji hêla rûxsarê ve. Ji ber vê çendê jî ketin bin bandora modernîzma ‘Erebî û Ewropî. Bi gotineke din wan hewl da ew proje û armancên ku Rewangeyê bo xwe diyar dikiribû pêk bînin lê bi hindê guherîn û lêzêdekirinan.

Her wekî helbestvanê mezin Letîf Helmet(1947), dibêje: Em di hêla wêjeyê de nêzî fikrên helbestvanê Bexdayê bûn. Bi taybet ji hêla qewara “Helbesta 69” ya Başûra iraqê ya ku “Fazil Ezawî, Xalid Elî Misqîfî, Samî Mehdî û Xewadî Kerîm” damezrandibûn. Piştî bi rêya vê qewarê di hejmara “1”ê de daxuyanîyek bi navê “el-Beyan el-Şê’rî” derxist û ev bû sedema nêzîkbûna me ji bo berhemên wan, ji alîyê din ve me gelek mifa ji wan daxuyanîya sitend yê li ser nûxwazîyê ji wan jî; Dadaism û Suralism” (Helmet, 1996:36). Her wekî helbestvanê jêhatî Letîf Helmet bo me zelal kir. Ku ew daxbar bûn, bi wêjeya başûra iraqê ya wê demê li ser nûxwazîyê daxuyanîyên wan xwandin û sûd jê wergertin. Her weha mifa ji hinek dibistanên nûxwazan wergirtin. Li jêr van bandora vê çendê vê komê dest bi xebatên xwe yê nûxwaz kirin. nûxwazî kirin bingehek ji bo hemû cûreyên wêjeya xwe.

Berhemên helbestvan Letîf Helmet û Ferhad Şakelî ku diyarîrîn berhemên vê komê bûn ku wan helbestvanên Kurd dinivîsîn. Ji bo programeke taybet a helbestan dişandin ku li îzgeheke radyoyî li Bexdayê dihat weşandin û wan pîranîya berhemên xwe bi rêya vê radyoyê belav dikirin (Ziyab, 2005:46).

Ev her du helbestvanê jêhatî her zû, du dîwanê helbestan belav kirin. Di wê demê de radyoya Baxdayê pir baş bû, ji bo berhemên xwe tê de belav bikin. Ev herdû berhemên me amaje bi wankir, berçavîrîn berhemên vê komê bûn.

2.2.2. Daxûyanîya Komê

Evê komê di duyemîn civîna xwe de daxûyaniya xwe li baregayê yekîtiya nivîskarên kurd daxûyanîya xwe ya li jêr navê “Şêtekan, Serinc, Helwîst û Piroje” înzakirin. Bi serkêşîya her du helbestvanê jêhatî, ku li jêr navê wan derbaz dibe.

Koma Koma Kerkûk- Kifrî piştî demek dirêj ji damezrandina wê, daxûyanîyek li baregaya yekîtiya nivîskarên kurd li Hewlêrê di sala 1970ê de daxûyanîyek li jêr navê “Şêtekan, Serinc, Helwîst û Piroje” îmza kirin. Bi îmzeya Letîf Helmet û Ferhad Şekalî. Çend danek bi ser amadekaran de dabeş kirin. Daxwaziya nûxwazîyeteka veqetandin ji sînore teng û kevin ku berê civakê dida bawerî neînan bi xudê û yasayên aynî. Ev çende jî bawerî înanan wan bi tîtina Darwin li ser pêşkeftin “cûran” dema dibêje; “mirov ji cûrekî meymonê hatîye” (Ziyab, 2005: 47). Anko ev daxûyanî bangewazeka xebateka bingeîn dikir, bi ser hemû yasa û mercên helbesta kevin. Yaxîbûneka tunde li dijî “Civakî, Ûrfu û Adata” ye.

Piştî ev daxûyanî hatîye îmza kirin, hizr û nerînên vê komê belavbûn, wan bi tundî dijayetîya kevnetî û yasayên kevin yê civakê kir. Her weha li hember ûrf û adetên kevin rabûn. Ev tişt li xweşa civakê û millet neçû, çûnkî civaka kurdî musulman û xudanas bûn. Ev kome her wekî koma Rewange ji ber hizr û fikrên wan rastî dijayetîyê hatin ji alîyê zelumên aynî, ku wan bi taybetî ev kom bê dîn dan naskirin.

2.2.3. Armancên Daxûyanîya Komê

Helbesta kurdî hêşta weku wan parçe alava ye dema zarok dikin pêlîstok. Ew dem hat xebatekê çêbikin, bi ser hemû ew yasa û taybetîyan de ewên heta niha helbesta kurdî sekinandî hêlaye. Gûherîn jî bê xebat nabe (Daxûyanî: 14. 7. 1971). Anko evan helbestvana di vê daxûyanîyê de, weha zelal kirin ku helbesta me ya kurdî wek li ser destûreka band kirî maye. Ku dem hatî ye em xebatekê bikin û helbesta xwe ji hemû yasa û destûran xelas bikin, bikaribin fireh hizirkirinê bikine di nava helbestê de. Helbestê bikine alavek di xizmeta netewa xwe de û li gor vê wê bikaribînin. Ev hemû nerînên li ser helbestê pêdivî bi xebatê hebû bo bi cîh anîna wan.

Di xaleke din a daxûyanîya komê de helbesta kurdî dişibandin meymona ku bûye mirov: Wekû meymon dibe mirov ji alîyekê bûne xwedî ziman, axafdin û dahêner. Ji dînyayê em derketin bo heyvê, li ser hatîne xwar, weha divê maymona helbesta kurdî bibe mirovekê tamam serbikeve bo hemû pêşkeftinê bi xwe ve bigre. (Daxûyanî:14. 7. 1971). Helbet merem ji vê daxûyanîyê ewe ku wan helbestvanan

weha hizir fikir, mirov ji meymonê çêbûye wekî me li jor amaje pê kirî. Ku di bingeha xwe de mirov meymon bû, paşan hêdî hêdî hînî ziman û axaftinê bûye. Weha divê helbesta kurdî pêş bikeve wekî meymoneka bê ziman nemîne. Armenca wan ew bû helbesta kurdî ber bi pêş bibin, ji helbesta nûxwaza cîhanê li paş nemîne.

Li ba me girîng nîne çawa û bo kê binivîsî, ya me divê bê tirs û bê ku ji yekê bitirse helbesta xwe binivîsîne. Her çi nebe xwe di nav helbestê de dîyar bike, me hemû berhemên xwe di nav ezmûneka biçûk ya xebatê da aşkirakir. Me “Berhem, Hebûn, Jîyan, Vîyan” di nav xebat û şoreşê de tûrebûn û dînbûn ji hûndirê xwe avête der, di havêne ber sînga hemû cîhanê. Da ku em helbestê binivîsin divê pitir tûre û yaxî bibîn, hemû ew tiştê “îro” bilindtir û pêşkeftîtir bin ji yên “dûh”, pirojê me dana ye pêngavên ber pêş diavêjin. Ewe hemû tişt nîne, bê ku destpêke, me divêt peyva kurdî rizgar bikin” (Daxûyanî, 14.7.1971).

Eger bi hûrî li daxûyanîya vê komê were nihêrîn di bi awayekî rehet were dîtîn ku vê komê xwastîye bi rêya helbestê yaxîbûnê li civaka xwe bigrin. Li dijî tiştên kevin û her weha li dijî sîyaseta bi zûlm ya wê ser demê bi tûndî yaxî bibin. Di nav helbestên xwe de bê tirs yaxîbûnê li sîyaset û civakê bigrin. Her weha gûherîne di naverok û roxsara helbestê de dikin, peyva kurdî rizgar dikin, peyvên kurdî yên xumalî jî zêdetir bikartînin.

Mînak:

Me helbesteke Letîf Helmet ji dîwana wî ya şî'rî de bi navê” Xuwa û Şarepiçûkekeman” wergirtîye. Ev jî helbesta wî ya bi navê “Em Kolekane Eşkênim”

Em kolekane eşkênim
Eme bawerî min e
Agirekem natwêtewe
Temenî min bilêseyek e
Bê xulemêş e
Perestgakan erûxênim
Wuşekanim emêtey regî zewî ekem
Şînayî asêman

Wekî çilê yadgar
Le ser dilma eşkênim
Eme bawerî min e
Şepolekanim westanî nîye
Kes le zibanîm tê nagat
Sêberî hengawekanim
Baxçey gûl e
Nîgay çave manduvekanim
Barûtî tole ye
Çî elên bilên
Eme şareke rûy nekirduwe
Nîvey zamekanim
Le şepolî xwêy şewa
Cê dêlim bo xoşewîstekem
Jîyanî min
Çilî agir û çiroy pişko egrê
Ev namaney nardibûm
Welamekanî nehatewe
Bişê bay şev mirdibê
Çavî rêbwarekan wekî merg
Birsîtî tîya şî ebêtewe
Hemû şiwênî geram
Bay şev xûy tîya neşardibûe
Eme bawerî min e em kulekane eşkênim
Pencere jîngawîyekan ewerênim (Helmet, 1970: 47-48).

Şîrovekirina Helbestê

Helbet ev helbest helbesteke nûxwazî ya Kurdî ye ku gelek bi başî binemayên nûxwazîyê tê de berceste dibin. Eger em temaşeyî peyama giştî ya vê bikin dê ji bo me xuya be ku helbestvan di vê helbestê de behsa dijayetîkirina kevneperestî û dab û nerî û tîtalên di nava civakê de dike, ji wan yaxî dibe ku heta çî astekê rêgir in ji bo pêşveçûn û pêşkevîna civakê.

Her wekî di pertûka nivîskar Ebu Ubeyd de hatîye sebareet helbesta Letîf Helmet ya girîng nîne xwendevanê helbestê di merema wan ya sereke bigehê. Belku ew bi xwe dikare wateyekê bide helbestê. Mînaka helbesta Letîf Helmet nûxwazî tê de dîyar dibe, yaxîbûn di helbesta navborî de aşkera ye (Zîyab, 2005: 47).

Helbestvan her ji destpêkê û ji nav û nîşanê helbesta xwe vê rastîyê xuya dike ku dema ku civakê xwe wek koleyek anko kulindên zer li qelem dide. Kanê ev kolinde çend yê rîq û dijwar e ji bo hindê ku mirov bişkêne û her weha jî dema ku dişkê, nava vê hemû wek rîşalûkane û bergên vê di nava xwe de asê kirin. Anko ev dibêje ku civaka me jî wekî vê “kulindên zer” yê req, dijwar û ji hêla dab û nerîtan ve aloz e. Bi vê awayê yaxîbûnê li civaka xwe digre, li hember wan disekine.

Dîsan eger em li destpêka helbestê binêrîn, helbestvan dibêje ku merem û armanca min ya sereke şikandina wan “Kulindên Zer” e û ev çende jî bawerîya min e. Ew di vê bawerîyê de ye ku ev dab û nerît û tîtal mîna tiştên pîroz hatine, pêwîst e ku pîrozîya wan nemîne, wekî tiştê lê neyên ku bibe cihê perestîna di perestgehê de. Lewre jî fer û erk e ku ev perestgehê nerîtên kevin bîn herifandin (Hevdîtin: Xelîl. 16. 1.2019).

Her di vî warî de helbestvan hewla vê çendê dide ku şîret, bawerî û gotinên xwe wek tovekê di nava hinava erdî de ku mebesta vê civaka wî ye biçîne. Li hêvîya vê çendê be ku şîr bibin û bibin berhemê ked û xebata wî ya nûxwazane û bi şanazî jî ev dibêje ku ev çende bawerîya min e. Dê her berhemê hebe, pêl û pêlên vê hizra nûxwaz a me tu seknandin jê re nîne dê her berev armancê ve biçê. Raste ku kesek ji min fêhm nake lê ev çende nabe rêgir ji bo xebata min. Civak û kesên di nava civakê de çî dibêjin bila bêjin. Ev nerîna çavên min yê mandî wekî tolhildanekê ye li hemberî wan dab û nerît û tîtalên paşketina civaka min.

Serencam li pey qenaet û têgihîştina helbestvan, ev dibêje ku her tiştê ji bo gehîştina armanca xwe ez dê pêk bînim. Heger pêwîst be dê bajarê xwe jî bihêlim û biçim, jîyana min ji bo vê civakê wekî çeqê agir e û dê pişkoj û kulîlkan der û berhemê vê nûxwazîya xwe de bînim. Di dawîyê de jî dubare teqezîyê li ser şikandina wan kulindên zer dike û hewla guherîna dide û dibêje ez dê wan pencereyên ku zeng girtine werînim anko têk bidim û ji nav bibim.

Di helbestê da mebesta helbestvan a pencereyên zeng girtî, hizr û bîrên kevin û paşkeftî yên xelkê di nava civaka wî de ne. Divê vê kevnepereştiye nehêle û civaka xwe biguherîne, ber bi asoyeke geş û pêşkeftî ve bibe. Anko ji reşbînîyê ber bi geşbînîyêke mezin bibe û wan hemû qeyd û bend û zincîrên ku civak pê hatîye xapandin û girêdan bişkêne û nehêle.

Mînaka dûyam ji helbestên “Letîf Helmet” di vê helbestê da hûşyarîyêke dide civaka xwe li dijî zordestan.

Kê ev sitran ji bû min vegêra!?
Kê hetava xwezîyêt min, havête gewrêya şêran!?
Hêvîkîrnêt te hemû direwin.
Yasa... wek hevî...birayefî...
Rewşenbêrî... xwepêşamdan...aşfî...
Hemû pirûpakinde ne direwin.
Dê vêca ey barûta tolew rastîyê
Di bahûza paytexta nûda.
Tevan pirtikîne,
Di wê xweşîya dihêt û nahût de (Helmet, 1973:7).

Di vê hebesta helbestvanê jêhatî Letîf Helmet de lehengê helbestê xwe li êş û janêt milletê xwe kiriye xûdan. Li dijî zordaran rawesta ye, yaxîbûye bi aşfî û sozên derew, ji daxûyanîyêt serdabirinê bihên tegbû. Bawerî bi biratî û aşfîya bi direw namîne, her weha ku çû hêzên herîkar di hewara gel û netewa wî nayên, li dijî sîyaseta zûlim ya wê serdemê disekine.

Ew her tim hewar û gazî dike. Lê kes bersiva wî nade, êdî ji serdabirina mirovan bêhteng dibe. Bawerî bi aşfîya ji direw nayê, çûnkî çû hêzên arîkar bi hewara gelê wî nehatin. Ma çawa ev karesat û belayên bi serê vî milletê hejar de hatin, nagehe her çar alîyên cîhanê. Ma dibe bi navê ayînekê pîroz, milletekê bikûjin fetwayê ji bo wan derbikin, ma ji bo çi çareyek nabînin. Hemû dergehên arîkarîyê li ser wan hatine girtin, ev tişt bêhêvîbûnê li ba gelê kurd xûya dike (Duhokî, 2008:77).

Helbestvan li vêrê yaxîbûnekê li hember cîhanê digre, ku ev milletê hejar û bindest ji layê rejîma wê serdemê ya îraqê zûlim lê hate kirin. Êdî li hewara wî milletî werin, ev millet ji soz û axaftinên we yê xweş bêhêvî dibe. Bi vî awayî helbestvan Hetîf helmet yaxîbûye li hember wan doz axaftinên direw, nehatina cîhanê bi hewara gelê wî ve jî wî aciz kiriye. Merema helbestvan ewe bi rêka wêjeya nûxwazî yaxîbûnê bigre li alîyên şaş, wêjeya xwe li hember kevnatîyên civakî anko li hember “ûrf û adetan” bikarbîne.

Evê komê xebatên jêhatî ji bo wêjeya kurdî kir. Evê komê her zû dijayetîya wan hate kirin ber bi lawazîyê çûn. Ta radeyekê bizavên wan lawaz bûn. Piştî demeka ne dirêj komeka din ya nûxwaza derket bi navê “Koma Rewange” hate damezrandin.

2.3. Koma Rewange (1970)

Gelê Kurd wek hemû gelên cîhanê xwedî dîrok û wêjeyeke taybet e. Lê ev wêje li gor wêjeya dinyayê di asteke bilind de nîne. Ji ber ku her ji kevin de ketîye bin bandora neteweyên cuda de û vê çendê jî bandoreke neyînî li ser wêjeya Kurdî çêkiriye. Lêbelê wêjezan û ronakbîran hewl daye ku wêjeya Kurdî her bi pêşve bibin û hêdî hêdî vê wêjeyê bihêz bikin. Heta gihiştê vê qonaxê ku wêjehezan hizra modernîzmê derbazî nava wêjeya Kurdî kirin.

Lêbelê pêwîste bê gotin destpêka her hizrekê bi awayeke sade û sakar destpê dike. Piştê bi hewl û têkoşînê wê berfireh dike û bihêz dibe. Hizra modernîzmê jî di encama vê çendê serhilda ku wêjehezan wisa hizr kir ku wêjeya wan di nav çarçoveyê teng de bi cih bû û berfireh nebûye. Ji ber vê jî biryara modernkirinê dan da ku wêjeya wan li gel hizr û hestên wan û aqilê serdemyane biguncîd” (Qadir, 2001: 24).

Evê komê weha hizir kir ku edebiyata wan ya hatîye teng kirin. Ev edebiyata wan neşê derbirîna hemû hizir û nerînên wan bike. Ji bo vê yekê hewl dan edebiyata xwe berev nûxwazîyê ve bikêşin û wê bikine edebiyateka serdemyane di gel fikir û nerînên wan birêvebiçe.

2.3.1. Egerên Serhildana Vê Komê

Derketina her komekê çî sîyasî be yan rewşennbîrî be pêdivî bi bername û kesên şareza heye, ji bo darêştina xebat û çalakîyên xwe. Eger destpêk bi rengêkî bi hêz nebe piştî demekê ji xebat û çalakîyan serbûr û şarezaiya wan pitir dibe, xebatên wan bihêztir û xûrit dibin. Em bi kurtî serhildana vê komê bi çend xalekan zelal bikin.

- Rêkêvtina 11ê adara, piştî çend salên hişk û rewşa edebî nehatiye hejandin. Ji çend alîyan ve dergeh vebû ji bo zêdebûna jimara kovar û rojnameyên kurdî re.

- Komên şanoyê, hunerên şewekariyê, stran, mosîqa kurdî berfireh bûn. Bi radeyeke kêr azadîya derbirîne zêdebû.

- Dîdî li vêrê hizra bangewazîya edebiyata nûxwazî bû cihê nîqaş û daxûyaniyan.

- Egereke din jî ew bû ku ewên xwe bi nûxwaz dihejmartin bi piranî edebiyatvanên ciwan bûn. Her weha karîger bûn bi wan nivîskarên wê demê yê cihanê re, wekî Albert Camus, Sartre...hwd. Li hêvîyên wan nêzîk bûn û asta rewşenbîrîyê giringî pêdan” (Hûsên, 2011: 17).

2.3.2. Damezrandina Komê

Damezrandina vê komê bandoreke mezin lis er komên din çê dike. Ev koma nûxwaz yekemîn koma kurdî bû ya li bakurê iraqê. Evê komê nivîskar, rewşenbîrên deverê yê xwedî ezmûn tê de karkirin. Piştî berfirehbûna vê komê, komên edebî û rewşenbîrî li cihên cuda cuda û li deverên cuda cuda yê kurdan serhildan û dest bi xebatên xwe yê edebî kirin.

Di derbarê damezrînerê vê komê de tê gotin ku damezrînerê vê komê yek ji kesên navdar û ronakbîr yê Kurd bûye ku ev jî helbestvan û nivîskar Şêrko Bêkes(1940-2013)^z bû. Ku wî hewl daye ku bi şewazeke nûxwazî giringîyê bide mijarên berîya xwe” (Raûf, 2009: 71). Bêgoman rewşenbîrekî wekî Şêrko Bêkes bandoreke mezin hebû di avakirina vê komê de. Navborî di gel hevalên xwe şiyar koma rewşenbîrî û edebî xwedî peyameka sîyasî damezrandin. Her weha peyva

“Rewange” yekemîn car ji alîyê navbîrî ve hatîye bikaranîn, paşan wan ev nav weke sernav ji bo koma xwe hilibijartine.

Yek ji jêderan amaje bi vê çendê dike ku ji bo cara yekem peyva “Rewange” ji alîyê Şêrko Bêkes ve hatîye bikaranîn. Belge di derbarê vê çendê de Şêrko Bêkes’e ku dibêje: “Hez dikim ev çanda bêzanîn ku peyva Rewange bi bingeha xwe de ya min bûye. Ev qas ku ez dizanim li navçeya Şarbajar li giredayî Silêmanî ji vî cihê bilind re tê gotin ku li ser lotkeyê ye an bilindîyeke ku ji bo nêrînê gelek başe, her çar derdorên xwe rind dibîne. Gelek caran jî ji bo nêçîrê tê bikaranîn û ev peyv di mêjîyê min de her mabû. Ev daxuyanîya ji alîyê her pênc ronakbîrên wek “Şêrko Bêkes, Hesên Arif, Kake Mem Botanî, Cemal Şarbajarî û Celal Mîrza Kerîm” di sala 25.04.1970yî de hate îmze kirin. Bi xwe dibêjin ku bangewazîya me di destpêkê de berîya her tiştekê sedem bûye û piştê jî encam” (Tahir, 2000: 200).

Komeka nûxwazî di sala 1970yî de li Bexdayê ji encamê derketina daxûyaniya 11ê adara heman salê guherînên mezin li ser asta cîhanê. Belavbûna çend daxûyanî û kovar û rojnameyên edebî bi zimanê erebî û bîyanî di derbarê nûxwazîyê de. “Wergertina erkê nûkirina helbestê bandora wan li ser nivîskar, helbestvanê kurd hate bicîh kirin. Di vê ser demê de damezrandina yeketîya nivîskarên kurd bûye palpiştekek bo bicîh kirina vê komê. Bi hevgerîna çend semînar û sazîyan li Bexda û Silêmanîyê rabûn, bûne palpiştekek bû berhevokina meydana nûxwazî di çend qadan de” (Tahir, 2000 :50). Anko ev daxûyanîya hatîye derkirin û di gel kovar û rojnameyên kurdî van hemûyan bandûreke mezin li ser bicîh kirina vê koma nûxwaz hebû. Her eve bûye eger edebîyata kurdî bête şilqandin. Ji vê der encamê komeka bi vî awayî li cem kurdên bakura îraqê bihête meydanê. Pişt re bo ku dest bi xebatê bikin di meydana edebiyata kurdî de gûhertin û fikr û nerînên xwe di edebiyatê de bicîh bikin.

Di derbarê serdema hizir û damezrandina vê komê de Kak Mem Botanî dibêje; Di havîna sala 1969an de civîna desteya demezrînerên yekitîya nivîskarên kurd dest pê kir. Ji bo ku pêngavên serkeftinên mezintir biavêjin. Hemû rihên nûxwazîyê dê havîne ser maseya dan û nûstanê. Bi hizra me weha baş bû. Bang bikin û nûxwazan li ba xwe kom bikin, li navenda werza beharê, yekemîn civîn li barega yekitîya nivîskaran li Bexdayê hat kirin. Min û Hisên Arif, Şêrko Bêkes û

Celal Mîrza Kerîm hazir bûn. Şêrko nûner bû. Piştî çend civînên dirêj çend xalek hate zalal kirin. Şêrko Bêkes ewî bi rengê edebî zelal kir. Di civîneka din de vexandin gûherîn tê de hat kirin. Me her çaran û Şêrko Bêkesî jî îmza kir (Ziyab, 2005:50).

Ev nivîsa yekemîn daxûyaniya koma rewange bû. Weke yekemîn daxûyaniya edebiyata kurdî dihête hejmartin. Di vê daxûyanîyê de bang ji bo yaxîbûn di hemû alîyên jîyanê de dikirin. Her weha daxwaz kirin berhemên edebiyata wan babetên nûxwaz bi xweve bigre. Banga wan ji bo edebiyata serdemê, berhemên edebî gelemperî ruxsareka delal pêbidin û naverok û babetên serdema xwe bin anko ji her hêlê ve li gor edebiyata serdema xwe berhemên xwe biafirînin.

Taybetiyên naveroka bangewazîya wan ku taybetiyên serekene ji van çend xalên li jêrê pêk dihat:

- Ev bangewazî ye. Ne tenê bangeka edebî yan ji bo helbestê ye, belkî bangeka civakî, sîyasî û rewşenbîrî bûye.
- Paldana gencan û hişyarkirina wan ji bo hizra avakirina giyaneke neteweyî li hember welatê xwe.
- Bangkirina edebî ya îro. Xebatkirin û yaxîbûne.
- Em dixwazin peyva kurdî rasterast ji hişkatîya edebiyata klasîk rizgar bikî.
- Bangkirina me ne barandine ji bo rondikên romantîkan ne jî wênekirina fotografa bizava rêyalîzma ye.
- Pêdivîye hemû peyv bijîn û cihê xwe bigrin.
- Roxsar û naverok ji hev cûda nebin.
- Em dest pêşxer nebûn. Berê me bizav hebûn, lê em cûda bûne.
- Divê her nivîskarek îro qalibê klasîk biêkîne, herdem di gel nivîdinê xebatkirî û cendê bit.

- Ji bo bilindkirina dengê xwe yê zelal, banga me teqînqka bi mereme (Mîro, 2008: 66).

Di van çend xalên li jor de bo me zelal bû bankirina vê komê ne tenê bangkirineke edebî ye. Bangeka civakî û edebî dihête naskirin. Bi gelemperî vê komê bangkirineke siyasî hebû. Dixwastin helbest di xizmeta neteweyê de be, merema xebatkirina sîyasî di gel ya edebî bicih bikin.

2.3.3. Kûrteyek ji Bangewazîya Wan

- Nivîsa me jan qebûl dike ji bo vê yekê em li hember janê xebatê dikin.
- Xweşikbûnê werdigirin. Ji bo vê yekê em nexweşikbûnê wernagirin.
- Nûxwaz e li hember kevnatî yaxî dibin.
- Serbest e û azad e. Em zincîran dişikînin.
- Mirovê kurd dinivîse û bo neteweya kurd dixebite (Hîto, 2012: 125).

Di van çend xalên li jor de bi awayeke gelemperî bangkirina xwe anîne ziman. Zilm û zordariyê qebûl nakin, serbestin, zincîran vedikin, nûxwazin û li kevnatîyan yaxî dibin, xweşikahîyê werdigirin nexweşikbûnê wernagirin. Di derbarê edebiyatê de dixwazin kevnatîya yaxî bibin, lê bi yekcarî red nekirin. Dixwazin wêrekîyê dilsozîya li hember neteweya xwe di nav edebiyata wan de rengvebide.

Lêkolîner Ferhad Şekalî li ser bagkirina wan weha dibêje; ev bangkirine pîtir belgenameyeka sîyasî û komelayetî derketî ye. Nivîserên Rewangeyê cûdatir ji me ezmûneka baş di karên sîyasî de hebû, peywendî li gel sîyasetmedar û deshelatên kurd, ne kurd û dezgayên edebî û ferhengî de xurt bûn. Belê ji alîyê têgehiştina nûxwazîyê ji me cûda bûn, ne nezan bûn. Tenê yek kes hebû wan zimanek cûda bizanibe cûda ji zimanê kurdî (Hîto, 2012:125). Li dor axaftina navborî, ku ev kome di bangewaziya xwe de ji alîyê sîyasetê de baş bûn, peywendîyeka xurt hebû li gel sîyasetmedaran yên kurd û yên ne kurd. Ji alîyê edebiyata nûxwaz nerînên wan cûda bûn. Navborî li ser banga vê komê, dikare were gotin ku bi awayekî negatîf lê nihêrî ye bi kesên jêhatî nedane dîyarkirin.

Ev bangewazîya vê komê, li dor wan xalên jor hatiye zelal kirin. Bangeka baş bû di biwarê edebiyatê de ji alîyê roxsar û naverokê ve ku yaxîbûn kiriye bingehê ji bo edebiyata xwe. Yaxîbûn ji çend layenên sîyasetê girte, bi rêya edebiyata xwe. Her weha li gor wan divê roxsar û naveroka helbestê hevgirtinek gelek baş hebe. Bi vî rengî dest bi bangkirina xwe kirin, ya di derbarê edeb û civak û komelayetî de.

2.3.4. Kovara Rewange

Evê komê ji bo xebat û weşanên xwe kovarek derxistin, bi navê Kovara Rewange. Li gor wan hindêk çavkanîyan tenê sê hejmarê vê kovarê derket. Her weha daxûyanîya xwe bi rêya vê kovarê aşkirakirîne ku desteka nivîskaran beşdar bibû di daxûyaniya wan de.

Koma Rewangeyê, kovara xwe bi jêr navê “Rewage” dan weşandin. Hizr û bîrên xwe di nav de zelal kirin, tenê sê hejmar derketin. Di hejmara yekê ya vê kovarê de daxûyanîya Rewangeyê tê da hatiye weşandin. Her weha dirûşma “Rewange” li ser berga hejmare yekê hatiye xwar û dibêje; gotinek nû, hizrek nû û kiryareka nû (Qadir, 2001:85).

Di vê kovarê de hemû fikir û nerînên wan helbestvanan yê li ser edebiyat bi taybet jî li ser helbestê dihate weşandin. Her weha rewange weke kovareka serdemane dihate nasîn, ji ber ku hizir û nêrînên wan helbestvanan nûxwaz bûn. Hunerên taze anîne meydana edebiyata kurdî bi rêya vê kovara ku tenê sê hejmarê wê derket.

Her wekî di pirtûka Hîmdad Hûsên de hatiye Kovara Rewange ketibû ber tîrojka roja serdema salên heftêyan. Ew serdeme fikreka cuda û taze cîhan hejandibû (Hûsên, 2011: 19). Ku edebîyata nûxwaz di cîhanê de dengveda bû, wan helbestvanên di vê komê de cih digirtin ji bo fikrên xwe bigehînin. Birêya vê kovarê nerîn û fikrên xwe danîne berçavên civaka kurdan.

Desteka nivîskarên başdar bûn di kovara Rewangeyê de ev bûn: Hisên Arif, Kake Mem Botanî, Celal Mîrza Kerîm, Cemal Şar Bajêrî, Ebdullah Peşew, Ebdullah Ebas, Reuf Bêgerd, Kemal Reuf Muhemed, Muhemed Reşîd Fetah, Muhemed Ferîk Hesên, Letîf Helmet, Sediredîn Arif, Reuf Hesên, Ehmed Şekalî, Selal Minmî,

Se'dullah Peroj... hwd (Qadir, 2001: 92). Eve komeka wan helbestvana bûn di kovara "Rewange" de dinivîsandin.

Babetên sereke yê nê komê di derbarê wêjeyê da piranî çîrok, dastan, pexşan û helbest bûn. Ji hêla teknîk û naveroka helbestê gelek tişt di derbarê wan da hene ku di naveroka helbesta wan de girîngî bi wan hatîye dayîn. Lêgerîna rastîyê, derbirîna çend hizrên felsefî, hesta xoşewîstîyê li hember gelê Kurd û xaka Başûr, hesta xoşewîstîya mirovatîyê û her weha behsa bîrsîtî û hejarîya gelê Kurd ya li hember dijminên Kurdan (Ziyab, 2005: 53). Anko vê komê xwe ji êş û azarên gelê xwe dûr nekir û armanca xwe ji bîr nekir. Girîngî da lêgerîna rastîyê û xwe bi gelê xwe ve girêdan da ku bikaribin mirovayetîya gelê Kurd berçav bikin.

Ji hêla naverokê ve yaxîbûn girîngtirîn babetê wan bû. Redkirina urf û 'edetên kevin yê civakê û desthilatdarîya ayînî û sîyasî dikirin. Bangewazî dikirin ji bo yaxîbûn ji komelayetîyê. Yaxîbûn li dijî desthilata ayînî, yaxîbûn li dijî nerîtên kevin yê nava civakê de, yaxîbûn li dijî desthilata sîyasî" (Nûrî, 2011, 123).

Girîngtirîn kar û berhemên vê komê ev bû ku dergehê ji bo danûstandin û vekolîn û rexneya edebî vekir. Rojname û kovarên Kurdî gelek pêş birin û her wekî helbestkar û yek ji endamê çalak yê vê komê Şêrko Bêkes li ser vê çendê dibêje ku: Vê çendê xwe bi xwe awayeke bizavê ava kir. Nivîsîna wan gotar û rexneyan di her hêlê de ji bo cara yekem ev pîrsa rexneyê bi xwe re anî vêca çî erênî be an neyînî (Ziyab, 2005: 51).

Lêbelê li gel vê çendê jî gelek dijayetî û rexne ji alîyê rexnegiran ve li vê komê hatin kirin. Her çiqas ku vê komê gelek xebat û xizmet ji bo ziman û wêjeya Kurdî kirin jî rastî rexneyeke tund û dijwar hatin. Ev jî ji ber ku bangewazîya wan bangewazîyeke sîyasî bûye. Anko Rewange bibû bangewazîya hizbî ku ev jî xaleke lawaz bû, ji ber ku nebû sedema guherîneke girîng ji hêla rûxsar û naveroka helbesta Kurdî. Ji ber vê jî vê komê nekarîbû berdewamîyê bi xebatên xwe bike û lawaz bû. Li gor hindek çavkanîyan lawazbûn û nemana vê komê vedigere bo salên 1973 yan paştir.

Nimûneya di nav koma Rewange da hatîye wergirtine helbesteka helbestvanê mezin yê Kurd Şêrko Bêkes e. Ev jî helbesta wî ya bi navê “Le Jêrewê” ye ku dibeje:

Le jêr keştîy şarekeman

Le jêr mêzerî gewreya

Le nav qubbey minareya

Rojê hezar beçeke rêwîye

Çav zît ejên

Rojê hezar

Rojê milyon

Suwend û belên

le tenafî benge xwênî abroyeve

Hel ewasirên (Bêkes, 2006: 372).

Şîrovekirina Vê Helbestê

Herwekî ji navûnîşanê vê helbestê xuya ye ku “Lejêrewê” ye, helbestvan xwastîye bi rengekê eşkere behsa binemayekî modernîzmê bike. Di vê helbestê de helbestvan pirseke girîng tîne rojevê ku ev jî dijayetîkirina bikaranîna ayînê ye bo mebestên taybetî û xizmeteke ayînî bo berjewendîyên civakî û urf û ‘edetên komelayetî. Wekî me amaje pêkir ji nav û nîşanî xuya dibe ku ev cûre kese jêrbijêr û bi awayeke weşartî mifa ji vê çendê werdigirin. Helbestvan di vê helbesta xwe de du pirsên gelek girîng û hestîyar yên civaka Kurdewarî aşkere dike ku ev jî evin:

- Sûdwegirtina ji ayînê ji bo berjewendîyên şexsî.

Li vir her wekî ji helbestê jî xuya dibe, helbestvan civaka xwe pêş çavên me berceste dike ku çawa li bin rewşa bajara wî de hin kesên berjewendîxwaz hene û li jêr navê ayîn û xelet têgehiştina vê bi wan kinc û cil û bergan li “Cihên Pîroz” yên mîna mizgeftê xelkî fêrî tundrewî û tundutîya ayînî dikin. Ku ev yek jî li cem wî wekî karesatekêye ji bo civakê dema dibêje; “Hezar beçke rêwî çawzîq ejîn” li vire herzar çêlîkên çawzîqên rowîyan, merema wî ev feqe û şagirtên olî ne ku li cem melayekê bi wî rengî hînî zanist û zanîyarîyên olî dibin. Helbet ev şagirt dê bine cihê

xwelîserî û kanbaxîyê ji bo civakê û ev jî dê bi tundtirîn şêwe hizra tundrewa ayînî di nava xelkî de belav bikin.

Bi vê çendê jî dê mala hezaran kesan mîrat û xerab bikin; lewre jî helbestvan li vir bi tundî û dijwarî dijî vê dîyardeya metirsîdar di nav civaka xwe ya Kurdewarî de radiweste. Şîret û amojgarîyê dide xelkê xwe da ku bi vê yekê neyên xapandin û serdebirin.

Di demê mela û zelumên ayînî rexne li koma “Rewange” hebû. Ji ber vê wan weha hizir fikir dijî ayînin bi navê nûxwazîya pêşkeftî. Şêrko Bêkes li dijî kevneperistinê mijara xwe darişt, her wekî di van nîvrêzên li jor amaje pêbû xûyadibe (Hûsên, 2011: 62). Her wekî bo me zalal bû di nav helbestên xwe de rexne li zelumên ayînî girtîye, ji ber ku ayînî di xizmeta berjewendîyên taybet de bikaranîne. Her weha wan zelumên ayînî Şêrko Bêkes rexne kirine, angaşt wan ew bû ku Bêkes bi navê nûxwazîya edebî êrîş û rexneyê li me dike ku ew bi xwe rast nîne. Bi vî awayî li hember Bêkes disekinîn.

- Kuştina nifşê me di civaka Kurdî de

Di parçeyê duyem ya vê helbestê de Şêrko Bêkes behsa mijareke din a gelek metirsîdar û berbelav di civaka Kurdî de dike ku ev jî pirsra paqijkirina namûsê ye, bi rêya ayînê. Ew li vêrê bi tundî dijî vê dîyardeya naşîrîn a di civakê de radiweste ka çawa dab û nerît û tîtalên civaka Kurdewarî heta xwe dijî ayînêne û sûd ji ayînê jî nagirin.

Ji bo çareserkirina van cûreyê pirsan, belkî pêwîste yekser bi hinceta namûs û rûmetê ev kes bêkuştin da ku careke din zelumê Kurd bikaribe serê xwe hilde û hest bi mêranîya xwe bike. Anko her wekî ji vê mînakê jî bo me eşkere dibe Şêrko Bêkes di vê helbesta xwe de bi başî mifa ji binemayên modernîzmê digre û bi rêya vê peyama xwe ya şîrî digehîne me û me berceste (Hildibêjire) dike.

2.4. Koma Wêran (1994)

Piştî raperîna sala 1991ê zayînî û têperbûna herêma Başûr di hin qonaxên cuda de wek berpabûna şerê navxwe û wisa ev kom hate nava meydana wêjeya

Kurdî de ji bo modernkirina hêlên jîyana kesê Kurd ku xwedî dirûşmeke ciwan bû. Lewre gotîne pêwîst e ku pir modern bin û di wî karî de bi awayeke reha û azad bin.

Derbarê mêjûya avabûna vê komê de Dr. Ferhad Pîrbal ku yek ji helbestvan û navdarên Kurd e dibêje ku: Dîroka avakirina koma Wêran ji bo salên 1992-1993yê vedigere (Osman, 1999: 55). Ku wê demê ez li Fransayê dijîyam û li gel nivîskar û helbestkar Ehmedê Mela me hevdu naskir û min seferek bo Başûr kir, li gel biraderên Hewlêrê jî axiftim ew jî ebebûn “Mehmod Zamdar, Ebas Abdullah Yusuf, Haşim Serac, Azad Mohemed Şerîf” hwd. Min got ku dikarin projeyekê cîbicî bikin. Dîroka vê vedigere sala 1994ê de avabûye” (Hîto, 2012: 148). Anko ev koma ji aliyê nivîskarê jêhatî Ferhad Pîrbal û hevalên wî ve hatîye damezrandin.

Li gor lêkolîner Abdullah ev xalên li jêr bûn sedem ku endamên Koma Wêranê têkevin nav hewldaneke bi vî rengî:

- Ew serdema ku nivîskarên sereke di danana vê komê de “Ferhad Pîrbal, Ehmed Mela, Rizkar Abdullah, Nezed Begîyaxanî, Mihabad Qeredaxî” hwd. Sebaret huner û wêjeyê destpêkirin yê hatine veqetandin ji wêjeya miletê xwe.

- Piştî serdemeka dirêj ji wêje û kûltûra netewa xwe bo dema deh salan hatibûne veqetandin bi rengeke taze û raste rast peywendî bi wêjeya kurdî li deverên herêmê kirin.

- Dema ku wan destpêkirin hindêk êş û azar û nexweşî yê wekhev yê nûxwazîyê hene. Yê nivîserên ji derveyî welatî û di nav welatî de” Haşim Serac, Dilşad Abdullah, Ebas Abdullah, Selah Omer, Newzad Rif 'd’ ... hwd hene (Ziyab, 2005: 64).

Anko serhildana vê komê nivîskar û damezrînerê wê hestpêkir ku ji edebîyata netewa xwe yê dûr ketin. Veqetyanek di nava wan û wêjeya wan da heye ku diviyabû ev problem ji holê rabe. Ji bo nûkirina wêjeyê fikrên wan ên di derbarê vê babetê de nêzî hev bûn, li ser damezradin û nûkirina cûreyên wêjeyê hevnerîn bûn. Lewre di demeke zêde ne dirêj de li ba hev kom bûn û dest bi xebatên xwe kirin. Peyva “Wêran” wek nav ji bo vê komê hîlbijartine, her wekî ev peyv ji sê serkanîyan ji dayik dibe.

- Ji ber vê çendê ku wêranîya maddî û derûnîya ku vê dema gele Kurd tê de dijîya.
- Pêdivî bi wêrankirina koşk û zîvaye yên ku li ser wêranîyê hatîne ava kirin.
- Ev wêrankirna miletê me, pêdivî pê heye ku em xwe zehmet bidin, ev koma bi navê wêran dahênan berev pêş here (Hîto, 2012: 149).

Anko yaxîbûn ku li ser hemû berhemên berê xwe, modernîzmê pêkbînî û di qalibeke berteng de nemînin.

2.4.1. Kovara Komê

Endamên Koma Wêranê dixwastin hizir û fikrên xwe bidine nîşandan ji bo vê jî wan kovarek bi navê “Wêran” derxistin û bi rê û derfetên wê xebatên xwe bihêz kirin û fikrên xwe belav kirin. Koma Wêran kovarek li jêr navê “Wêran” di sala 1994an de li Hewlêrê hat weşandin ku hizir û nivîsandinên xwe yê nûxwazîyê tê de eşkera kirin. Bi tinê şeş hejmar ji vê kovarê derkirin, piştî derketina hejmara şeşê ji vê kovarê, bizav û xebatên endamên hevnerîn di vê bizava nûxwazîya “Wêran”de ji hev hatine veqetandin û kovar jî hate ragirtin. Çûnkî pîranîya heqê derxistina kovarê li ser milê “Ferhad Pîrbalî” û nivîserên din yê kurd bû. Paşê nekarîna xercîya parê kovarê bidin. Her wesa nebûna berhemên nûtir û cûda jî sedemek din bû bo rawestana vê kovarê (Ziyab, 2005: 64). Anko ev kovara “Wêran” nivîskarên vê komê fikir û nêrînan xwe tê de der dikirin. Evê kovarê şeş daneyên cûda cûda derketin. Lê piştî daneya şeşê ev bizavên wan yê li ser wêjeya nûxwazî bi dawî hat. Wekîli şav kanîya li jor egerê vê veqetiyane nebûna xercîya parê kovarê bûye, eve jî sedem bû kovar bisekine ji xebatên xwe.

Her weha derbarê piroja kovara “Wêran” bi dîtina Sebah Rencder ev kome bi awayeke rasterast ji wêjeya Fransayê texlîd dike. Anko tu tişt li wêjeya Kurdî zêde nekirîye û wêjeya me kirîye êxsîrê wêjeya Fransayê” (Hîto, 2012: 149). Anko bi awayekî din ev rexnegir û nivîskarê navborî rexneyê li xebatên vê komê digre. Bi dîtina navborî evê komê tiştêkê jêhatî bo wêjeya kurdî nekirîye. Bi nêrîna min li ser wan çavkanîyên me xwendin di derbarê vê komê de, evê komê xebat û gûherîn bi ser

wêjeya kurdîda îname. Yaxîbûn û bingehên nûxwazîyê xistine nava wêjeya kurdî, berfirehbûn û geşe bi xwe ve zelal kirîye.

Her weha dirûşmê nûxwazîyê di kovarê de hatîne weşandin, evê komê di hemû xebatên xwe yê wêjeyî ev dirûşme îname her wekî kovara wêranê de hatîye, dibêje; “Pêdivîye heta wê radeyê nûxwaz bin, di nûkirinê de bi awayeke jêhatî azadbin” (Dirûşma Komê, 1994: b, 1). Anko vê komê ev dirûşim bilind dikir ku ji bo her astengîyekê li hember wan em ne sekinin nûkirina xwe bi xebatên jêhatî dewam bikin. Her wekî di dirûşma wan de ev çende bi zelalî aşkîra dibe.

Kovara Wêran amrazê girîng bû, ji bo hizr û nêrînên nûxwazîyê. Bi rêya vê kovarê fikrên xwe xistine berçav. Yekem kovara kurdî ye ku nûxwazî kire binema û babetên xwe rêxistin xwe ji çarçûva teqlîd kirinê havêt (Ehmed, 1994: 3). Anko ev kovara wêran yekem kovar bû, li ser devera bakura îraqê ji bo bi temamî li ser bingeha nûxwazîyê babetên xwe zelal bike.

Koma Wêran tevî xebatên wêjeyî hindek xebatên din jî bi rê ve bir ku evên li jêr xal bi xal hatine destnîşankirin hinek ji wan xebatan e. Di vira de bi awayekî eşkere xuya dibe ku endamên vê komê ji bilî edebiyatê bi huneren wek wêne, film û fotografîyê jî xebat meşandine:

- Vekirina ciheke hunerî li jêr navê “Wêran li Silêmanîyê” li barega “Sorkêyo” di sala 1995an de.

- Vekirina civîneka helbesta û mosîqê li jêr navê “Bila helbesta Wêran be, Ji bo Wêranî li lêr Wêrana jiyane, yê dixwazin Wêranê Wêran bikin” bo helbestvan “Zana Xelîl” di sala 18.6.1995an de li barega rewşenbîrî û millet li Hewlêrê.

- Vekirina ciheke pêkhatîye ji “Şeş” wênegiran ku kirine pûstekar yek riste li ser piştê wan nivîsandine di sala 27. 3. 1995an de li baregayê Kovara Wêranê.

- Vekirina ciheke “60” wêne filmê silayid li ser wêneyên kurdan li barega mêdyâ, di sala 13.5.1996an de bi ser destê nivîskarê jêhatî “Ferhad Pîrbal”.

- Vekirina ciheke wêneyan li ser wêneyên kurdan, li Erşîfa Kurd nîyasîn Ewropa li barega “Mêdîya” li jêr navê “Di Şikastinê de Dar Xwe Radipêçe” (Ziyab, 2005: 66).

Evê komê cûda ji derkirina “Kovara Wêran” bi vekirina çendîn cih û pêşangehan ve li Silêmanîyê û cihên cûda ev bizav û xebatên di derbarê wêje û hunerê de kirin. Ji bo me aşkera dike, ka ev kom çend girînge li ser wêjeya kurdî û kurdên îraqê bi taybet. Yek ji wan karan yên ku vê komê kirîye damezrandina sazîyeka bi navê Wêran bû ku hejmarek nivîskar û ronakbîran di vê qewarê de gehîştin hev û berhemên xwe belav kirin. Lêbelê mixabin ev sazî hate rakirin ji ber nebûna palpiştî ji hêla aborî û belavkirina berhemên hêja de (Ziyab, 2005: 64).

Koma Wêran di hejmara yekê ya kovara Wêran de ji destpêkê heya rûpel 9an daxûyanîya xwe weşandîye. Ev daxûyanîya wan ji alîyê van nivîskaran “Rizgar Abdullah, Haşim Serac, Ebas Abdullah Usuf, Dilşad Abdullah, Namiq Alî Qadir, Alî Qeredaxî, Selam Omer, Azad Mohemed Şerîf, Fehad Pîrbal, Ehmed Mela” herweha evê komê fikr û nêrînên xwe bi rêka vê daxûyanîyê zelal kirin.

2.4.2. Kurtîyek ji Armancên Daxûyanîya Komê

- Bila ev dêr bi xwe bibe zelal kirinek, lê em di nav de wenda nebin. Belku em rastîyeka aşkera bin ku mirovê kurd li ser pêdivîye ligel serdema bîst û yekan xwe biguncîne. Bi renekê azad bawerî me bi azadî ya yên din hene.

- Em bazeneyeka girtî nebûn, yek deng û yek reng nebûn, em çend dengên cûda cûdane. Ji bo evê pirojê em li hev kombûn, çûnkî bi cih kirina vê pirojê xewna me bû.

- Em yê li ser demeka nû dijîn, mirovê nûne, hest bi azadiya xwe dikin. Nabin bi reng û awayeke kevin xwe zelal bikin, em li hember pêşketinê xwe bi berpisyar bidine zanîn, keviran dê biaavêjin ji bo mejîyê me zîndî bibe.

- Xewin beşeka zîndî ya mirovî ye, xezîne li bin nehatine dîtin. Li vêrê dergehên xewinên xwe dê biavêjin ser piştê, ji bo karê pêşketinê bi yasaya ji derve û rêzimanê li qalibekê nedin, belku pêşkeftina me bi xebatên me bixwe be.

• Wêran bangewazîya evê nake yan rêbazeke yan jî ne bi ser dibistanekê ne belku çend dengekên cûda ne ji bo nûxwazîyê, nûwkirinê, azadîyê û hemû gîyan û hizrên pêşveçûnê. Li ser helbestvan pêdivîye bi rengekê fireh serdemyane bin, heya wî away nûxwaz be, bi awayeke fireh di nûkirinê de azad be (Daxûyanî, 1994b: 1).

Di nav van armancên vê komê de ji bo me zelal bû, evê komê bi awayekê zelal û berbiçav, hewla nûxwazîyê û nûkirinê daye. Xwastîye ji hemû alîyan de karbike li ser mêjîyê mirovê Kurd, fikrên nû û zindî li cem wan ava bike, ji hemû kevnaftîyan dûr be. Ji alîyê wêjeyê de nûkirinê tê de zelal bikin, pêdivî ye helbestvan heya wî away nûxwaz be ji nûkarîyê ne tirse yaxîbûnê li hember sîyaset û civakî bikarbîne di wêjeyê de. Di wêjeyê de heya wî away nûkar bin, yasa qeydan bişkînin, bi awayeke bê sirûd di nûkirinê de azad bin.

Babetên sereke yê wê komê di hêla wêjeyê de zêdetir çîrok û dastan û pexşan û helbest bûn. Ji hêla teknîkî û naveroka helbesta wan gelek boçûn li pey xwe anîne ku di naveroka helbestên wan de girîngî bi “lêgerîna rastîyê û derbirîna çendîn hizrên felsefî, hesta xweşwîstinê li hember gelê Kurd û xaka Başûr û hesta xweşwîstina mirovahîyê û her weha behsa bîrsîtî û hejarîya gelê Kurd û mirovê Kurd li hember dijminên milletê Kurd hatîye dan” (Ziyab, 2005: 53). Anko vê komê xwe ji êş û azarên gelê xwe dûr nekirin. Armanca xwe ji bîr nekir û girîngî bi lêgerîna rastîyê de û xwe bi gelê xwe ve girêda ku bikaribe mirovayetîyên gelê xwe berçav bigire. Ji hêla naverokê ve jî yaxîbûn girîngtirîn babetê wan bûye ku reda urf û ‘edetên kevin yê civakê û desthilata ayînî û sîyasî dikir.

Digel vê bangewazîya yaxîbûna civakî dikir. Yaxîbûn li dijî desthilata ayînî û yaxîbûn li dijî nerîtên kevin yê di nava civakê de, yaxîbûn li dijî desthilata sîyasî” (Nûrî, 2011: 123). Anko vê komê li ser bingeha nûwêxazîyê yaxîbûn li ayînî û sîyasetê û civakî digirt.

Mînak:

Nimûneya jêr ji Koma Nûxwaza Wêran ku helbesta Hotel Parades a Ferhad Pîrbal e, ew di vê helbestê de dibêje:

Hotel Parades

Lem serzemîne panûpure da
Le şarêkî feramûşkirawî qerax awareyî da
Le hotêlêkî derece nû
Le jûrêk
Le qujbinkî kesîre da
Bê agirdan
Tenya
Danîştûm be dîyar
Çend resmêkî yazdeh sal pêş emro ve
D
E
G
R
Î
M (Pîrbal, 2005: 46).

Şîrovekirina Helbestê

Eger em li vê helbesta nûxwaz a “Ferhad Pîrbal” binêrin ji bo me xuya dibe ku di destpêkê de helbestvan ji civaka xwe yaxî bûye. Civak bi cih hêlaye û jê bar kirîye, bi misogerî jî rewşa aloz û nalebar a civaka wî bûye egerê dirustbûna serencameke bi wî rengî ku ji wargehê xwe koçber bibe û ber bi xerîbîyê ve biçe û rastî hevîbûnê bibe.

Nivîskar û helbestvan Hîzirvan Ebdullah li ser helbesta wî çî gotîye; Feryad Pîrbal yek ji wan nûxwazane pitir di bê yasa avakirinê li ser wêjeyê dike. Ez dikarim bêjim havîye, kartêkirineka fireh li ser nûxwazîya kurdên îraqê kirye. Danasandîna fûrmên cîhanî bo nav qada wêje û hizra kurdî” (Duhokî, 2008: 256). Anko nivîskar Ferhad Pîrbal karkirineka fireh li ser wêjeya nûxwaza kurdî kirîye.

Helbestvan di helbesta xwe de behsa vê reşbînîyê dike. Ku ev jî binemayeke bihêz ye nûxwazîyê ye. Ev rastî xerîbîyê, bêkesî, bêxwedanî û hejarîyê bûye, li vê derê ji pîranîya pêwîstîyên jîyana hejî bêpar e ku li vir heta asteke bilind ev derencama yaxîbûna xwe dibîne.

Ev li qulçikeke tarî dema xwe bi tenê diborîne û take tiştê ku dilê wî xweş û şad dike, çend wêneyên wî yên berê ne. Di vê navberê de ji bo tenêkirina nax û derûna xwe ew her weha xwe dibe ber giryanê. Ku bi vê rêyê ev hindêk ji agirê derûnê xwe tena dike anko her wek ji bo me xuya dibe, hizra serekî a vê helbestê ku serencamê yaxîbûnê ye reşbînî ye li bal helbestvan.

Nivîskar “Tele’t” bi vî awayî li ser helbesta wî dibêje; her çî nivîsandibe hin kes li gel bûne hin kes li dijî wî bûne. Yên di gel bûne dest xweşî lê kirin qet bê deng nebûn, nûxwazî li def hebûye, tiştê di nav xwe de ji bo derve biavêje yê di nav xwe de dihelîne (Duhokî, 2008: 257). Anko ewa “Ferhad Pîrbal” dikir, tiştêkê nûxwaz bû, bi awayeke tund li hember kevnatîyê bû. Navborî bi vî alîyê xwe yê cûda ji nivîskar û helbestvanên din, bûye nivîskareke jêhatî di nav koma Wêranê bi taybet di nava wêjeya kurdî de.

Her weha li dor vê komê komeka nûxwaz li devera Behdînan li jêr navê “Nûkirin Her û Her” derdikeve, helbestvan Hızirvan Ebdullah ku teza me jêr navê Mînakên Helbestên wî hetîye avakirin yek ji wan endamên vê komê ye.

2.5. Koma Nûkirina Her û Her (1994)

Piştî ku berfirehîya ronakbîrîyê li başûr di sala 1991ê de ji hêla weşandina hejmareke geleka kovar û rojname û pirtûk û namêlke dîwanên helbestê, avabûna çendîn navendên nû li bajarên piçûk û azadîya derbirîna bîrûboçûn û raya ronakbîran li vir bizavek çêbû. Di dawîya sala 1994an de li Duhokê piranîya wan hewildabûn di navbera salên 1985-1988an de ji alîyê hin helbestvanan ve hat kirin ji bo nûjenkirina helbestê ji hêla şikl û naverokê ve ku ev jî ji alîyê komekê bi navê Nûkirina Her û Her li devera Behdînan hat kirin. Ev kom ji wan helbestvan û ronakbîran pêk dihat mîna Mohsên Qoçan, Fazil Omer, Şokrî Şehbaz, Arif Hîto, Selman Kolî û Hızirvan Ebdullah (Ziyab, 2005: 83).

2.5.1. Hizra Avakirina Koma Her û Her

Derbarê hizra avakirina komê de piranîya helbestvanên vê komê weha dane aşkira kirin ku hizra avabûna vê komê ya me hemûya ne. Lê Muhsên Qoçan dibêje;

ev hizr ya min bûye min daxwaza hevala kir bi hevra bicivin da ku em komeka nûxwaz li deverê damezrênin.

Di encama kartêkirina çend sedem û bi sûdgirtin ji çavkanîyên girîng hizra damezrandina vê komê jî bi awayekî hevpişk peyda bûye, anko rêja zêdetir komî bûye heta ku takekesî be (Nihêlî, 2013: 14). Anko hizra danana vê komê zêdetir komî bûye. Heval bi hevre civîyane hizreke bi vî awayî di mejîyê wan de derbaz dibe.

Di derbarê kesê sereke di hizra danan û pêkanîna koma nûxwaz a “Nûkirin Her û Her” bal kesayetîyên beşdar di vê komê de bîrûboçûnên ciyawaz hene. Tenê Mohsên Qocan xwe weke kesê sereke di hizra danan û pêkanîna vê komê dide nasandin. Yê din vê çendê vedigerînin encama bi hevre rûniştin û danûstandinan û encama vê hizra ku komî ye. Her wekî ku Muhsên Qocan dibêje: Destpêka danîna vê komê ez bûme û ez serkêşê sereke yê vê komê bûme ji ber ku min ji hevalan daxwaz kir ku bi hevre kom bibin û komeke nûxwaz di biwarê helbestê de pêk bînin. Her weha zêdetir ji hemû kesê min kûr û seminar li ser hewl û bizavên me yê nivîsîna nûxwazîyê xuyakirin. Armanç û wateyê hozanê gêraye û hizra danana bersivan ji bo wan kesên ku êrîş dikirine ser bizava me ya helbesta nûxwazî pêşkêş kirine (Ziyab, 2005: 83). Anko ev kome pitir ji hizreka hevpa çêbûye. Belê nivîskar Muhsên Qocan xwe bi kesê herî sereke didane di nava vê komê. Ku min ji hemû yam pitir simînar û civîn danîne li ser hizir kirin û avabûna komê.

Lê Dr. Arif Hîto dibêje destpêka avakirina vê komê di zivistana sala 1994an de bi hevre ji aliyê Jûra Yekîtiya Nivîskarên Kurd şaxa Duhokê bû. Dema ku em rûniştibûn û me danûstandin li ser rewşa ronakbîrîyê û helbesta deverê dikir. Her weha Hızirvan Ebdullah dibêje ku ji ber ku karê me yê koma nûkirina Her û Her zêdetir giştî ye, ji ber vê jî xuya nabe ku kê xwedîyê vê hizrê ye, ji ber ku avakirina vê zêdetir komî ye heta takekesî” (Ziyab, 2005:84). Li gor axaftinên navborî kû zelal kir hirza damezrandina vê komê bi hevra bo me. Ji encamên civîn û semînarên bi komî bûye. Bi nêrîna min li gor axaftinên van nivîskaran, ev hizr ya komî ye ne ya kesekî bi tenê ye.

Li devera Behdînan û bi taybet jî li bajarê Duhokê wek bajarên din yê Başûr hest bi vê çendê hat kirin ku nûkirin di hêla wêjeyê de bikin. Cuda ji wêjeyên din wekî “Folklorî Klasîk û Modern” bi taybetî ji hêla helbestê û her du hêlên vê anko “Rûxsar û Naverok”ê ve. Ev guherîn hatîye encam dan ji ber ku helbest yek ji wan cureyên wêjeyî ye ku zêdetir ji janrên din yê wêjeya di nava civaka Kurdî de tê xwandin. Paşê gelekî belav dibe, ji ber vê jî vê komê bi nihêrîneke modern nêzîkî li helbestê kir. Serhildan û damezrandina vê komê vedigere dawîya sala 1994ê zayînî. Hizra damezrandina vê komê ji alîyê çend nivîskar û ronakbîran ve bûye wek Mohsên Qoçan, Fazil Omer, Şukrî Şehbaz, Arif Hîto, Selman Kûlî û Hizirvan Ebdullah (Hevpeyvîn, Ebdullah, 24.10. 2018). Ewe ew nivîskar û ronakbîr bûn yê ev koma nûxwazîyê li devera Behdînan damezrandin

2.5.2. Armanca Damezrandina Komê

Damezrandina her komekê di derbarê wêjeyê û helbestê de, ji bo destveanîna hindek armancan kar dîkin. Ev endamên beşdar di vê komê de li ser hindek armancan hev hizr û nêrînî. Ew kesên kar dikirin di vê komê de fikir û hizrê wan nêzîkî hev in, di armancên xwe de jî li hev nêzîk bûn.

Li gor armanca koma Nûkirina Her û Her Arif Hîto dibêje; Damezrandina komê ji bo vê bû ku hin guherîn di karê derbirîna hestên berfireh yê şî’rî ku erkê xwe caran ji dest nede û me ji ber vê erkê helbestê destpê kir. Piştî naverok û rûxsar jî guherandin û li cihê ku helbest rênîşander be me hewl da ku bikin alavek kelecane. Li cihê ku xwendevan tenê werbigre, me hewl da wî neçar bikin ku digel helbestvan hizrê di naverok û rûxsar û derbirînê de bike. Li dewsa ku ceveng wêneyê dawî komkerê mebestê be me rêz û hevokên serbixwe havêtine nava leşê helbestê de anko li dewsa ku helbest dakokîyê li der azadîya komî bike, dakokî li ser azadîya kesane hat kirin. Li dewsa ku helbest li ser xetekê birêve biçe, me hewl da ku bikin baxçeyek pîrgul û pirreng û pirsazî (Nihêlî, 2013:17). Anko li gor axaftinên navborî wan xwastîye helbestê bi rêyeke nûxwaz binivîsin ku xwendevan tenê wergirê helbestê nebe, wî neçar bikin digel xwendevanî hizir di naverok û roxsara helbestê da bike derbirînê ji nava helbestê bike.

2.5.3. Hizirvan Ebdullah Armancên Komê Di Wan Xalan De Dîyar Dike

1. Pêdivîbûna şêlqandina erênî da ku berhemên baştir peyda bibin.
2. Girîngîdan bi avakirina wêneyê da ku wêne li şûna şîrovekirinan ramanê bigehîne.
3. Derkirina peyvê ji ramana wê ya ferhengî û hizrkirin berev verêja peyvê.
4. Deq bi giştî deqeke vekirî be û bikaranîna hemû cûreyên xwendinê werbigre.
5. Topografîya deqê bibe pişkek ji raman, rehendên deqê ve û deq bi tenê bi bihîstinê bidawî neyê. Di şêwazê û darêştinê de xwendevan an werger neçarê dîtina vê deqê be wek jîndareke zindî.
6. Peyv bê barkirin da ku deq bi hêsanî xwe bi dest wergerî ve ber nede û werger neçar be ku pişkdariyê di darêştina ramanên naxê deqê de bike.
7. Deq ji sînorê navçeyê yan welat derbaz be û ber bi gerdunîbûnê ve biçe” (Nihêlî, 2013: 18).

Hizirvan Abdullah armancên damezrandina vê komê weha bo me zelal dike, pêdivî bû em wêjeya xwe bişilqînin da ku berhemên jêhatî bi dest xwe ve bînin. Her weha pir bi raman bikin da ku hizir kirin li ser peyvan çêbibe. Deqê me yê vekirîbe da hizir li ser helbestê bihê kirin. Di van armancan de hemû ji bo vê yekê ye karkirin li ser mejûyû mirovê kurd xwendekarê kurd bihê kirin ji bo ku bifikire, ber bi nûkirinê nûxwazbûnêve biçe.

Dr. Fazil Omer dibêje ku merem ji derkirin û pêkanîna vê koma nûxwazîyê ya li devera behdînanê di nava çend xalan de dîyar dibe, ji ber ku:

1. Jîyan guherîn e û her tiştê ku neyê guherîn zêdetir nêzî mirinê dibe heta saxbûnê. Ji ber vê jî pêdivîye wêjeya me jî nû bibe û ji wêjeya gerdunê paşve nemîne.

2. Civaka Kurdî bi taybetî devera behdînan paşvemayî ye û ji ber vê jî pêwîste ku bê guherîn û ber bi pêşve biçê.

3. Bêyî nûkirin û avêtina pêngavan bi pêş nayê asta civakên din yên cîhanê.

4. Wêjeya me heta sala 1991ê bûye koleyê hesta bindestiyê lê piştî salên 1991ê wêje ji sîyasetê hat cuda kirin (Ziyab, 2005:84).

Di van çend xalan de weha zelal, armanc ji vê komê ew e, divê mirovê kurd jîyana wan bihê guherîn her tiştê neyê guherîn weke mirinê dane xûyakirin. Weha difikirin ku civaka wan ber bi paşde mane, mejîyê wan ber bi paşde maye divîya guherîn li ser bihê kirin, civaka xwe ber bi pêşkeftinê û nûxwaziyê ve bibe.

2.5.4. Çalakîyên Komê

Hel komeka wêjey bihête damezrandin pêdivî bi dezgeh û sazîyane, ji bo fikir, nêrin û xebatên xwe aşkera bikin, evê komê çû sazîyên taybet bi xwe ve ne bûn, ji bilî Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Duhokê.

Derbarê vê çendê de di pirtûka Nimetullah Nihêlî de hatîye evê komê çû sazîyên fermî nebûn ku bi rêya wan bizav û xebatên xwe tê de tomar bikin. Bi derfetên wê fikrê xwe bigehînine alîyên din. Lê alîkarî digel yekîtiya nivîskarên kurd li Duhokê, sazîyên din yên rewşenbîrî çend civîn, semînar û korên helbest xwendinê ji bo vê komê hat amade kirin. Her weha nivîskar Arif Hîto dibêje; me semînar û korên helbest xwendinê li sertaser bajêrê Duhokê gêrandin. Her weha endamên komê bi rêka nivîsandina gotar û berheman weko bersîveka rexneyî bo nivîskarên li dijî vê komê beşdar bûn di kovar û rojnameyên deverê de. Her weha civînên wêjeyî li yekîtiya nivîseran hatine gêran (Nihêlî, 2013: 23). Anko kar û xebatên vê komê zêdetir li baregayê yekîtiya nivîskarên kurd li bajarê Duhokê hatine kirin. Li ser gotina navborî di heman demê de li deverê din hinek nivîskar hebûn diyatîya vê komê dikirin, ji bo ku bizav û xebatên wan nûxwaz bûn.

Her weha ji bo bangewazîya vê komê jî hemû endamên vê komê li ser yek hizir nebûn. “Hin ji wan li ser vê bawerîyê bûn ku naveroka helbestê girîng e û hin ji wan jî digotin ku form girîngtir e. Lewre di bangewazîyê de jî duberekîya wan dîyar

bû. Hindek ji wan girîngî bi rûxsarê û yê din girîngî bi naverokê didan” (Nihêlî, 2009: 46). Em dikarin bibêjin ku ev kom di bangewazîyên xwe de yekdeng nebûn. Her yekê girîngî bi hêleke helbestê daye.

Vê komê li gel hebûna çend lawazîyan jî karî ji bo demekê karên xwe berdewam bike û hin karan di naveroka helbestê de bike. “Lêbelê wekî dîyar her destpêkekê dawîyek jî heye. Ev kesên di vê komê de kar dikirin ji bo berdewamkirina jîyanê hin karên din jî dikirin, ji ber sedema nebûna pîlanekê hêja ji bo kar û xebatê kom ber bi nemanê ve çû” (Nihêlî, 2010: 270). Anko ew endamên ku di vê komê de kar û xebat dikirin, ji ber ku xebatên wan yê di nav komê de dahatek ji bo wan bi dest ve nehat, ji bo peyda kirina nanê jîyana xwe ya rojê dest bi karên cûda kirin bi vê yekê re lawazî kete xebat û karên wan yê komê. Vê yekê tesîr li ser berhemên wan ên di çarçoveya armancên komê de dinivîsandin jî kir.

2.5.5. Kovara Nûxwaz

Pitir di sala 1991ê de kovarek li devera behdînan derket bi navê kovara nûxwaz, weko pirojeye nûxwazîya kurdî hate di qada xebatên wêjeyî de bi rêya vê kovarê xebatê li ser wêjeya kurdî pêşde çûn.

“Kovara nûxwazî kovara devera Duhokê bûye, evê kovarê xwe bi kovareka wêjeyî û hûnerî daye nasandin, tenê sê hejmar ji vê kovarê derketin. Weko pirojek ji bo nûxwazîya kurdî hate pêş, yekem hejmar di eylula sala 1991ê de bi amîrê foto kopê hate zêdekirin. Desteka nivîskarên di vê kovarê de beşdar dibin “Selman Kovilî, Şukrî Şehbaz, Dr. Fazil Omer, Mohsin Quçan, Hizirvan Ebdullah, Celal Mostefa, Mohsin Osman, Îsmail Badî, Se’îd Dêreşî, Îsmail Mostefa, Hakîm Abdullah” di ser gotara hejmare yekê de hatîye “Em jîyaneke nû dixwazin, lewra em pêdivî bi hizir û nêrînên nû ne pêdivî bi wêjeyeka nû ne tûrevan û wişdana civakî ye... nûxwazî wek pêdivîyekê derket û gazîyeke bo nivîskarên ne niştîman perwer. Ewên di kawdanên nexweş û berteng de ji bo gelê xwe nivîsand, êş û janên wan helgirtin, kirîye hêvênê berhema xwe” (Hîto, 2012: 115). Anko evê kovarê di wê demê de, xizmeteka beçab ji bo nûxwazîyê û xebatê li ser nûxwazîyê kirêye. Her wekî di nivîsa wan ya kovarê de hatî nûxwazî pêdivîye, ku helbestvanên me wêjeyê de nûxwaz bin, li hember dijayetîyê bisekinin.

2.5.6. Nebûna Daxûyanîyê

Di cîhana zanistî û wêjeyî de dema rêbazek an komek peyda dibe, beyannameyek ji alîyê endamên vê rêbazê an vê komê ve dihat nivîsîn, ji bo gel dihat arastekirin da ku hizr û bîrên avakirina berhemana li gor vê beyannamê bin. Lê vê komê tu beyanname neweşand. Egerê nebûna beyannameyê jî ev e ku endamên vê komê hizr dikirin ku bi awayeke berdewam di nûkirinê de bin û dê guherînan pêk bînin.

Ji ber vê jî li ser vê çendê Arif Hîto dibêje ku: “Em di vê hizrê de bûn ku Nûkirina Her û Her firindeyeke parvekirîye ku dê roj bi roj nûkirinên nûtir bîne, pêdivî bi beyanamên arşîvîkirinê nake. Lê bi hizra min em şaş bûn û me çî kir li xwe kir û dîrokê jî kir, ji ber ku me beyanname neweşandin” (Nihêlî, 2013: 20).

Arif Hîto dibêje ku berîya damezrandina vê komê, me beyannameyên komên Ewropî û ‘Erebî xwandibûn lê ji ber sê sedeman serî da me tu beyannameyeke taybet bi koma xwe neweşandin.

1. Ji ber ku me xwast ku şêwazeke nihênî bidin koma xwe. Da ku koma me di nava gel û navçeyê de her tim berbelav be û bijî û dur nebe ji xwendevan û deverê. Xelk hewl bide ku her tim hizra pêşveçûnê di serê wan de hebe ji ber vê jî pêdivî bi tu beyannameyekê nebûye.

2. Ji ber ku me dixwast ku guherîn di hemû layenên jîyana wêjeyî de rû bide. Herçiqas me ji helbestê destpê kir, em li bendê bûn ku ev guherîn di şanoyê û çîrokê de jî rû bide.

3. Ji ber ku navê koma me Nûkirina Her û Her bû derkirina beyannameyê dê sînor di çarçoveya xebata komê de danîba. Ev hele jî dê du hizrên dijî yek di koma me de bixista berçav ku bi vê çendê dê refza hizrên komê bê kirin û ji ber vê jî me beyanname neweşand” (Ziyab, 2005: 88).

2.5.7. Rola Hizirvan Ebdullah di Nava Koma Nûkirin Her û Her de

Helbestvan Hizirvan Ebdullah dibêje; min û hevalê min me weha hizir kir ku helbesta kurdî wekî avake rawestay dimîne ku bêhneka ne xweş bide. Me xwast em

wêjeya xwe bişilqînîn berev pêşvebinê û nûxwazîyê bibin, kar li ser hindê min kir ku wan kurdî bi ramanên delal di nava helbestê da darêjim ji bo ku xwendekar di gel me hizir di helbestê û avakirina wê de bikin. Her weha min jî beşdarî di gel hevalan dikir sebarek pîlan û xebatên me yê komê, nêrîn û fikrên xwe min ji bo vê komê pêşniyaz dikirin (Hevpeyvîn, Ebdullah, 24. 10. 2018). Her wekî navborî bo me zelal kir, di vê komê de me bi hevra kar kirye ji bo wêjeya xwe ber nûxwazîyê ve bibin, guherîna li ser mejîyê xwendekaran bikin da ku ji fikir û nêrînen kevin xilas bibin. Bi mejîyeke zelal li hember bûyeran bisekinin bi hizrên cûda û nû bifikirin.

Lawazî û nemana vê komê ji egerê ji hev veqetîna endamên vê komê çê bû, wekî hin ji endamên çûne ber dilovanîya xwedê û hin ji wan jî ber bi welatên bîyanî ve çûn. Her weha ji ber ku karvedanên siyasî û aborî wê dema li başûr baş û aram nebû û her weha Hizirvan Ebdullah dibêje ku: “Me hizir dikir ku ev koma ya berteng ku wêjeya Kurdî têdeye, me şeliqand û guherîn bi ser de anî û ji ber vê jî gihîştin armanca xwe” (Hevpeyvîn, Ebdullah, 24.10.2018). Ji ber van egeran ev kom ji hev vebû û bizava wan bidawî hat. Lêbelê hewlên takekesî her mane.

Dema ketwar dibe rêgir li hember hin hêzên nedestûrdayî ji layê civakî ve ev kes ev hêzên bêdestûrî armanc bin û bi dest ve neyên bêgûman dê yaxîbûn li ser vê civakê dibe. Her wek di helbesta “Mizgînî” de Arif Hîto yaxîbûn û dijayetîya wan dab û nerîtan dike û dibêje:

Mînak:

Mizgînî

Duhî bû, Gelê gundîyan

Dema hingû, tenya sêlê di ruyê xwe day

Xwelîya kuçkî bi serê me werkirî û

Axîneka kûr rahêlay

Dilbera dilê dilkul teqîya, sil û dilmayî

Hindeka digot dê vejîtin

Li buhara bê, wek firîzî dê şîn be û

Zevî û zêran vegirî

Hindeka digot bayekê bir

Kire destê şeva reş da û ehremenî
Lê barandin serma û sir
Ya keftîye dinav daristanek pirî gor
Yên digot mir
Her di vê rojê behî dana (Hîto, 2012: 59).

Xuya ye ku hez kirin di navbera keç û kuran de di hin civakan de weke tişteke nerewa û neşîrîn tê hejmarkirin. Civaka kurdî jî ji vê çendê vala nîne û ev çende wekî tîtalekê qedexekirî û neşîrîn lê hatîye, rêyê bi peywendîya asayî ya di navbera her du regezan da nade. Li vir helbestvan jî gazindê ji vê dab û nerîta neqenc û kirêt ya civaka xwe kiriye û dibêje:

Duhî bû gelê gundîyan” mebesta wî ji “Gundî” li vir ev civake an sazîye yê ku tê de dijîn û înana du ristên mîna “dema hina digo tenîya sêlê di royê xwe day û xwelîya kuçkî bi serê me werkirî”, derbirîna nerazîbûnêye li beramber civakê; ji ber ku di civaka kurdewar da ev du riste zor tînan bikaranîn, lê dema nerazîbûnê yan baştir e bêjîn dema karek ji nav diçe û wêran dibe, ev du riste tînan gotin. Her weha bahs ji durketina yarê dike bi egerê axaftin û gotgotên derdorê û dibêje:

Dîlbera dilê dîkul teqîya, sil û dilmayî” ev çende jî daye dîyar kirin ku piştî civakê peywendîya me ji nav bir, bûne egerê durketina yarê, di heman demê de her yekê li cem xwe çendînan gotegotên li ser wan dan. Heta vê astê ku yar mirî be û serxweşî bidana. “Yên dî got mir her ji vê rojê behî dana”. Bi wî rengî helbestvan ji dîyardeya civakê yaxî bûye û reda wî tiştî dike di helbesta xwe de ku ev jî binemayeke bihêz yê nûxwazîyê ye. Helbestvan dijî wan dab û nerît û tîtalên ku di civaka wî de hebin, yaxî dibe û dijî wan bisekine.

Helbestvan Hizirvan Ebdullah sebarek yaxîbûna di nav helbesta Arif Hîto de dibêje; helbestên wî pîranî yaxîbûn karanîye, gelek car yaxîbûn li hember civaka xwe li hembê sîyasetê înaye. Her weha yaxîbûn li hinek alîyên civaka xwe girtîye wekî qebûl nekirina hezkirinê di navbera keç û kuran de. Ku ev civake li ser yasayên eşîrî bi rê ve diçe, vê çendê qebûl nake li vîrê helbestvanê navborî li van alîyan yaxî dibe” (Hevpeyvîn, Ebdullah, 10. 7. 2019). Anko di nav helbestên Arif Hîto de, bi rengeke

delal yaxîbûn tê dîtin, taybet li hember civaka xwe alîyên li dev navborî dibine cihê yaxîbûnê.

2.6. Koma Nûxwazên Akrê (1995)

Piştî serhildana sala 1991'ê zayînî û derketina her çar komên “Rewangeh, Kerkûk- Kifrî, Wêran û Nûkirina -Her û Her” ronakbîrên devera Akrê weke hemû deverên din yên Başûr girîng dîtin ku rûniştin û danûstandin encam bidin ji bo avakirina navendeke ronakbîrîyê ku bikaribin zêdetir xizmeta gelê Kurd û wêjeya kurdî bikin, her weha kar û bizavên deverê nîşanî gel bidin.

Endamên vê bizavê ji çend nivîskaran pêk tên di nav wan de jî “Azad Dartaş, Emîr Efendî û Şemal İsmail” bûn “ku hizra avakirina koma nûxwaz di mêjîyê xwe de digerlandin ku bikaribin zêdetir bizav û çalakî û berhemên xwe berfirehtir bikin. Ji ber vê jî biryar dan ku çend karên hevpişk bikin. Piştî hingî çend ronakbîrên din yên wek Mistefa Selîm, Emîn Botanî dengê xwe dane pal dengê wan û kom berfirehtir kirin (Ziyab, 2005: 94). Anko ev koma ji çendîn nivîskar û helbestvanê devera Akrê pêkhatibû, wan dixwast xebatên li ser wêjeyê fireh bin, bi rêya civîn û gotûbêjan.

2.6.1. Damezrandina Komê

Piştî koma Nûkirina Her û Her di sala 1994an de li devera Duhokê hat damezrandin. Çend semînar li bajar û navçeyên devera behdînanê encam dan. Li Akrê di çarçoveya bizava rewşenbîrî de, sê endamên bizavê “Azad Dardaş, Emîr Findî, Şemal İsmail” li damezrandina koma nûxwaz, di nav bizava rewşenbîrîya Akrê de “Koma nûxwaza Akrê” di sala 1995an de damezrandin (Ziyab, 2005: 93. 94). Anko ev koma salekê piştî koma Nûkirin Her û Her hatîye damezrandin, sinûrê devera Duhokê û Akrê nêzîk yeke, her du kom li devera behdînanê hatîne damezrandin.

Her di gel damazarandina vê komê û ya Nûkirin Her û Her Hizirvan Ebdullah dibêje; ev koma nûxwazên Akrê komeka cûda nîne ji Nûkirin Her û Her, belko ev bizave her beşek bû ji koma Nûkirin Her û Her” (Hevpeyvîn, Ebdullah, 10. 7. 2019). Li gor gotina navborî ev kome cûda nebû ji koma wan belko beşek ji koma wan bû ya Nûkirin Her û Her.

Bi vî awayî jî karin melbendekê damezrînin bi navê “Melbenda Ronakbîrî ya Akrê.” Her weha di derbarê avakirina vê melbendê de ronakbîr, nivîskar Azad Dartaş dibêje ku “berîya serhildana me hizrek hebû ku dive li Akrê sazîyek an bizavek ronakbîrî hebe ku vê valatîya ronakbîrîya Akrê bi zimanê ‘Erebî bi xwe ve girê daye tijî bike. Di 1.7.1991ê de biryara avakirina melbendê hat dayîn da ku ronakbîr û helbestvanên deverê tê de kom bibin. Giştî hizr û boçûnên cuda cuda li ser layenên ronakbîrî û wêjeyî tê de gengeşe bikin” (Hîto, 2012: 145). Di destpêkê beriya ku koma nûxwaz ya Akrê bihê damezrandin, ronakbîrên devera Akrê melbendek vekir, ji bo nîqaşkirina fikir û nêrîna li ser wêjeya xwe.

Bi vî awayî jî heta sala 1994ê “Melbenda Rewşenbîrî ya Akrê” li jêr vî navî berdewamî bi kar û xebatên xwe dida heta piştî sala 1994ê ku ronakbîrên deverê ketin hizra guherandina navê vê melbendê û weke “Bizava Ronakbîrî ya Akrê” hate binav kirin (Ziyab, 2005: 93). Anko evê komê navê koma xwe kire “Bizava Ronakbîrî ya Akrê” ji ber ku ew bi xwe bizaveka wêjeyî bûn, xebat di derbarê wêjeyê de dikirin ku pê re xwe ji kevnatîyê xilas bikin, wêjeya xwe ber bi nûxwazîyê ve bibin.

Ji ber ku peyva “Melbend” ji bo sazîyên hizbî dihat bikaranîn û zêdetir têgeheke ramîyarî ya sîyasî bû, hat guherîn û li dewsa vê têgeha “Bizav” hat bi cih kirin. Nivîskar û ronakbîr Şemal Ismaîl boçûna xwe di derbarê guherîna navê wê weke “Bizava Ronakbîrî ya Akrê” dibêje; “ji ber ku Melbend çarçoveyê tesk a devereke taybet werdigire, bizav û bîyavê ronakbîrî û wêjeya kurdî de berdewam bûn, ne xasma piştî koma “Nûkirin Her û Her” li Duhokê peyda bû” (Hîto, 2012:145). Her derbarê navê komê, wan weha hizr dikir melbend ji bo cihên hizbî tê bikaranîn. Ji bo vê yekê navê koma xwe kirin “Bizava Rewşenbîrî li Akrê” ku ev nav pitir li ser xebatên wan dihate gûncandin.

Koma nûxwaza Akrê ji encamê komeka egeran yê taybet û giştî derket, em dişên li van xalan de zêlal bikin:

- Hestpêkirin hizra naverokê û formên kilasîk bi ser wêjeya kurdî de zal e. Ku wêje weko livîneka “Hizrî, Zimanî û îstatîkî” ji van nirxan dihête belav kirin.

- Bizav kirin ji bo xwendineka rexneyî ji bo tekstên zal di nava wêjeya kurdî de.

- Dahênan li deqên hizrî û hûnerî, ku bikaribe livandin û dûrist kirina, pis û gûnana li ser hemû alîyan li def xwendekarî çêbike.

- Hemû alîyên wêjeyî û hizrî bi taybet li ser helbesta kurdî ji çarçova kevin û kilasîk, heya radekê ji çarçova helbesta serbest yan nûxwaz debêxe.

- Karkirina endamên komên “Nûkirin Her û Her” û “Wêran” li ser endamên vê komê.

- Çûnkî cihê cûgrafi yê Akrê di dema şerê navxo de, rêyeka sereke bû di nava her du parêzgehên Hewlêr û Duhokê de.

- Ketibûn li jêr kartêkirina bizavên nûxwazên Ewropî û Erebi wekî “Adonis”.

- Ketibûn li jêr kartêkirina felsefa weşangerî ya “Jacques Derrida” yê firensî (Ziyab, 2005:95,96)

Her sebare van xalan weha zelal bo, evê komê xwastîye wêjeya xwe ji hemû kevnatîyan azad bike, ber bi helbesta serbest yan nûxwaz ve bibin, gumanê pisyarkirî di nava deqên wêjeyî de çêbikin. Xwendevan hizr li ser li deqê wan yê wêjeyî bike û rexne bike, beşdar be ji bo dubare avakirina têksta helbestê.

2.6.2. Daxûyanîya Komê

Derbarê daxûyanîya koma Akrê weke gelek komên din yê bîyanî û yê kurdên îraqê, li dor kar, bizav û xebarên xwe yê komê daxûyanîyek derkirin. Ev daxûyanî ji alîyê van nivîskaran “Emîr Findî, Azad Dartaş, Şemal Îsmail” ve hate nivîsandin. Ev daxûyanîya wan bi destnivîsa wê serdemê maye, ew destnivîs bi zelalî nîne.

Daxûyanîya wan ya li jêr navê “Bangek bo Nûsizm” di çend xaland e emê bidine dîyar kirin.

- Peydabûn yan demezrabdina her tiştê ji egerekê yan babetekê dihê. Îro li gor nêrînên me firehîyeke babetî heye ji bo nûkirinê, bi rêya naveroka dariştina rewşenbîrîya kurdên îraqê ji aliyê hûnerî û wêjeyî ve di kevanê xwe yê berteng derkeve û ber bi rewşenbîrîyeka gerim ya cîhanî ve biçe.

- Rewşenbîrîya kurdên îraqê piştî serhildana sala 1991ê ber bi wêje û rewşenbîrîya cîhanî çû ji ber du egeran: a. Dengvedana xebata kurdî di komên civaka cîhanî de. b. Jêhatîbûna rola ragihandina kurdî li derveyî welat gehiştin bo cîhanê.

- Li vêrê rewşenbîrîya kurdên îraqê nemane bê nûkirin, mafê helgirtina şoreşêke “Zimanî, Ferhengî, Avahî, Civakî” heye.

- Di nava vê têgehê de sîstema hatîye dûrist kirin, xwedîya saloxetên avakirinê be (Daxûyanîya komê, 13,5,1995)

Di van çend xalan de weha zelal dibe ku evê komê xebat û bizav kirine ji bo ku wêjeya kurdî ji çarçova xwe ya berteng derkeve û ber bi wêjeya gerim ya nûxwaz ya cîhanê ve biçe. Li gûr daxûyanî ya wan ku îro fireh hizrîyek çêbûye ji bo nûkirin bi ser wêjeya wan de çêbibe.

2.6.3. Xebatên Komê

Evê komê weke hemû komên din yê nûxwaz yê bakûrê îraqê xebat li ser wêjeya kurdî kirin. belê ev kom li gor komên din kar û xebat û bizava wan di asteke kêma dabûn. Berhem, kar û xebatên vê koma nûxwazîya ya Akrê ji aliyê nivîsandina tekstên rexneyî, hizrî, helbest, gûr, semînar...hwd. “Di berteng û kêmbûne, ew jî ji ber ku hejmareke kêma ji rewşenbîrên deverê beşdarbûn di gel hersê damezrînerên vê komê. Her weha rewşa aborî, sîyasî û civakî ya deverên kurdan ne aram bûn. Vê yekê kartêkirin li ser her sê damezrînerên vê komê kiribû. Di gel wê çendê ku ev eger ketine pêşîya wan li hember pêşketina komê, endamên vê komê dikarîbûn çendîn parçeyên helbesta nûxwaz û tekistên rexneyî û hizrî di derbarê felsefa nûxwazîyê de binvîsin. Her weha wergerandina çend gotarên rexneyî û hizrî yê Ewropî û Erebi li ser felsefa nûxwazîyê bo zimanê kurdî, xebatên wan ên din bûn bo geşkirina projeya xwe. Hizrên nûxwazîyê li “Duhok, Zaxo, Sêmêl, Şeqlawe, Xelêfan, Dîyana, Hewlêr” ê di gel şirovekarên rexneyê li ser naveroka deqê wan û helbest û hizrên

wan yên nûxwaz ên vê komê pêşkêş kirin (Ziyab, 2005: 99). Anko evê komê sereray wan astengiyan xebatên xwe li ser nûxwazîyê berdewam kirin, Çavkanîyên felsefa nûxwazîyê ji zimanên bîyanî wergerandin bo zimanê kurdî. Bi nêrîna min eve kar û xebateka baş bû, ji bo nûxwazîya wêjeya kurdî, kartêkirin hebû li ser wêjeya komê taybet û kurdên îraqê bi giştî.

Vê komê gelek babetên felsefî û hizrî dan û gelek girîngî dan layenê gotara rexneyî û hizrî. Ji ber ku dirûşmê wan birîtî bû ji “Livandina Aqilê Kesane Beranber Bûyeran”. “Bi vê çendê jî ronakbîrên devera Akrê xwastin ku berhemên xwe di navendeke ronakbîrî de biparêzin û dîyar bikin. Karê wan çavlêkirin nîne her wek hin alîyan wisa dîyar kiribû ku karê wan çavlêkirineke ji koma ‘Nûkirina Her û Her’ê. Bizav û çalakîyên vê komê di hêla wêjeyê de berdewam bûn. Heta dawîya sala 1997’ê lê piştî vê salê û ji ber çendîn egerên cuda cuda, endamên vê komê ji hevdu veqetîyan û karên wan ber bi lawazîyê ve çûn, tu tişt bi navê komê nema” (Hîto, 2012: 147-148). Li vêrê wiha zelal dibe ku evê komê xwastîye mejiyê mirovên kurd bigûherîne û bike ku bi nêrîneka nûxwaz li hember bûyaran bifikire. Her wekî di dirûşma wan de hatî ye “Livandina Aqilê Kesane Beranber Bûyeran” li gor vê dirûşmê kar û xebatên xwe berdewam kirine.

Di dawîyê de weha dîyar dibe ku di encama serhildana modernîzmê li Ewropayê, kar û bizavên wan yên berdewam di biwarên jîyanê de û bi taybet di biwara edebîyatê de awayeke modernîzmê bi ser de anîye. Wisa bû egerê rengvedana vê li gişt gerdunê ku çavlêkirina wan bikin û berhemên wan bixwînin. Dîyar e ku wêjeya ‘Erebî jî yek ji wan wêjeyan bû ku ket bin kartêkerîya ronakbîrên Ewropî û modernîzm di nava xwe de peyda kir.

Her weha kurdan jî wek gelên din bêbehîr nebûn ji vê çavlêkirinê û heta astekê di encama modernîzma ‘Erebî û Ewropî de û xwandina berhemên wan yên wergerandî, karîn ku gorankariyekê bi ser wêjeya Kurdî de bînin. Bi taybetî layenê helbestê, bi wî awayî jî nûxwazî wek bizaveke berbelav bûye li cîhanê.

2.7. Di Nav Kurdên Iraçe De Bingehên Nûxwazîyê

2.7.1. Naverok

Nûxwazî xwedî çendîn bingehên taybet e di derbarê ku ji bingehên rêbaz û bizavên berê xwe yê wekî “klasîk û nû” cuda ne. Bingeha wan ji wan xalên li jêr pêk tê.

1. “Ladana Eqlî” (Dokî, 1998: 18): Anko mirov nikare li ser bingehê eqlî nêrînekê rast bide têksta helbesta nûxwazî. Ji ber ku helbesta nûxwazî têksteke vekirîye ku bi nêrîneke bineretî nayê şîrove kirin.

2. “Tem û Mijatî: Têkstên nûxwazî xwedî tem û mijatîyeke zêde ne. Ji ber ku peyama wan şêlî û weşartî ye û yekser nayê wergirtin” (Ziyab, 2005: 104). Ji ber ku têksta nûxwazî tem û mijavî ye çînen civakê nekarîn ku bi hêsanî li wan tê bigehin û şîrove bikin. Çîna ronakbîr ji têkstê fêhm kir û wêneyên helbesta wan şîrove kir û dibûn desenên afirîner di avakirina tekstê de.

3. “Gumankirin û Pirsiyarkirin” (Ziyab, 2005: 107). Helbestvanê nûxwaz dema gehandina hizr û bîrên xwe gelek pirsan di mêjîyê xwendekaran de vedike. Bi rêya tekstê, dixwaze ku mijatîyekê û gumanekê li dev xwendevanan ava bike.

4. “Pêşbînîya cîhaneke din: Hizirvanên klasîk û nû zêdetir wesf û berçavkirina cîhana serdema xwe û berîya xwe dikin. Hin caran bizavê dikin ku bigehin cîhaneke xeyalî ya dût ji rastîyê, lê helbestvanên nûxwaz berdewam di tekstên xwe yê helbestî de zêdetir bangeşe û pêşnîyara gehîştin, bi destxistina cîhan û dahênanekê nûtir ji ya berê xwe dikin” (Ebdulla, 2005: 117).

5. Yek ji bingehên din yê girîng di derbarê nûxwazîyê ji hêla naverokê yaxîbûn e. Ji ber ku bingeha nûxwazîyê rexnegirtin e û yaxî dibin li ser layenên jîyanê û kêr û kasî û lawazîyên wan layenan, çî siyasî, civakî, wan berçav dikin û ji bo wergerê dîyar dikin.

2.7.2. Şikl

Di serdema nûxwazîyê de gorankarîyên berçav bi ser wêjeyan de bi taybet helbest û şiklê vê hatîye, cureyek nûkirin bi ser de anîye. Nûxwazan çendîn binema û bingeh dîyar dikirin û li gor wan diçûn û di nav wan de jî:

1. “Nûxwazî nûkirina zimanî ye. Anko ji ber bikaranîna wan peyvên nû ji bo bihêzkirina tekstan û pirî ramankirina wan, di encamê de peyvên nû dihatine nav ziman û ziman pir dewletmend dibû” (Akrê, 2010: 28).

2. Her weha “guherîna topografîya malikên teksta helbestê bikaranîna xalbendî, veguhestina qalibê mesnewî bo kêşên din, geşêpêdana helbesta serbest” (Hîto, 2012: 30).

3. “Û ji hêla kêşê ve helbesta nûxwazî bêkêşe û kêşa wê dîyar nîne. Dîyar dibe ku modernxwazan tu girîngî nedaye kêşa helbestê û cuda ye ji klasîka ku gelek girîngî dide kêşê û bi taybet kêşa arûzî” (Cemîl, 2009: 146).

4. “Sekinandina stuna helbestê û derxistina vê rengê dibêjinê helbesta serbest an jî pexşana helbestê” (Doskî, 1998: 18).

5. “Bikarneanîna rîtmê. Di tekstan de û dûr keftina nivîskarên nûxwaz ji rîtmê yek ji xalên din bû di derbarê nûxwazîyê de” (Doskî, 1998: 18).

2.7.3. Yaxîbûn (Rikberî)

Peydabûna yaxîbûnê bi peydabûna mirovî ve girêdayî ye. Anko li gel hizirkirina mirovî di gerdunê û tişt û dîyardên siruştî û hêzên ne dîyar yê derdorê xwe, hêzên metafîzîkî û kartêkirina wan û rêjeya bersîvdana mirovî beranber wan tiştan yan diyardan helwestek li def vê peyda bû ku ya yekê: Destdan û lawazî beranber wan hêza û ya duyem: Redkirin û yaxîbûn li ser wan hêza.

“Yaxîbûn hevdem li gel gehîştina hizra mirovatîyê bûye cihê li duvçûnê û gengeşê dîyarkirina cûr û mebest û qest û astên wê ye. Ev yaxîbûn ji valatîyeke hizrî û ronakbîrî peyda dibe. Ji ber vê çendê jî ronakbîrîyê roleke mezin û bibandor li ser dîyarkirina arasta yaxîbûnê heye û ev vê çendê nagîhîne ku mirovê nerewşenbîr hest

bi yaxîbûnê nake. Ji ber ku her asteke ronakbîrîyê bandora xwe heye û ev hemû bizavên heyî ji ber vê çendê ye ku bigehin rastîyê û dadperwerîyê. Li ser tiştên bi vî rengî berbelav bike. Şeyda û dilnerihet be ji bo rastîyê, çi hizra pesend nake û rastîya wê vernagire. Eger hestê romanê di derûnê wî de kar neke û li vê dema şerm nake ku boçûneke din verdigire” (Nûrî, 2011: 67).

2.7.4. Çemk û Pênasyên Yaxîbûnê

Yaxîbûn dîyardeyeke ji mirov peyda dibe. Ji ber vê jî berîya ku çemk û pênaseyên yaxîbûnê bidin xuya kirin, pêwîste em bizanin ku mirovê yaxî kî ye? Ji ber ku yaxîbûn her ji wî mirovî peyda dibe, dema ku hin dîyardeyan red dike û hewla guherîn an jî jinavbirin û nehiştina wê an jî wan dîyardeyan dide. Anko mirovê yaxî eve yê ku dibêje: “Ne” ji bo vê cûrê ku qebûl nîne.

“Merem ji vê “Nexêr”ê ev e ku ev teqez dike sînorek heye û em di vî sînorî de hestên wî kesî dibînîn dema yaxî dibe. Wan sînoran dibezîne bi armanca bidestxistina mafên xwe, lê di dawîyê de destberdar nabe. Ji ber ku di heman demê de ew wî sînorî dike çeper ji bo kesê li hember xwe. Anko “êdî ev destberdar nabe ji ber ku ev li gel vê çendê ku dibêje belê, di yekem derfetê de ku ji bo wî çê dibe” (Camus, 2011: 19).

Mebest ji vê yekê ev e ku ev mirov dizane ku sînorek heye, lê di heman demê de vê sînorê dibezîne da ku mafên xwe bi dest ve bîne. Her heman sînorê ji alîyê wî ve hatîye derbas dike, çeper li hember hin fermanên dîktatorane datîne da ku derbider nebe. Anko bo ku wek xwe bimîne an jî guherînên radîkal bide destpêkirin şer dike li dijî sîstema heyî û nerîtê.

Yaxîbûn bi gelek şêwazan hatîye pênase kirin û gelek şîrove li ser hatine dayîn di nav wan de jî “Yaxîbûn” ev e ku tiştê berbelav û cîgîr û bernîyas bê ladan û “Reda” wan bê kirin. Eger li gel serdemê hevdij be, yan jî berovajî berjewendîya be yan jî baş nebe” (Camus, 1983: 361). Anko yaxîbûn ladana wan tiştên berbelav an jî redkirina wî tiştî ye, yê ku ligel cîwarê hevdij be. Berovajî berjewendîyan be û yê ku bêşûd be.

“Yaxîbûn dîyardeyeke ji dîyardeyên hestê mirovayetîyê û kiryara redkirina jîwarî bi serdeçûye ji hêla sîyasî, aborî, civakî, hizrî, ayînî” (Cefer, 2013: 245). Anko yaxîbûn dîtineke mirovî ye ji bo cîwarî, ji her tiştê nerast berev guherînê bibe.

Her weha yaxîbûn di pênaseyekê de hatîye ku “Şoreşeke sernekeftî ye, yaxîbûn ev e ku tu ji bazneyê komê derkevî, yaxîbûn anko tu bêjî “Na”. Yaxîbûn guhnedane bersîng girtin e, yan xwe ne radestkirin e” (Elqaçî, 1993: 38). Anko bi gotina peyva “Na” yê tu şoreşê bikî ji bo bidestve anîna rastîyê. An ev astengê ku dikevin ber rêya civakê binbir bikî, an jî guhdarnekirina hin fermanane û ev çende yan dê berhingar be, yan jî lawazî xwe bi xwe redestkirin be.

“Encama hin rewş û alava ye ji rewşekê bo yeka din, li duv kesekê bo kesekê din tê guherîn” (Şilşî, 1994: 8). Anko ji bo me wisa xuya dibe ku ev yaxîbûn ji kesekê bo kesekê din, ji rewşekê ji bo rewşeke din tê guherîn û weke xwe namîne.

Tehsîn Nawşikî dibêje: “Torewanê nûxwaza wêne babetên xwe bi çevenga avê dike û bi mijavî diînîte der. Di pişt mij û morana wan wêneyan de hewla çareserkirina kêmasî û şaşîyên cîwarî dide. Dema dibîne nikare vê çarekirinê bi desthilata xwe bike” (Nawşikî, 2002: 111). Anko torewanê nûxwaz kewal û wênên xwe bi hêmayan ava dike ku ev hêmanên heyî gelek alozin û mijavî ne û têgihîştina wan sexte. Pêdivî bi hizreke berfireh heye heta ku xwendevan bigehe wateyeke rast û dirust.

Dîyardeya yaxîbûnê dema peyda bû ku mirov hest bi lengîyê kir yan jî hest bi hin layenên nedirust kir. Di nava jîwarî de vêca ev lengê di nav karên desthilatê de be an jî layenê ayînî û civakî hwd. be. Li vêrê ji alîyê wî mirovî va yaxî be, hewl dide anko vê hestê bike kiryar û wan dîyardeyên şaş red bike yan layenan sererast bike. Ji ber vê çendê jî yaxîbûn di pênaseyan de hatîye ku dîyardeyeke ji dîyardeyên hestên mirovayetîyê kiryara redkirina jîwarê biserdeçûyî li hêla sîyasî û aborî û civakî û hizrî û ayînî” (Nûrî, 2011: 68).

Albert Camus weke bavê yaxîbûnê hatîye nasîn û vekolînên baş di derbarê vê babetê de kiriye. Boçûna wî ev e ku “Merc nîne di her bihayekê de yaxîbûn hebe. Lê pêdivîye hemû cûreyên yaxîbûnê di naveroka xwe de xwedî biha bin. Gotina peyva

“Na” anko destnîşnakirina sînoran e. Ev çende pêdivîye parastina wan bihayan bi xwe ve bigre yên ku me di bîyavê wan sînoran de çespendin” (Crockshank, 1986: 13). Anko peyva “Ne” tê wateya danana sînoran ji her tiştêkî ku tu jê yaxî dibî.

2.7.5. Yaxîbûn Ji Hêla Zaraveyê Ve

Têgeha yaxîbûnê di zimanê Îngilîzî de bi du peyvan hatîye dîyar kirin. “Revolution û Reblution” ku tên wateya şoreş û yaxîbûnê (Nûrî, 2011: 69).

Di jêderên îslamî de beramber peyva yaxîbûnê peyva “El-Redde” hatîye bikaranîn. Her wekî di Qur’ana pîroz, sureta Maîde, ayeta 21ê de hatîye: “We la teradudu ala adbarîkum” ku di şerîatê de helvegerane, ji îslamê ber bi kufrê û ev çende yan dê bi kiryar yan bi gotin an jî dê bi bawerîyê be.

Têgeha yaxîbûnê di pirtûka “Mevzûat al- Sîyaset” de bi vî rengî hatîye: “Beringarbûna desthilatê ye û redkirina pergala wê ye, derketina ji biryarên desthilatê. Cûreyên vê yaxîbûnê dikare hizrî be an jî piratîkî, anko redkirina binemayên peywendî û hizrî yên pergala desthilatdar û daxwaza guherîna wê pergale” (Elqîyal, 1979: 785). Anko têgeha yaxîbûnê ji bo wî kesî tê bikaranîn yê ku redkirina tiştêkê dike. Vêca ev redkirin çî sîyasî an wêjeyî an civakî be.

2.7.6. Yaxîbûn Ji Hêla Ferhengê Ve

“Peyva yaxîbûnê di nav ferhenga Kurdî de cihê xwe girtîye, di nav hemûyan de wateya nêzîk wergirtîye. Anko herdu peyvên “Yaxîbûn û Şoreş” tevlihev dibin û tên wateyekê ku di zimanê ‘Erebî de “el-temer” e” (Nûrî, 2011: 70).

Peyva yaxîbûnê yek ji wan peyvan e ku di gelek zimanan de xwedî wateyeke wekhev e. Ji ber vê çendê jî, bo zêdetirzanîna wate û ronkirina wê peyvê me pêdivî dît ku em ferhengên çend zimanan bikarbînin” Di nav wan de jî ferhenga” Oxford ‘’ ya Îngilîzî ku peva yaxîbûnê tê de li hember peyvên “Revolution û Rebellion” hatîye (Hornby, 2010: 11).

Her weha di ferhenga “Estêrey Geş” de yaxîbûn bi wateya” temerrud, îsyar, xuruc” û li vêrê yaxî bi wateya “xarix alel qanûn, qerîd aladalet, nehrum mîn elhîmayet ala dalet, asî û mutemerid hatîye” (Nuamuddîn, 1990: 554). Anko her kesê

ku ji qanûnên welatê xwe derkeve û wan qanûnan an desthilatan cîbicî neke û şoreşê bike, desthilatê red bike, ev peyv jêre tê bikaranîn.

Her weha di ferhenga “Selahedîn” de yaxîbûn li hember peyvên “raperîn, şoreş, bizav, serhildan” hatîye bikaranîn” (Seidullah, 1998: 733).

2.7.7. Girîngîya Yaxîbûnê

Yaxîbûn û girîngîya vê dizivire bo wan bizavên nûxwaz yê ko bi hewla yaxîbûnê û nûkirina berhemên edebî rabû. Ku wan bizavan bi rêya yaxîbûnê li ser form û naveroka berhemên wêjeyî bi giştî û helbestê bi taybetî guherî pêk anîne û heta asteke baş kartêkirineke erênî li ser berhemên wêjeyî çêkirine. Ji wan guherîna dubare hewla nûjenkirina helbestê daye ji alîyê form û naverokê ve. Ev çende jî pêdivî bû ku ji bo helbestê bê kirin. Ji ber ku “jîyan guherîna e û her tiştê neyê guherîna dê ber bi mirinê ve biçe, ji ber vê jî pêdivî bi nûbûnê heye” (Hîto, 2012: 139) Ji ber vê yekê yaxîbûna wan bizavên nûxwazî helbest ber bi guherîneke bingehîn bir.

Xaleke din a girîng di derbarê girîngîya yaxîbûnê di wêjeyê de ku bi rêya modernîzmê karîna bîyaveke rexneyê ava bikin. Di rêya danûstandina di navbera helbestê û xwendevanîyê de peyda bike. Ji ber ku helbesta nûxwazîyê ku yaxî be zêdetir ji hizr û wateyekê li xwe digre, lewre jî ev çende bûye hêmana peydabûna xwendinên nûtir. Sererayê vê çendê jî helbesta yaxî zêdetir rêyê dide xwîner, ji bo afirandina hizr û wateyên cuda li ser têkstê. Ji ber vê çendê jî “helbesta yaxî vî maffî dide xwînerê xwe, bo ku wate û mebesta helbestvan bi dirustî helweşîne. Ev bi xwe wateyekê jî bide bi her xwînerêkê, heman tekstê wateyeke cuda ji ya berê jê re dirust bike” (Ziyab, 2005:16). Anko xwendevan ligel helbestvan di avakirina berhemên edebî de beşdar dibe.

2.7.8. Egerên Yaxîbûnê

Bizavên wêjeyî an sîyasî an ayînî tu caran ji valahîyê peyda nabin. Belkî encamê bêhtengîyeke zêde û pêdivîyeke jîyanê ev bizave ser hildide. Lê ev kesên bi wan bizava radibin û hewl didin ku xwe ji wan qeyd û zincîrên kilîsê azad bikin, vêca ev qeyd û zincîr bi sedemên sîyasî an wêjeyî an civakî bin.

1. Dema ku ji ber sedemek sîyasî an civakî an ayînî nivîskar an helbestvan hest bi neguncanîyê bike vê penaya xwe bibe ber yaxîbûnê.

2. Dema ku helbestvan an nivîskar hest bi zordarîya li ser mafên xwe bike vê demê çemkê bergîrîyê li gel yaxîbûna şoreşgêrîyê di berhemên wî de eşkere dibe” (Ebdulqadir, 2005: 94).

3. Topografîya dariştina helbestê, di helbesta kevin de dabeşkirina cografîya girêdayî dariştina dêrên helbestê bû. Anko arûzê vêca mustezad an terkîbend an tercîbend an hezec an remel û hwd. Ev topografîyê helbestkar ji hêla kêma û zêdehiya dêrên helbestê û hejmara birga û dirêjî û kurtîyê bi xwe ve girê da. Ji ber vê jî bo ku xwe biparêze dest jê kêşa” (Nûrî, 2011: 126).

4. Ji hêla naverokê ve girêdana helbestê bi hin babetên texlîdkirî û paşvemayî û wergirtî. Li jêr bandora dibistanên kevin yê wêjeyî ku behsa şanazî, pêgotin hwd. dikan. Behsnekirina babetên serdeman û arîşe û azarên civakê, bi awayeke din yaxîbûn li ser vê çendê kir ku pêwîste helbestvan kurê serdema xwe be û di vê jîngehê de dahênanê bike” (Nûrî, 2011: 127).

BEŞA SÊYEM

3. JÎYAN Û PIRAKTÎZEKIRIN DI HELBESTÊN HÎZIRVAN EBDULLAH DE

3.1. Jiyana Kesokî

Navê wî “Hizirvan Ebdullah” e di sala 1962an de li gundê “Bircîne” di maleke cutîyar û serdestê babekê jêhatî xwedî eçlekê mezin hatîye jîyanê. Gundê “bircîne” ser bi parêzgarîya Duhok ve ye, dikeve serê çîyayê bêxêr. Ji ber zilma rejîma wê serdemê, di sala 1976an de ji gundê xwe koçber bûne ji bo bajêrê Duhokê. Li Duhokê li xanîyên bi kirê de dimînin. Jîyaneka bi zehmetî derbaz kirîye û palatî û kirêkar bûye, karê avakirna xanîyan kirîye. Her karekê zehmet kirîye ji bo wergirtina nanê jîyanê bo xwe û malbata xwe. (Hevpeyvîn. Ebdullah,5,7:2019).

Wekî hatîye zelal kirin ku helbestvan Hizirvan Ebdullah jîyaneka pir bi nexweşî bi zehmetî mezin bûye. Her weha ji gund hatine rakirin ji layê rejîma wê serdemê. Eve jî birîneke kûr e di dilê wî de her dem helbestvan pê bi xem dikeve.

3.2. Zarokîya Wî

Hizirvan her ji zarokîya xwe ji wê xweşîya zarok li jîyanê dibin, ewî ew xweşî nedît. Jê bê bahir ma. Çunkî pir caran malbata wî rastî êrîşan û talankarîyê hatin. Ji layê rejîma Sedam ve ku ev hemu nexweşî di naxê wî de mane, bi çavên xwe dîtine. Her wekî helbestvan Hizirvan dibêje; min qet zarokîya xwe nedît, ji ber wan hemû cûreyên nexweşîya bi serê me de hatîn. Her roj kelexeke kûştî yan birîndar li ber çavê me bûn, ji bo vê çendê min hez li zarokîya xwe nekîr. Eger kesek bêjîte min, tu dixwazî li zarokîyê vegeerî, ez dê bijim qed vê çendê naxwazim û hez nakim. Zarokîya min gelek bi nexweşî bi jan derbaz bû. Ev qonaxa jîyana xwe min bi mirî derbaz kirîye (Waar Tv10,4,2014). Anko jîyana helbestvanê navborî pir bi nexweşî derbaz bûye. Egerê vê çendê ew bûye ku rejîma wê serdemê ya îraqê gelek zûlim li kurdan kirîye. Navborî jî demê zarok bû ev zûlim bi çavên xwe dîtîye demê li ser gûnd û malbata wî hate kirin, bi vê çendê pir diêşe qet heznake serbûrên zarokîya xwe bêje.

3.3. Xêzana Wî

Di sala 1980an de jîyana hevjinîyê pêkînaye, di temenê 18 salîyê de bû. Di sala dû da kurek hebû bi navê “Bêwar” kurê wî yê mezin e. Her di wan salan de ji malbata xwe, dayik û babê xwe cûda dibe. Ku helbestvan kirêkar bû û nava xaniyan de kardikir. Dest berdarî karê xwe bû, dest bi şolê bazirganî kir. Dukaneke cilên jin û mêran vekir. Her wesa di sala 1983 kiçek hebû binavê “Kanî”. Ku niha di dibistaneka nimûney de kar dike. Di sala 1985an de kurekî wî yê din çêbû, bi navê “Rênas”. Her wesa helbestvan kiçek di hebû bi navê “Şeveng” (Hevpeyvîn, Ebdullah 10, 7, 2019). Helbestvan Hızirvan Ebdullah di gel hindê ku jîyaneke zehmet derbaz kir, ji jiyaneke normal dût nebû, xêzandarî pêkînaye du kiç û du kur hebûne. Di gel hemû nexweşîyan jî bizav kirye da ku jîyaneke normal wekî ya her kesekê derbaz bike. Bo dût bimîne ji hemû astengîyan. Helbestvan navborî bizav dike bo di jîyana xwe da karekê jêhatî bi dest xwe bîne. Da ku bi jîyaneke xweş zarok û malbata xwe xwedî beke. Ji bo vê yekê dest bi karê bazirganîyê dike.

3.4. Jiyana Edebî

Helbestvan Hızirvan Ebdullah jîyaneka pirî nexweş dijî. Pir derd û nexweşîyên millet û gûndê xwe bi çav dîtine. Belko her ev çende bûye eger dest bi nivîsandina helbestê bike. Ew hestên di nava wî da, bi rêya helbestê derbirîna xwe dikirin. Helbestê ango edebiyatê dike alavek bo gehadina hest û peyama xwe. Navborî di destpêka salên heftêyan de dest bi nivîsandina helbestê dike. Di sala 1979an de yekemîn berhema xwe ya helbestê dinivîse. Her weha li ser nivîsandina helbestê berdewam bûye, beşdar bûye di govar û rojnameyên wê demê li “Bexda” yê derdiketin. Berhemên wî hatine belav kirin, berhemên bi navê nihênî li “Govara Metîn” ya çîyayî hate weşandin. Her di wan salan de peywendî bi rêxistinên kurdên îraqê hebû, bûye endamê rêkxirawa hindirîn. Di 1989an de yekem dîwana wî ya bi navê “Ez û Agir” ku piştî çar salan heta ku hatîye destûrdan ji layê îraqê ve ji bo belavkirina vê dîwanê” (Hevpeyvîn. Ebdullah, 10, 7: 2019). Her sebare jîyana wî ya edebî navbirê di gel ku jîyaneka zehmet bi serbirîye, di gel vê yekê destberdayî kar û xebatên xwe yê li ser wêjeya kurdî berdewam bûye. Çendîn rêgirî li belav kirina berhemên wî hate kirin lê navborî pitir hewl dan van berhemên xwe belav bike û wan bigehîne destê xwendekaran.

Di sala 1984an de Hizirvan di gel komeka gencan, kovareka edebî li Duhokê derdixe. Kovara bi navê “Dengê Me” di sala 1991ê beşdarî xema welatê xwe bûye, dijî rejîma wê serdemê ya “Seddam” koçberî ser sinûr bûye. Di 15.10.1991ê de koçberî welatê Sûrîya û Lûbnanê bû. Her di wê salê de di meha 11ê de vegeftiya bajarê Duhokê bakurê îraqê. Di gel komeka hevalan kovarek din derdixe bi navê “Kovana Nûxwezî.” Her baregayê kovarê hate belav kirin. Yekem kovar bû li bajarê Duhokê piştî sala 1991ê, kovar bi tenê sê hejmar hate derxistin. Di sala 1992an de dest bi karê êkerîya nivîskaran dike, di gel komeka hevalan “Kovara Peyv” daye weşandin. Piştî wê salê kovar û rojnameyên kurdî mişe bûn, di nav wan de navborî berhemên xwe belav diweşîne. Her weha alîkarî hate kirin, ji layê walîyê bajêrê Duhokê yê wê demê ve ji layê encûmana wezîran. Di sala 1996an de berhema wî ya duyem bi navê “Di Kevanê Xencerê Da Mirin Dihête Jibîr Kirin” bi herfên latînî tê çapkirin. Her di wê salê de berhema “Ez û Agir” vê carê bi herfên latînî li Şama paytexta Sûrîyê tê çapkirin (Hevpeyvîn. Ebdullah, 10, 7: 2019). Eger em bi hûrî temaşeyî jîyana edebî ya Ebdullah bikin, weha bûme zelal dibe ku ew û edebiyat her bi hev re ne ango Ebdulla bo demeka kin jî ji edebiyatê û helbestê dûr nakeve. Xebatên wî her tim bilidbûne di qada wêjeya kurdî û wêjeya nûxwaza kurdî de. Bêşdarî di avakirina gelek kovaran de dike wek pêşeng û wek xebatkar.

Hizirvan di nav jîyana xwe ya edebî de nivîsandinên xwe dike beşek ji êş û janên milletê xwe wan di nav helbestên xwe de berceste dike. Koçberîya helbestvan bûye eger ku nivîsandinên berhemên wî bihêztir bin, hestên xwe bi regekê delal dabirêje. Kartêkirinê li mêjîyê xwendevanî bike. Di gel hindê ku jîyana navborî bi zehmetî û koçberî derbaz bûye, lê tu çar dev ji nivîsîna helbestê bernade her berdewam dibe li ser nivîsana helbestan û berhemên din ên edebî. Hizirvan di jîyana xwe de tu çarî xwe ji nivîsa edebî nade paş her tim li pêş disekine. Gelek beşdarî di çalakîyên rewşenbîrî, kovar û rojnameyan de dike (Hevpeyvîn, Arif Hîto, 11, 7, 2019).

Helbestvan di jîyana xwe de li wan welatê serdan bû kiriye, li wan cihan jî ji çalakîyê edebî û bizavên rewşenbîrî xwe bê bahir ne hêlaye. Di sala 1997an de çûye welatê Elmanya, li gel komeka heval û nivîskarê devera Duhokê kovareka edebî li

Berlînê bi navê “Havêbû” derdixin. Piştî ku Hizirvan ekadimîya zimanî bi dawî anî kêmîtir ji dû salan vegerya Duhokê. Di sala 2000an de dest bi weşandina berhemên xwe yên din dike. Heta niha nêzîkî 25 berhemên helbestvan hatine çapkirin. Heşt dîwanên helbestan, sê roman û nêzîkî deh berhemên werger. Yek tûjandina helbestvanekê ye, efsaneya Narîna Gulbarîn, kurdan çawa bo zarokan çîrok nivîsîne lêkolîneka hevberkirî ye û ewrûpîya çawa gotine bo zarokên xwe, ew jî çar berhem in (Duhoktv, 23, 1, 2018) Helbestvanê navborî xwedî komeka berhemên li ser wêjeyê ye. Bi taybetî dîwanên wî yên helbestan, bi jehatîbûna xwe ya li ser edebî û helbestê hatîya bernîyasîn.

Helbestvan Hizirvan Ebdullah her ji gencatîya xwe wekî kesekê rewşenbîr di nav civakê de hatîye pêşçav. Xebateka baş di derbarê Edebîyata Kurdî de çêkiriye û belavkiriye. Her weha xwedî komeka berhemên çapkirî ye. Di gel hindê Hizirvan di destpêka qonaxa gencatîya xwe de rewşenbîr bûye, wekî kesekê sade hizir di bûyera da netkir. Her tim bi mejîyeke berfîreh li bûyeran difikire, şirovekirineka delal bi rêka zimanê edebî bûyerên serdema xwe di nava helbesta xwe de gotîye. Her tim xwedî li millet, welat û xaka xwe derketî ye.

3.4.1. Taybetiyên Wî yên Edebî

Helbestvan Hizirvan Ebdullah bi rengeke delal bi jêhatîbûna xwe ya di bûwarê edebî de bûye xwedî çendîn pirtûkan. Bi peyvên xwe yê pir bi raman û teknîkên delal gelek helbest nivîsîye. Dema mirov li helbestên wî dinere mirov dibîne ku bi awayeke gelekî kûr li ser helbestên xwe dixebite.

Hizirvan berî dest bi nivîsandina helbestê bik gelek berhemên helbestvanê kurd û yên biyanî xwendîye. Ev yek di helbestên wî de xwe dide der. Rewşenbîrîyeke mezin di bûwarê edebî de wergirtiye.

Mînak

Dukêla reş

Dijî hevdij di nav êk helgirin

Aşûp di nav xwe da birin

Hind jê kuştin ... (Ebdullah, 2004d: 37).

Sebarat vê helbesta “Dûkêla Reş” li hember êrişa dagirkarîya ya rejîma zordar min karînaye (Hevpeyvîn. Ebdullah, 5.7.2019). Her wekî helbestvan divê taytedîyeka xwe ji bo me zelal dikin, hinek nixaftin bi ser helbesta xwe de anîye. Di helbesta xwe ya “Dûkêla Reş” de hêmayeke nixaftî bikartîne derbarê êrişên dijminî bo ser gûndê wî de, “hîvyêt me birin û hin kûştin” anko hêvî û jîyana me hate kuştin.

Helbestvan Hizirvan Ebdullah pir jêhatî bû, di vehandina ziman û wêneyan di nav helbestên xwe çawanîya serederî kirinê di gel peyvan eve jî ji taybetîyên wî bûye. Her weha wêne di nava helbestên xwe da bi rengekê delal vehandîye. Di vê parçe helbesta xwe de helbestvan wêneyên delal daye helbesta xwe, bêguman hezjêkerên helbestê xweşîyeka mezin ji van wêneyan distîne.

Mînak

...

Sitranekê bi çave zerên mam zekê digûtin bend

Wê awazê bi xwera birim

Bê hayê li çerxasemayê serxweş kirim

Serxweş di landika şevêda bê dabiran... (Ebdullah, 2013: 28).

Di wênê yekê de, dema sitran “Bendan” bi çavên mamzê dibêje; pêdivî nake xwendevan pirs bike yan li hêvîyê bimîne ka sitranbêj kîye û çi regeze. Dibe sirûşt, bê dengî û xayala helbestvanî bi xwe be, dibe jî ji jêhatîbûna helbestvanî be ku bi rêya wê awazê, sitranê û bendê, xwe avêtiye alîyekê din û dest karîyê di wêneyekê sade de bike. Ew tiştê ku dixwaze bîne ser ziman hezkirina xwe sersam bûna xwe bo sirûşt û niştîmanê xwe dîyar dike. Ku çavên mamzê weke alaveke xweşkbûnê ji bo vê meremê kartîne” (Bamerî, 2014: 237).

Di vê parçe helbesta Hizirvan Ebdullah xwendevanê helbestê nikare li hêviyê be ku bizanibe ka ev parçe sitran ya kê ye. Helbestvanê navborî di nava helbestê de karînaye, lê ta ku xwendevan bizane ku ev dahênane ji dev helbestvanî ye ku xeyala helbestvanî bi xwe ye bi rêya awazê yan bendê, xwe avêtiye alîyekê din destkarî di wêneyên sade yê helbestê de kirîye. Ew tiştê wî bivêtin bibe ziman ew jî hezkirin û dilsozîya xwe bo niştîmanê xwe dîyar dike. Helbestvan hinek alavan bikartîne bo

hest û meremên xwe di nava helbestê de zelal bike, ew alave xweşîkbûnek daye helbestê û xwendekar dikare mifa ji van alava wergirît ji bo nêzîk bûna merema sereke ya helbestvanî. Bi vî rengî taybetîyên navborî di nava helbestê de bo me zelal dibe.

Helbestvan dibêje; “wê awazê bi xewra birim” xwezaya helbestvanî ne wek xeyalên kesên dinin, ji ber ku lê geryan helbestvanan cûdatirin li tîştê nû digerin, helbestvan ew wêneyê dikine di xeyala xwe de livîneka dî didinê û kengî helbestvan şîya di gel wê livînê gîyanekê bi wênê xwe bide, wê demê dikare helbesteka delal ava bike, berhemînan xûlqandina tiştên nû, ji ber ku hozanvan wêneyan dibîne bi arîkarîya ezmûna xwe ya helbestê bi gîyan dike (Bamerî, 2014: 238). Anko kesên helbestvan nerîn û xeyalên cûdatir ji kesên din hene, helbestvan Hızırvan her tim bizav kirîye wêneyê nû ava bike tiştêkê nû derxîne holê. Ew jî taybetîyeka din e li ser helbesta wî.

Ev wêneyê di nava helbestê min karîname, wêneyên zîndîne û bi rêka wan hizir û ramanê xwe di nava helbestê de dadirêjim. Her weha xweşîkbûnekê didime helbestê, bi rêka van wêneyan, tiştêkê nû didime ber çavê xwendevana. Her tim min valahîyek hêlaye ji bo hizir kirinê. Ku xwendevan hizir di avakirina berhemê de bikît, bi hûrî biçîte di nava naxê helbestê de, li armancê nêzîk bibe (Hevpeyvîn, Ebdullah, 5, 7, 2019). Ku bo me zelal bû navborî di bûwara avakirina ziman û wêneyên helbestê de çiqas jêhatî bûye. Ev jî taybetîyên wî yên li ser wêneyê û helbestê aşkîra dike. Navborî bi van taybetîyên xwe yên delal li ser wêneya nûxwazîyê dibe xwedî çend pirtûkan li ser helbestê û romanê... hwd wêneya kurdî jî pê dewlemed dibe.

3.4.2. Taybetmendiyên Romanên Hızırvan Ebdullah

Helbestvan Hızırvan Ebdullah sê romanên wî heya niha hatîne çapkirin. Di nava van romanên de çend taybetmendiyên wî li ser nivîsandina van romanên hene, ev tişt taybet bûn bi navborî ve. Bi rêya ziman û wêneyên xwe yên edebî romanên karîger daye ber destê xwendevana. Her weha di nava romana “Şopên Rondika” ya helbestvanê navborî de çendek ji dîmenên “Enfalê” ew zûlim û zûrdarî ya bi serê milletê kurd hatî, navborî bi jêhatî û taybetîyên xwe ev wêneyê di nava vî romanê de

tîne pêşçav. “Di romana “Şopên Rondika” de bi awayeke jêhatî û ji gelek alîyan ve beşek ji tirajêdîya “Enfalê” bo me vegêraye pir tişt di gel de hatine wêne kirin. Ji yana gûndan rewş û tîtalên kurdewarîyê hebûna serbazên kurd li deverên azad kirî. Karesata “Enfalê” reçandina kêmyayê ji aliyên firokeyên rejîma “Seddam” derbazbûna sinûrî reftara dûjminên kurdan li her cîhekê. Romanivîsê navborî hemû hûrbînîyên vê tirajêdîyê wêne dike, romannivîs karîye kesekê destnîşan bike bo min û xwendevana giringîya wî kesî di wê yekê de ye ku ev tirajêdîya “Enfalê” li ser zimanê wî weko heye başî û xirabîyên wê weko xwe bihêne veguhaztin, bê hîç kêmkirin û zêdekirin (Bamernî, 14. 5, 2015). Her di derbarê vê romana navborî bi taybetîyên xwe yên derbarê wêjeyê de karîye wêneyên delal û pir karîger ava bike, bi rêya van wêneyan, wêneyê Enfala bi ser kurdên îraqê de hatî aşkera bike, bide ber destê xwendekaran.

Sebaret vê romanê Hızırvan Ebdullah dibêje; di vê romanê de min bizav kirîye xwendekar karakterek be ji karakterên vê romanê. Her karakter helgirê peyama sereke b ji bo romanê, avakerek be di nava romanê de, lewra min xwast her ji destpêkê karakterên di nava romanê de ji bo xwendevana bidime naskirin da di nava xwezayeke naskirî xwe di nava romanê de bibîne. Çûnko di nava romanê de gelek mîtodên felsefî û derûnî girê hene, divîya xwendekar di nava wan girêyan de biçê, bizane dê çikir û erkê wî çîye di nava romanê de (Kûrdistan tv, 10, 12, 2018). Navborî bi van taybetîyên xwe yên edebî karîye sererîyê li ser mejiyê xwendevan bike, bi hûrî biçê nava wan girikên romanê de, weke karakterek xwe di nava romanê de bibîne.

Her sebaret karakteran Hızırvan di vê romana xwe de “Eyûb” weke Qaraman sereke ji bo sebra milletê xwe hember dijminan îname. “Ava werimîna kirmên nefretê yên Eyûb pêxember di bin çermê wî de dilivin” (Ebdullah.2004: 230). Anko serya Eyûbî weke bihênfirehîya milletê xwe li hember dijminan daye aşkirakirin. Sebaret vê çendê nivîskar Tehsîn Navîşk dibêje; Eyûb hedarkêşa heya ji wê nexweşîyê derbaz dibe ku Eyûb xwedê hêzeka efsaney radestî qederê nabe (Tehsîn Navîçkî, 2012, 14). Anko karakterên di nava romanê de heya domahîk car ser ji nû rabîteve û xwedî hêzeka mezin be li hember hemû astengîyan nekeve.

Di romana “Şopên Rondika” ya Romanivîs Hizirvan Ebdullah de hevberkirina palewanî di gel xudawenda û pêxemberan heye. Her sebare vê çendê Dr. Arif Hîto dibêje; her wekî me gotî romanivîs xwestîye palewanê xwe bike qaremanekê efsaney hemû hêz û şîyan li ba wî hebe. Di piranîya caran ev palewan binivşê xudawenda ye. Romanivîsê navborî sîfeta xudawendî dide palewanê xwe û dibêje; “Eyub yek ji wan xudawendan bû, ji bilî biryara dayka xwe, biyara jinekê tenê li ba wî bi sêveka rizî naçû” palewan bi vê sîfeta xudawendî dikare hemû tiştan bizane, hemû nêrînên wî rast derdikeve. Bi dirêjahîya vegêrana çîrokê, Eyub bi hemû bûyeran agahdar e û her ciheke gehîştibayê hevaley yan destek lê hebû, heya diçe di nava dijminî de arîkarî ji bo wî her tim heye (Arif Hîto, 2013: 177). Di nava vê romanê de romannivîs bi taybetîyên xwe yê wêjeyî û edebî, hevberkirinê di navbera palewanê xwe û xudawendî de kirîye. Hemû sîfeta hêz û şîyanê li ba palewanê xwe çêkirîye, her tim weke hêzeka li ba wî heye, heya di nava dijminan de arîkarî jê ra tê, sîfeta xudawendî pêdaye. Nivîskarê romanê ev hevberkirina palewan û xudawenda di nava romanê de avakirîye.

Her di romana “Şopên Rondika” de hevberkirina palewanî di gel pêxember dike. Sebare vê hevberkirina palewan û pêxemberan di kovara “Metîn” de Arif Hîto dibêje; Destpêkê vegerandina xewnê û nerazîbûna gundîyên wî, hevberkirneka ne rasterast di gel pêxember. Eger em xewnê li cihê “Weh”yê danîn dê bibînîn ka çawa hinek ji kes û karên pêxember bawerî pê neîna û hinek din di nava gûmanê de dizivirin. Her ew reftar di gel Eyub î hatkirin. Berî bûyera pêxember xudanê “Weh”yê û Eyub xudanê “Xewn”ê di nava kes û karên xwe cihê rêz û hurmetê bûn. Di parçeyeka di vê romanê de diyar dibe, “heya şeva borî hemû gundîyan ew bi rêberê xwe dizanîn...”. Heya berî xûyakirna xewnê bankirina xwe, hemû gundîyan bawerî pê hebû, bi rêber û serkêşê xwe dizanin. Pêxember jî heya berî xûyabûna “Weh” yê cihê rêz û bawerîya hemû xelkê Mekehê bû (Arif Hîto, 2013: 178, 179). Romanivîs di vê romana xwe de bi jêhatîbûn û taybetîyên xwe yê edebî hevberkirina palewanê xwe di gel pêxemberî kirîye. Da ku hêz û şîyaneka her tim serdikeve û bi rêka rast û dûrist palewanê xwe nîşan bide, ji bo vê yekê hevberkirin çêkirîye di nava palewanê xwe yê romanê û pêxemberî de.

Romana “Hêlên Sor” helbestvan û romanivîs Hizirvan Ebdullah ev romana wî ya duyem e. Gelek babetên cûda cûda bi xweve digre, bi jêhatîbûn û taybetîyên xwe yê edebî romaneka pir bi wate û fireh têkst daye ber destê xwendekaran, naveroka vê romanê babetê dîrokî bi xweve digre. “Nivîskarê vê romanê roman nekirya dergehek ji bo xweindina dîrokî, cûdatir wî bizav kiriye dîrokê bike pirek da ku derbirînê ji kesatî û qaremanê romanê bike. Hemû giranîya xwe xiste ser taybetîyên wî û çendîn bûyer avakirine xistîne di nava romanê de. Tenê da ku yek merem bi cih bîne ew jî zelal kirina taybetîyên zîrekî û jêhatîbûna wî ya nerast di gel aqlê mirovî. Dibêjî nivîskarê romanê yê serhatîyekê ji bo hinek zarokan vedigerîne, bi gotineka dî romanivîs bihayek ji bo xwendevanê xwe ne danaye ku bi rengê rast bûyerên romanê pêkve girêde. Eve lawazîyeke ji alîyê nivîskarî ve her çawa be divê rêzgirtin ji bo xwendevanê hebe, nivîya nivîskar xandevatî çelek hember bibîne li demê nivîsîna romanê (Sûltan, 2005: 35). Di vê romanê de nivîskar hewl daye dîrokê bike pirek da derbirînê ji qaremanê romana xwe bike û mifa ji dîrokê wergirtîye avakirina qaremana û bûyeran di nava romanê de. Her weha ji alîyê nivîskar Abullxaliq Sûltan rexne li romannivîs hatiye girtin. Sebaret kêmkina bihayên xwendevanan lê ez vê çendê weha nabînim ku piştî me xwendinek li ser taybetîyên wêjey yê Hizirvan Ebdullah kirîn, bi dîtina min eve taybetîyên romanivîsê navborîya her tim têkisteka sade nedaye ber singê xwendevanan xwestîya fireh hizir kirinê li cem xwendevanê veke.

Di romana “Hêlên Sor” de çendîn qaremanên dîrokî yê ji rast wênekirîne û hinek qareman ji xeyala xwe afrandîne hene. Nivîskar çendîn kes ji bo me di romana xwe de wênekirîne hinek ji wan kesên dîrokî bûn û rastî di dîrokê da hebûn wekî; Mîr Bedixan, Abdurehman Garis û Simkoyê Şikak...hwd. Di gel van hinekê dî romanivîs ji xeyala xwe afrandine wekî; Ahmedê Lawê Behdînî, Hesin, Sê Cerdecî û Hûrmiz...hwd. Li vêrê di amajê bi hinek tiştên din, dema mirov hinek sîfeta bide kesek dîrokî divê nêzîkî sîfetê wan yê rast be ewê ji dîrokê hatîye wergirtin. Her yek li gor rola wî ya dîrokî bide naskirin di romanê de. Bi dîtina min xurtî ya li hinek kesa kirî, rolê hineka pitir yê dayê ji rola wan ya rastîya dîrokî. “Simkoyê Şikak” bi serkirdekê pir mezin di vê qûnaxê de daye naskirin û hemû serkirdên din yê kurdan ji wî kêmtir yê lêkirîn” (Sûltan, 2005: 38). Li gor fikrên vî rexnegirî romanivîs rola rastîn ya kesên dîrokî nedaye wan belkî mezintir ji rola xwe wergirtîne ev tişt nexne

kiriye. Ev bi xwe taybetîyeke ji taybetîyên romanivîs çûnkî kesên nivîskar bûyeran wekî xwekekê din bi sadehî na wergirin. Kesên dîrokî rola wan di nava romana xwe da aşkirakiriye lê perdeyaka hunerî bi ser de înyayê, bi renekê edebî daye berdestê xandekaran. Eve jî taybetîyeke ji taybetîyên romanivîs Hizirvan Ebdullah di nava romanên xwe da dariştîye.

Di romanên Hizirvan Ebdullahî de taybetiyên wî yê edebî di nava romanê de bûne eger xwendineka baş li ser romanên wî hebin ji alîyê xwendevanan. Her wekî me amaje kirî navborî her tim xwendevan kirîye beşek ji avakina romanên xwe, bi van taybetîyên xwe karakter, babet û hevgerêdana romanê darêştîye. Rexnegir û nivîskar Abdulrehman Bamernî di romana Hizirvan Ebdullah ya bi navê “Cemîcem” de dibêje; eger bi kurdî behsa wan rûdan û serhatîyên di nava romanê de bikin, çend karakter di avakina vê romanê de beşdarin, her çende rûdanên sereke li welatê Elmanya hate nimayîş kirin jî. Lê bi teknîkeka vehandinê vegêraneke taybet romanivîs karakterên xwe li ser çend welata û herêman dabêş dike. Bi teknîkeka dariştî û lêkdayî li ser yek komve dike, pêkve avahîyê romanê di yek demê de bi domahî tîne. Eve jî piştbestin bi çîroka afirandinê, romanivîsî ev rûdanên hanê û ev serhatîyên di nava romanê de tîne nimayîş kirin, karakter ji bo hatine danîn. Çîrokê tevlihev û bi gîyan têxe, karakterê xwe ber bi mirinê dibe û paşan vedigerîne, Xûdavend bi vê tevlihev kirinê sersorman yan heyirî dibe. Di beramber de Xûdavend xwe li cîhanê dibîne, ew cîhana bi destê mirovan hatîye çêkirin, her mirovî jîyan û gîyan bi wan karaktera daye, belê weke tiştekê xwezayî, belko li bin giranîya hizrên romanivîsî. Xwendekar di dema xwendina romanê de, dibe pişkek ji jîyana wan karakteran, ku ji çendîn rojên temambûna romanê her di nava wê cîhanê de dimîne. Eve jî bi wê teknîkê vedigere ewa nivîskarê navborîyê vê romanê ji bo avakirina hizrên xwe çêkirî, di qaliba romanê de ber çavkirî (Bamernî, 26, 4, 2016). Evî nivîskarê he weha zelal kir ku romanivîsê navborî bi jêhatîbûn û taybetîyên xwe yê wêjeyî karîye romaneka pirî teknîkên wêjeyî karakter û babetên wê dabirêje. Xwendekarê xwe bike di nava cîhana romanê de, hest û sozên wan bilivîne, di gel hindê de xweşîyek dev çêbibe. Weke karakterek xwe di nava romanê de bibîne.

Li dûmahîkê de aşkira dibe ku helbestvan Hızırvan Ebdullah li ser avakirina romanê çî qas jêhatî bûye. Bi wan taybetîyên xwe yên li ser wêjeyê, di nava van romanên de bi cîh kirîye, bi teknîk û rengên xweşik romanên xwe avakirîye.

3.5. Hızırvan û Fikrên Wî

3.5.1. Huner

Helbestvan, nivîskar Hızırvan derbarê huner û edebiyatê de fikir û nerînên xwe dariştîye, piraniya wan di kovara “Metîn” de tê weşandin. Her di derbarê huner û edebê çend zelal kirinek dane. “Helbestê pêgeheka felsefî ya bilindtir ji dîrokê heye, ji alîyê naverokê ve girîngtir e. Ev bilindkirina helbestê vedigerîne wê şîyana wê ya hûnerî, girîngtirîya wê vedigerîne xweşikbûna wê, çûnko divê dîrok rasterast rûdanê vegehrîn, lê helbest bi vî karî narabe, bi hemû azadîya xwe dikare vî karî neke. Bi awayeke raste rast helbest û huner divê taybetîyên xwe biparêze. Helbest ya azade nabe qayda rûdan, dem û cih. Belê derkirina hesta kesî afirandîye, bi vî afirandinê dikare bûyereke wekî ya xwe ji bo yê li hember xwe çêbike, bi vî azrandina hestan kar dike li ser mejîyê kesên beramberî xwe (Ebdullah, 1997: 33). Anko li dûr gotinên navborî ku pêgeha helbestê ya felsefî bilindtir e ji dîrokê, çûnko helbest wekî dîrokê nîne, wekî xwe bûyeran navegêre. Ew jî azadîya helbestê ye bi dem û cih ve girêdayî nîne. Karê helbestê afrandina hestên kesî ye û heman hest li cem yê li hemberî xwe biafirîne avabike.

Her weha Hızırvan Ebdullah di kovara Metîn de di derbarê rewşenbîrîyê û têgeha wê de weha dibêje; peyva rewşenbîr yan rewşenbîrî di zimanê kurdî de peyveka nû ye, belê dibe peyvên zana û zanîn kevintirbin. Her weha dibe peyva “Kelepûr” kevintir be ji peyva “Poyre” piştî cengê li serdema talankirinê hate bikaranîn. Rewşenbîr kî ye? Rewşenbîr çî ye? Erê her berhemekê rewşenbîrî yê rewşenbîre? Hinek dê bizavê bikin li hinek bersivan rawestin û hineka peyda bikin, belê ne pêkan e ku ew bersiv ji bo her kesekê rastbin û bihê qebûlkirin. Lê girîng ewe hinek nêrîna bidine xwendekarên xwe. Ew hizrên bi vî babetî ve giranîya xwe li cem xwendekaran fireh dikin dibe sedema hizirkirineka din. Her wekî me di destpêkê de amajekirî, li cihê peyva rewşenbîr peyva zana dihate bikaranîn. Zana ew kes bû xwedîyê zanînekê yan jî xwedîyê gelek pêzanîna bû, ji wan zanîna hemû alîyên

jîyanê vedigre. Anko zanîn bi têgehê peyva kulturî di zimanê Ewropî de hate bikaranîn, tevahîya zanistan bi xweve digre di ferhenga elmanî de “Kultur” li hember şaristanîyetê hatîye danan. Di alîyê zanistên civakî de peyvên rewşenbîr û zanîn van wateyan bi xwe ve digre; her awayek taybet bi jîyana miletekê ve komeka mirovan bi xweve girêdaye yan hevbeşîya hizirkirinê, bawerîyê, rewîştî, tiştên fêrbûnê, peristin, cilik, ziman, xwarin û vexwarin. Her weha muzîk û huner hemû tev de rewşenbîrî ne. Her dema civakek mirovan bi awayekê jîyana xwe avakir, ev awaye ji alîyê rêvebirin, bawerî, urf û adetan ve ji alîyê hemû miletî ve bihête qebûlkin, eve bi rewşenbîrîya wan dihê qelemdan (Ebdullah. 2005: 95, 97). Her derbarê rewşenbîrîyê de navborî ji bo me weha gotîye ku ew peyveka nû ye di nava kurdan de. Her weha li gor wî peyvên zanîn û zana di nava miletê kurd da kevintir in. Her weha rewşenbîrî ew e ku civakeka mirovan ji hêla hemû alîyan ve ayinî, çand, huner, zeman û hizirkirin, hevdû qebûl bikin ev civak bi civakeka rewşenbîr dihê nasandin. Bi vî away navborî fikr û nêrînên xwe derbarê rewşenbîrîyê dayine zelal kirin.

Her di derbarê hûner û edebiyatê de çend fikir û nêrînên xwe ji bo me zelal dike, dîdareka Hizirvan digel kanalekê asmanî bi navê Waar çend zelal kirineka li ser hûner edebiyatê dibêje; sebarec babetên romanê û çîrokê ez hemû dema hewl didim ji bo çîrokê biçûktirîn babet heldigrim û hizrekê li ser ava dikim, eger te babetekê mezin ji bo çîrokê wergirt wê demê çîrokeka serkeftî nabe. Çûnko wê demê dê bizavêkî babetê çîrokê gehînî û hemû xweşikbûn afirandina wê dê jê dûrkeve. Sebarec simbolên siksî di nav helbestên wî de, navborî dibêje; sikis hezkirineke ji hezkirinên mirovî, ka çawa pêdivî avê, nan, heway, gulêbûnê ...hwd pêdivîya me mirovan in divîya hemû bihêne behiskirin. Çêdibe Hizirvan wêrektir be ji xelkekê dî behis li van tiştan bikin ku hinek kes newêrin behs bikin. Her çende behskirina min li ser siksî di nava helbestê de bi rengeke hêmayî be jî ez behs dikim. Heta sîyasî jî bi rengê hêmay û hizrî şîrovekirinê xwe dikim nek gotarî. Wek helbest ne gotareka sîyasî ye ne vekolîneka siksîye belkî ev tişt bi hev re girêdayine her ji efsanêt somerîya bigre heya girêkîya heya yên çînê, hemûya bi hev re girêdî ku ev jîyan hemû tişt bi hevra ye. Sor rengekê siksîye li dev hemû kesên rewşenbîrîya rengan hebît. Lê li cem me kurdan du rengên sor hene yek rengê siksîye du wek xwîna şehîdan e (Waar Tv13, 3, 2016). Her di vê hevpeyvîna navborî di di gel kanalê telefzîyonê day zelalkirin ji bo babetê çîrokê babetên herî kûr ji alîyê wî ve dihête

destnîşankirin da ku bikaribe hemû alîyên ciwankirin û afrandinê di nava çîrokên wî de cih bigre. Derbarê simbolan di nava helbestê de, simbolên helbestên wî pitir bi rengekê hêmanên siksî dariştine, wî ew weke pêdivîyeka mirovan dîtiye.

Nivîskar Hizirvan di dîdara xwe da behis li dijayetî kirina helbestê dike û dibêje; di sala 1997an de me simînarek li yekîtîya nivîskarê kurd li dar xist, hevaleyê rabû gut; helbest mir û nabe helbest bihête nivîsandin, min bersivêka bi vî awayî da: Aflatunî helbest ji komara xwe avête der û îslamê helbest bi serda çû da naskirin, heya niha jî ne mîletê girîk û ne musulmanan nekarîn dest ji helbestê berdin. Wate helbest girêdayî jîyana mirovî ye û girêdayî wan hez û vîyana ye ku di tu deqên din yê edebî nivîsînê de nikarî derbirînê jêbikî. Her ji efsaneyên somerîya û girîda jî heya pirtûkên dîyaneta û pitirîya pirtûkên dînî yê pîroz hemû bi helbest hatîne nivîsandin. Lê dem hat ka çawa rojek ji rojan mîtulojîya dabeşî sê beşan bû ayîn, cadûvanî, zanist. Her weha helbest jî dabeşî çend beşan bû, helbestê şano jê derket û qonaxa dû de roman jê derket û qonaxa din çîrok derket. Qonax ji bo qonaxê helbestê têşik hebûn lê helbest her weku xwe geş û delal maye. Sebaret efsanê navborî weha dibêje; ez efsanê bikartînim çûnko min bawerî heye mîtulojîya di nava mirovî de ye. Qonax bi qonax ew digel mirovî rengê xwe digûhere, çawa mirov di zanîna xwe de çawa mirov di rewşenbîrîya xwe de û di jîyana xwe de dihê guhartin, we jî gel mirovî diguherîne dibine hêmayên cuda û ev hêmaye çûnko hêmayên şirovekirina mirovî ne. Her ji zarokîya mirovî heya niha jî gel mirovî hêma hene û mirovî ber bi qonaxên baştir dibe. Eger tu binêrî efsane anko çî aşop, aşop anko çî, aşop dibe hizir ew hizir di paşerojê da dibe zanist û ew zanist dibe tişteke “Ketwar” ku mirov pê jîyanê dike, aşop, felsefe û ol hemû tamam kerêt yek in (Waar Tv13, 3, 2016). Helbest û dijayetîkirina wê navborî weha zelal kir. Mîletê girêkî û mîletê misilman xwestin xwe ji helbestê dûr bikin lê nekarîn çûnko helbest girêdayî wan hest û vîna di naxê mirovî de ye. Di têkistên din yê edebî nikarî weke helbestê derbirîna hest û vîyana nava xwe bikî. Li cem navborî di nava cûrên edebî de helbest ya herî bi hêz e ji bo derbirîna hest û sozên nava helbestvanan de. Xwendevanê jêhatî demê xwendina helbestê, hest bi derûnîya nava helbestvan dike û şirove dike, çêjekê jê werdigre.

3.5.2. Civak

Nivîskar û helbestvan di derbarê civaka kurdî di serdema niha d melayên mizgefta fikir û nêrînên xwe di kovarekê de dariştîne, ji gelek alîyan ve sebarett civaka xwe diaxive. Di kovarekê de li jêr navê mela û mizgeft bêdengin...?! weha dibêje; gelek mela û şêxên nezan û tirsonek hebûn dibûne egerê derdeserî û wêrankarîyan. Ca çi ev kare bi zanebûn yan ne bi zanebûn kiribin, belê ew karê wan kirî ketîye di xizmeta dijminê kurdan de, bûye “Fetwa”ji bo wan. Her weha wan hestê kêmdîtîne di nava miletî de çand, kesên biyanî bi emîr û pîroz nîşandane li hember wê jî kesê kurd bi kêm daye nasandin (Ebdullah, 2006: 48). Di vê kovarê de navborî bi vî awayî fikrên xwe derbarê melayên mizgeftan de bi awayekî zelal nîşan dide ku her tim miletê xwe kêm kiriye û dijminê xwe bi mezin û rêberên xwe dane nasandin. Li beramber vê çendê miletê xwe bi kêm bê desthalat dane nîşandan. Bi vî rengî serederîkîna mela li hember civaka xwe û mirovê kurd daye xûyakirin.

Di parçeka din de nivîskar Hızırvan dibêje; bi rastî gelek melayê me ser vê çendê bi vî awayî biçin, dê rojekê ezmanê me jî heram kin. Dê bi zordarî berê me bidin zimanên din, dipirsim melayê berêz ageh li axiftina xudê be. Ayeta Qûr’anê dibêje; “Me hûn e’sîr e’sîr çêkirin cûdahîya ziman û rengên we ji nîşanên xudê ne” xudê ji bo me zelal kiriye ev zimanên cûda cûda ji mezinbûn û nîşanên wî ye. Hemû ziman xudê afrandîne û ew mirovên bi wan zimana axvin e’bdê xudê ne (Ebdullah, 2006: 50). Navborî bi vî awayî melayên di nava civaka xwe de rexne dikin, çû zimanan bi ser zimanê me mezintir nekin, hemû ziman zimanên xudê ne, xudê afrandîne. “Li dûmahîyê dibejim rexna min giştîye ji bo hemû civakê ye, merema min ne hemû zana melayên ayînî yên kurd in, hêştî rêzdarên mîna “Mela Ehmed” “Tehsîn Dûskî” ...hwd û bi dehan melayên dil sozin bi erekê xwe yê durustî radibin hene” (Ebdullah, 2006: 50). Her weha navborî bi vî awayî fikir rexneyên xwe derbarê melayên di nava civaka xwe de parve dike, her wekî daye zelal kirin bi awaye giştî diaxive behis li hemûyan nake.

Nivîskar, helbestvan Hızırvan sebarett peywendîyên xêzanê û civakî li asta nivîsandîne, di rojnameya “Behdînan” de li jêr navê “kartêkirina peywendîya xêzanî li ser asta nivîsandîne” zelal dikin û dibêje; mirov pêkhateka têkel e ji xwe û civakî û dewr û beran, lewra fakterên derekî karkirineka rasterast yan ne rasterast li ser mirovî

dikin, ev karkirine li ser hemû astan xuya dibin. Nivîskar jî wekî her mirovekê dikeve li bin bandora kartêkirinan, çûnko eger em sereyekê li jîyana navdarên cîhanê çi nivîskar yan ji hizirvan bidin, ev rastîye gelek asta ji bo me xuya dike. Dema em jîyana wan dest nivîsandinên û berhemên wan de ji roman û bîrhatinan de dixwînin. Helbesta ji hemûyan xûrtir û berçavtir kartêkirina xêzanê ye li ser nivîskaran ku di her du alîyan de baş dihê dîtin. Ewên xêzan ji wan ra bûne piştewan her tim di pêşveçûnê da bûne, berûvajî ewên din dibin pir nivîskarên mezin û xudan şîyan û hizir fireh, ji ber egerê hey û kadanên ne xweş û ne piştevanî kirina xêzanê, mayne birêve hêz û şîyanên wan di nav wan de mirin, ev kar têkirine ji pir alîyan ve çêdibe (Ebdullah, 2007: 4). Li dor gotinên navborî nivîskar, romanivîs û helbestvanên bi nav û deng kartêkirina xêzanê û dewrûberan li ser wan çêdibe. Her tim palpiştîyeka bi hêz ji bo wan hate kirin heya gehiştîne kupîtka navdarîya xwe, ewên bê palpiştîya xêzanî negehiştîne asteke bilind ya nivîsînê. Bi rêrîna min jî her kesek li ser hunerekê kar bike pêdivî bi civakeke rewşenbîr e ku dijayetîya wî nekin. Her weha pêdivî bi palpiştîyeka xêzanî û malbatî heye ji bo berdewam bûna li ser kar û hunera xwe, çûnko her kar yan hunerek pêdivî bi hêz û zehmeteka mezin a heta cih bigre û bandora xwe hebe.

Her nivîskareke li cîhanê pêdivî bi jîngeh, xweza, dewrûber, xêzan û malbatê heye, ji bo berdewam bûn li ser kar hunera xwe. Her weha kartêkirina dewrûbera li ser helbestvan yan nivîskaran aşkiria dibe. Her sebare babetê nivîskar û kartêkirina xêzanê helbestvan Hizirvan weha kartêkirina xêzanê li ser xwe aşkira dike û dibêje; ji bo min bi xwe wek nivîskarek, sê faktorên girîng yê xêzanê hebûn ku ez heza xwe ya nivîsandinê bi azadî derbibirim û bikaribim dirêjahîyê bi karê xwe yê nivîsandinê bidim. Her ji zaroktîyê di ser û berê xwendinê di nava xêzana min de gelek rêz û bihayê xwendin û kesên xwendevan hebûn û rêza wan digirtin. Babê min hem piştevan û arîkarê min bû, li qonaxa destpêkê pir hez dikir wek nivîskarekî mezin min bibîne. Alîyê madî yê xêzana me baş bû ji bo min astegî nebû. Her weha hevjîna min weke min hez ji nivîsînê kiriye û her tim arîkar piştevanê min bûye, şanazî bi min birîye wek nivîskarek. Bi kurtî eger ev alîkarî neba, dibe ez negehiştibam vê asta nivîsînê. Anko kesê nivîskar berî pişkek be ji civakî, ew pişkeke ji xêzanê kartêkirineka mezin li ser wî heye (Ebdullah, 2007: 4). Kartêkirinên xêzanê li ser nivîskaran bi rengeke ber çave, nivîskar her kese pêdivî bi alîkarîyê ye ji civak,

xweza, balbat û xêzana xwe ji bo berdewamîya kar û hunera xwe. Helbestvanê navborî palpiştîya malbata xwe ji bo berdewamîya huner û nivîsîna xwe daye zelal kirin. Ew bi egerê sereke yê serkeftina xwe ye derbarê nivîsînê de dane zanîn. Bi vî awayî fikrên xwe yê li ser nivîseran û xêzanê zelal kirîye.

Helbestvan û nivîskar Hızırvan çendîn fikrên xwe derbarê civaka astegîyên wan û xelet hizirkina wan ya aynî, xelet gehandina ayînî ji alîyê melayên mizgeftan ve ew fikrên xwe li ser dibêje bi kareke şaş dibîne ku miletê wî weha ayînê pîroz wergire wan rexne dike. Her sebare nivîser û karkirina li ser wan ji hêla civakî û xêzanî ve dibe palpişt ku berdewamîyê bi karê xwe bidin, fîreh hizir bin di nivîsînên xwe de. Bi vî rengî navborî hizir û fikrên xwe li ser civakê îfade dike û li rojameyan û kovaran de diweşîne.

3.5.3. Siyaset

Nivîskar Hızırvan Ebdullah di derbarê sîyasetê de xwediyê fikir û nêrînên balkêş e. Ev fikir û zelal kirinên xwe sebare sîyaseta îraqê aşkira dike. Bi taybetî li ser deverên arîşe li ser yan jî rola kurdan li îraqa ji nû ve avabûye ya piştî hetina partîya “Be'ess”ê. Her weha li ser bûdce û zinanî fikrên xwe zelal dike.

Her di derbarê sîyasetê de di kovara “Metîn” de di babetekê li jêr nav û nîşanên “Piskirêkên Erebkirê û Deverên Arîşe” fikir û ramanên xwe xuyadike û dibêje; piştî azadbûna îraqê kurdan roleka xurt di pêkînana îraqa nû de heye. Bi taybetî ji alîyê destûrî ve û gelek pêngavên hê jî di berjewandîya kurdan de hatin avêtin. Yek ji wan madeyan ew bû ya li ser wan deverên ji alîyê “Seddâm” ve hatibûne Erebkirin, bizivrin ser deverên kurdan û digel îraqê bihê dîyar kirin. Belê her ji zû gelek hêzên îraqê dijayetîya xwe ji bo vê mada destûrî rageyand, heye niha hemû hêzên îraqê yê îslamî û e'lemanî li dijî vê xala destûrî ne. Mejîyê hinek alîyan weha ye, hîç bawerî nîne kurd di nava îraqê de hene, ewên bawerî bi kurdan nebe dê çawa bawerîyê bi deverên wan kin. Li ser dema rejîma “Seddâm” pîlan hebû deverên kurda teng bike (Ebdullah, 2007: 50). Anko alîyên Îraqê her ji kevin heya niha qebûl nekire deverên hatîne Erebkirin bidine kurdan, ku hemû dizanim ku rejîma Be'ess ew bi darê zorê ji kurdên îraqê wergirtibû. Navborî weha zelal kir ku Îraq bawerî bi hebûna kurdan nîne, evca çawa madeya deverên wan qebûl bike, bi dîtina navborî ku

Îraq heq û mafê wan dixwe û bawerîyê bi hebûna kurdan nîne hêşta bi eqlîyeta xirab serederîyê digel kurdan dikin.

Hizirvan ji bo sîyaseta kurdan bang li kurdan dike dibêje; Erê ma dem nehatîye em jî yek bin, bi rast û çep ve bi e'lmânî û îslamî ve kurd bîn, ji bo berjewendîya milletê xwe li her cihekê hebe kar bikin. Em hemû pirskirêkên xwe winda bikin bibine yek dil û yek deng, pişta hev bigrin. Heya bikaribin li hember sîyaseta bi zûlma dijî me xwe ragirîn, bawer dikim baştirîn alîkarî hevgirtin e (Ebdullah, 2007: 50). Navborî derbarê sîyaseta dijwar ên dijî milletê wî bi fikrên xwe yê sîyasî bang dike bo yekbûna neteweyî, pişta hev berdedin, her kesê çî bîr û bawerek hebe bila hebe, lê em bihevre bin û pişta millet û welatê xwe bernedin. Ew jî hinek fikrên helbestvan bûn li ser wê sîyaseta ji alîyê Îraqê li hember kurdan û deverê wan dihate kirin.

Her sebare fikrên helbestvan derbarê sîyaseta Hizirvan pitir behs li kêşeyên navxweyî dike yê li deverên kurdên îraqê de çêdibin. Li kovarekê de bi jêr navê "Sitandarbûn Yan Jêkvebûn" dibêje; dihête gotin partî Duhokê tenê girtîye û dest ji Kerkûkê berdaye, li kolanên Duhokê pare dihête riştin û deverêndin ji birsa dinalin. Ez ne parêzerê serokî me û ez nekirme nunerê xwe. Nizanim çend car serdana Kerkûk û Germîyan kire û çend car hatîye Duhokê, Çûnko ew baştir dizane sera kêdirê bide. Ez dixwazim xalekê dubare bikim, heya niha hemû desthelatên deverên îraqê di destê her du partîyan de ye. Her du pêkve dipirsin, heya niha "Bûdceya" deverên kurdan yê li bakura îraqê di nava Hewlêr û Sulêmanîyê de dihê parvekirin, 46 ji bo îdareya Sulêmanîyê 54 ji bo îdareyê Hewlêr û Duhokê. Eger Sulêmanîyê Germîyan digel de be, Hewlêrê Mexmur digele û Duhokê Şêxan û Tile'fer digele. Digel hindê jî hinek budceya Duhokê û Hewlêrê li Kerkûk û Germîyan dihê xerckirin. Belê Budca Sulêmanîyê li deverên din nayê xerickirin. Yan di deverê de Kerkûk û Germîyan li pêş in û mirovê wan bi pileyeke, ev deverên akincî kirmanc li paş in û mirovê wan bê pile...? (Ebdullah, 2008: 159). Anko fikrên navborî yê derbarê sîyaseta partî kurdî yê bakura îraqê kêşên navxweyî de ev in. Her weha behis li budceya her du parêzgehên Hewlêrê û Sulêmanîyê dike, sebare vê çendê fikrên xwe yê sîyasî dibêje û zelal kirina li ser van alozîyên sîyaseta her du alîyan aşkera dike.

Li dumahîyê helbestvan û nivîskar Hızırvan derbarê huner, civakî û sîyasetê fikr û ramên baş hebûne, li kovar, rojname û kanalan de derbirîna hizir û ramanên xwe kirîye û daye zelal kirin. Navborî bi kesekê bîrmend, nivîskar, xudan hizrên fireh di nava civaka xwe de bernîyase.

3.5.4. Berhemên Wî

3.5.4.1. Berhemên Hatine Weşandin

3.5.4.1.1. Edebî

- a. Ez û Agir, 1989, Bexda, Helbest.
- b. Di Kawlanê Xencerê de Mirin Tê ji Bîr kirin, 1996, Duhok, Helbest.
- c. Narîna Gulbaran, 2003, Duhok, Efsane.
- d. Hêlên Sor, 2004, Duhok, Roman.
- e. Pir Tiştên Berzebûyî, 2005, “4 berg”, Duhok, Helbest.
- f. Zînê û Leşkerê Nikilzeran, 2005, Duhok, Amadekirin ji bo zarokan.
- g. Azirandina Bendemanê, 2008, Duhok, Helbest.
- h. Firîn di Pencerê de, 2010, Duhok, Helbest.
- i. Şopên Rondikan, 2011, Duhok, Roman.
- j. Camîcem, 2017, Duhok, Roman.
- k. Stranên Emerê Ewdê, 2011, Duhok, Folklor, Civandin.

3.5.4.1.2. Vekolîn

- a. Sîseban, 2009, Duhok.

3.5.4.1.3. Werger

- a. Pînokîyo, 2006, Duhok.

- b. Zêzana Rabînsôn a Swîsî, 2007, Duhok.
- c. Sîyaseta Pîla Sêyê, 2010, Duhok.
- d. Heft Tîtalên Ektîfkirina Mirov, 2001, Duhok.

Her weha ji bilî wan berhemên jî bi dehan berhem û lêkolîn di kovar û rojnameyên Kurdî de belav dike. Weke “Hevkarî, Beyan, Roşenbîrîya Nû, Karwan, Nûserê Nû, Dengê Me, Nûxwazî, Peyv, Qazî, Serhildan, Ewro, War, Eman, Gulan, Bîyav, Peyman, Havîbûn û Xebat, Hwd” (Hevpeyvîn, Ebdullah, 2018. 11. 11).

3.5.4.2. Berhemên Neweşandî

3.5.4.2.1. Edebî

- a. Dîwana Nehê
- b. Dîwana (Çarênayên Hizirvanî)
- c. Dîwana Kurte çaman (Hayko)

3.5.4.2.2. Vekolîn

- a. Dastana Dimdim, Şaxek Nebelavkirî.
- b. Dîroka îlê Sêkak.
- c. Vekolînên li dor Çamê (Helbestê), Ji Şeş Vekolînan Pêk tê.
- d. Vekolînên Mîtolojî, Ji Çend Vekolînan Pêk Hatîye.

3.5.4.2.3. Wergêran

- a. Nefreta Petrolê, Ji Mivîsîna Dr. Gurduwn Jonsûn.
- b. Pîter Ban, Ji Nivîsîna G.M. Gary
- c. Kurd û Avakirina Netewê, Ji Nivîsîna Martin Wan Biroşê

d. Dê Çewa ji bo Zarokan Nivîsî? Ji Nivîsîna Cun Ayken. (Hevpeyvîn, Ebdullah, 2018. 11. 11)

3.6. Zimanê Helbestê

Di zimanên helbestan de Her ji kevin de helbestvan nivîskar destkarî di zimanî de kirîye. Wekî zimanê axaftina rojane ziman di nav helbestê de bikarnaînaye, bi rêya hinek teknîk û taybetîyên wêjeyî li dev helbestvanan bi zimanê helbestê dariştî ye. Zimanê helbestê ku çend xasyetan bi xwe ve digire wekî zimanekê ciwankariye, xeyaliye, amajeyê, soz ye. Plankirin di nava zimanê helbestê de heye, ji ber vê sedema girîng ziman di helbestê de girîng dibe. Hatîye gotin di nav her helbesteka jêhatî û mezin da helbesteka din heye ew jî ziman e.

Her weha regezên dîtir ên helbestê jî wekî rîtimê wêneyê helbestê bi rêya ziman tê bikaranîn. Rola xwe digire ji ber hindê dişên zimanê helbestê pênase bikin. Çawanîyeka taybeta reftarkirinêye digel zimanê asayî de” (Nihêlî, 2013: 179). Anko zimanê helbestê her zimanê sade ye lê helbestvan bi rengekê delal bi zêdekirina peyvên nû wê dadirêje.

Her weha ziman baştirîn rê ye bo peywendî kirinê di nava mirovan de, çûnkî helbest ji bo xwendevana û xelkê dihê nivisandin û helbestvana ji bo vê yekê pena bû zimanî birîye bi rengê edebî dariştîye. Ziman baştirîn û bihêztirîn rêya peywendî kirinê ye ku derbirînê ji hest û sozên xwe dike. Her çende ew reng û rengên din yê peywendîkirinê ta radekê baş derbirînê ji dîtin û ramanên fêrker dike. Wekî amaje û wêne hwd.” (Abdullselam, 2011: 29). Anko ziman ew rêye ku peywendî di navbera mirovan bi vê rêyê tîncamdan ku her eve bûye sedem helbestvan zimanî bikarbîne, peywendîya xwe û xwendekarê xwe xurt bike.

3.6.1. Zimanê Helbesta Nûxwaz

Helbesta nûxwaz ji hêla ziman ve peyvên nû ji bo nûkirinê bikartîne ku ew peyvên nû di helbestên berê d nehatine dîtin wekî peyvên keprokên li ser dêmê wê dibine maç, cexxane hwd. di encamê de zimanê helbestê bi hêz û zengîn dike.

Di helbesta klasîk û nû d bikaranîna zimanî taybetiyên xwe hebû ku digel sirûştê helbesta wê serdemê dihate gûncandin. Ji saloxetên helbesta klasîk bikaranîna zimanê giran û zehmet bû, kesên sade bi hêsanî têngahî ziman araste kiribû, ji bo çîna aristogirafî û her weha zimanên helbesta klasîk ya kurdî têkel bû bi zimanê “Farisî, Arebî û Turkî. Belê di helbesta nûxwaz de zimanê helbestê zimanê xelkê ye ku vî zimanî xwe dîr fikir, ji giranîya zehmetîya zimanî. Eve jî wê çendê na gehîne ku helbesta nûxwaz giranîya xwe ji dest dabe belko her tim berev hindê diçe. Helbesta nûxwaz sêhbereke ji bo ber firehkirin û zîndîkirina zimanî” (Abdullqadir Nûrî, 2011: 204). Anko helbestên nûxwaz weke helbesta nû û klasîk zimanê giran bi karneanîye, hatin peyvên kolankî û yên cûda û yên navçey bi karanîne, pitir berev resenîya zimanê xwe petêbûna zimanî ve diçin.

Her sebare zimanê helbesta nûxwaz “serbexweya zimanî bi rêya hişarîyê ne agahîyê li demê nivîsandina helbest nivîsînê bi destve dihê, ji ber ku divê helbestvanê nûxwaz qeydên zimanî nehêle. Çûnko helbesta nûxwaz pêdivî bi hizr û nêrînên zimanekî nû ye, da ku peywendîya di navbera helbestvan û zimanî de, peywendîyeka nû ya rizgarker be, ji merema wateya sereke ya zimanî” (Ziyab, 2005: 122). Anko di helbesta nûxwazde ew qeyda zimanî dihêne şikandin, helbestvanê nûxwaz li gor hizr û nêrînên xwe yên nûxwaz zimanî li gor dilê xwe bikartîne.

Helbestvan Hizirvan Ebdullah di helbestên xwe yê nûxwaz d zimanê Kurdî ye resen û pevy û destewajeyên nû darêtîne pir bi raman. Zimanê helbesta nûxwaz zimanek nûye zêdetir bo layê Kurdîyeka resen û kêşaye. Kêmtir ji peyvên bîyanî bikaranîne û bi taybet zimanê ‘Erebî. Çûnkî piranîya helbestvanê nûxwazên devera Duhokê şarezane di zimanê ‘Erebî de. Helbestvanê navborî şarezatî di zimanê ‘Erebî da heye sereray vê çedê helbesta xwe ber bi zimanê Kurdiya resen ve birine.

Mînak:

Awirên te kulîlkin

...

Ligornt tenik û taristan

Gulîyên teng û soristana lêvên te du dilî ya min vedikujin

Heku gor teng dibin, dizanim mirne bi yekcarî

Li cîhana min ya nihên dimrît tarî

Li ber tîrojken hetava evînîya te me pirtên jîyanê vedixarin
Li şeva kewa kupên çîya maçî dikirin
Bi dengê maça bilbil mest dibûn, hatina hatavê ji bîr dikirin
Ez bi tirana di xapandim, xapên teyên paxila şevê
Tifengên dîtina rojê di min wer digirin
Sê lib pirsên min hatine te bi gelwazên vehonandî
Bê tevnê dojecha mirinê kevokên kûvî hîdkirin
Awrêt te xanîyên teji ronahîne... (Ebdullah, 2005: 63).

Di vê helbesta nûxwazî de ku helbestvan Hızirvan Ebdullah zimanekê “Kurdîya Resen” bikaranîye. Peyva destewajên resen û berzebûy xistine di nav helbestê. Ev jî nîşana hêzê ye ji bo zimanê helbestê. Her weha mijayetîyek xistîye nav ramanan de. Di vê parçê da peyvên wekî “avir, kulîlk, soristan, tîrojken hetawe, sê lib, paxil, vehonandî û tevnê dojahê”. “Vehadina resen û berzebûy ku zimanê helbestê pêhatîye nivêsandin, ev çende dibe egerê şêlîbûna ramana û wateya helbestê li cem xwendevanî, her weha bi vê çndê peyvên zimanî bihêztir û firehtir dibe” (Ziyab, 2005: 123).

Di van çarde niv rêzan de peyvên Kurdîya resen bikaranîne. Bi zimanekê delal vehandîye, li gel xwendina helbestê xwendevan ta'm û xweşîyekê jê dibîne.

Her weha delal kirina peyvan, danberhevkirina wan zêdetir helbest zengîn û ciwan kirîye. Wekî “soristana lêvên te, pirtên jîyanê vedixarin, paxila şevê û gewazên vehandinê” dîtina van peyvan û destewajên ciwan helbesta nûxwazî ya Hızirvan pê dixemilîne. Ku beriya niha ev peyv û destewaje di helbestên beriya helbesta nûxwazîyê da nehatine dîtin.

Di vê parçê helbestê de peyvên gundan an jî yên deverî hatiye bikaranîn. Wek “pirt, paxil, lib, tevin” ku hinek peyv hene taybet in li wê devera helbestvan tê d dijî, peyvên resenên Kurdîya wê deverê ne. Belkî jî li gelek gundan bikartên di esil de peyvên resen in.

Mînak:

...

Kevrên barbarê, li bin xusarê
Kevalên Her reg di afrandin
Evrên tim avis çîkî dihatinê
Dijwar lê didan janêt pêş bûnê
Zarên xwe çîk li me di baran din
Dare keskên kajan
Kevrên bin şikeftan dêrîna çarstûn
Xoşe Sêtranêt vîna bêguneh
Bi tev amajan li hev di gerandin... (Ebdullah, 2009: 194).

Di vê parçe helbesta Hizirvan Ebdullah de ku em ji hêla zimanî ve temaşe bikin ku zimanekê Kurdî resen peyv û destewajên wê bi bi awayeke delal û nû hatîne darêtin. Her ji vê hêlê ve gelekî aşkere tê zanîn helbesteka nûxwazîye ye. Wek “Barbarê, xusarê, keval, avis, darkesik û amaja” li vir peyvên zelal xumalî bikaranîne helbest pê bihêz û bireng û delal kirîye. Di vê parça me amaje pê kirîye peyvên biyanî nehatine bikaranîn.

Rengekê delal dane berhev kirina peyvên, ciwanîya helbestê berçav kirine. Ta’ m û çoşek daye xwendevanê helbestê. Wek “kevrên barbarê, li bin xusarê, evrên tim avis, çîkê hatinê, darkeskên kajan, şêkefta dinîne çarstûn, xoşe stranêt vîna bêguneh, sirtanê vîna bê huneh” bi vê pêkvedana xweşik ji bona ziman, hêza zimanê helbestvan dide dîyar kirin. Ka çend zimanê wî yê helbestê bihêz e.

Derbarey peyvên navçeyî nivîskar Mohemed Bekir dibêje; ji bo zengînkirina ferhenga zimanê helbestên xwe helbestvan peyvên navçeyî bikartîne” (Bekir, 2004: 41). Anko di helbestên nûxwaz de peyv her ji bo zengînkirin û bihêzbûna zimanî tê bikarînan.

Mînak:

Li dema min tu li nîva dilî çandî
Min ne pirsî ka dê şîn bî ya behî?
Li dema min tu hezandî
Min ne pirsî çi kinêfî, tu çi rihî
Li dema min tu nexşandî

Min ne meyzî li çavê te ya kirêti yan tu sêpehî

Lê min meyzî li çavên xwe

Û min pirsî ji mejîyê xwe

Kevalekê fireh. Fireh, ciwan û mezin

...

Min dev gehand gerdena te

Min dest gehand berbena te

Lê ku bextê min vajî bû zûka qatîya li berçena te

...

Li nav bera min û te agir û avin!!

Kutirê sipî /peryên kehî (Ebdullah, 2004b: 38).

Di van çend nîverêzin vê helbestê de eger temaşeyî vê helbestê bikin ji layê zimanê ve di bînîn bi Kurdîyaka petî hatîye nivîsîn û bi zimanekê resen û nû ye. Peyv û destewajên wê “pir rengîn û dewlemendin û nû” ne ku helbesta nûxwazîye ye. Ev peyv û destewaje di helbestên beriya vê da ku helbesta klasîk û nû da nehatibûn dîtin. Her wekî “min tu hezandî, min tu nexşandî, çi kinêti, tu çi rihî, meyzî li çavên te, meyzî li çavên xwe, gehandina gerdena te, li berbena te, û perîyên gehî” di helbesta nûxwaz da Hızırvan Ebdullah peyvên nû û bi awayekî delal rêzkiriye, zimanê helbestê bi hêz û mikûm kirîye.

Her weha bikaranîna navan di helbestê de bi giştî wek navên bajaran, yê endamên leşî û navên tiştê bêrih hwd. di vê helbestê da hatine bikaranîn. Wek “gir û av, behî çav, dil, mêjî, keval, befir, kûtir û perî hwd” di helbesta Hızırvan de bi vî şeweyî nav hatîne bikaranîn.

3.7. Hêma di Helbestê de

Hêma yek ji wan binemayên dîtir ên teknîka helbestê ye, bi harîkarîya hêmayê helbest zelal dibe. Helbestvana di nava helbestan de girîngî bi hêmayan daye li gor xweza, serdem û taybetiyên xwe hêma di nava helbestê û wêjeyê de bikaranîne. Hêma bi wateya nîşan, dirûşim, remiz û amaje ku pêkhatîye ji tiştêkê gîyandar yan tiştêkê bêgîyandar ku tiştêkê cuda pêktîne.

Her weha di zimanê Îngilizî û Elmanî de “Symbol” di zimanê Fransî de “Symbole” di zimanê ‘Erebî de “El-Remiz” di zimanê Kurdî de” Remiz, Hêma û Çeveng” tên bikaranîn” (Nihêlî, 2013: 244). Anko hêma ew helbesta li ser tê avakirin bûye cihê girîngîyê di nava vekolera û helbesta nûxwazî de bi têr û teselî amaje pê hatîye kirin. Helbest ji hêla ramanê ve pê dewlemendtir dibe.

Her weha di ferhenga zimanî de hatîye “Hêma wate îşarete yan agadarkirina xelkêye ji bo temaşekirin û dîtina tiştêkê” (Kerîm, 1986: 197). Anko hêma tiştêkê dide berçavê xelkê ku zêdetir di mebesta helbestvan bigîhine.

“Hêma ew şîyan hene behs li tiştê bike bi amadebûn yan bêamadebûna wî tiştî. Ew axaftinker behsa mêzekê bike çi ew dar amadebe li berçavê wan çi li berçavê wan nebe” (Abdullselam, 2011: 94). Li gor vê pênasê anko di hêmayê da ew tiştê behsdikin belkî berçav be belkî jî nebe. Lê dema helbestkar di helbestê serî li hêmayê dide, ew helbest kurahiyê werdigire nava xwe.

Hêma di helbestên kurdî de yek ji rengên ne zelal yê wateyê tê dîtîn. Ji ber ku dema peyv ji bo weteya rast û ferhengî nayên bikaranîn, hêmayên nû jêre tên gotin, ku di berê de hilgirê wan wateyan nebûn. Ew jî xwendevanî berev hizirkirinê ve dibe, bi awayeke ne raste rast peyam dîgehe xwendevanan (Dilshad Âmin, 2017: 149). Anko li gor vê çavkanîyê di nava helbestên kurdî de hêma hatîye bikaranîn. Ji bo ne zelal bûna wateya serekîya helbestê lew hêma peyam an jî ew tiştê ku helbestvan dixwaze nîşan bide dinixwumîne.

Her wekî me amaje pê da, hêma yêk ji pêkhênerên helbestê ye. Di helbesta Hizirvan de ev hêma li pêş çavê me dikevin, çi hêmanên efsaneyî be yan siruştî be yan dîrokî be yan jî folklorî be hwd.

Her sebare hêmayan di nava helbestên Hizirvan Ebdullah de rexnegir û vekoler Şivan Qasim dibêje; di nava helbestên Hizirvan de hêma hatine bikaranîn, weke efsaney dîrokî ...hwd. helbestvanê navborî bi rêya van hêmayan nixaftinek û şêlîbûnek bi ser helbestên xwe de anîye. Xwastîye bi van hêmayan helbesta xwe ji alîyê wateyê ve dewlemed bike. Ku xwendekarên helbestên wî, pêdivî bi hizirkirineka zêde be heya bigihê armanca helbestvanî” (Nêrweyî, 25, 7. 2019). Li

gor Qasim helbestvanê navborî di nava helbestên xwe de her tim xwendekar kirîye beşek ji avakina helbestê, mecalê hizirkirinê li ser helbestê li ba wan vekirîye.

3.7.1. Hêmayên Efsaneyî

Ev hêma di hizir û bîra rewşenbîrîya mirovên kevin de peyda dibe, piştî xwe dide mît û efsaneyan. Mirov di siruştî hizirkirina xwe de tiştê kêr dizane, beramber gerdunê tiştên efsaneyî di xeyalên xwe de wênekê taybet ji bo wan dirust dike. Ev tişt jî li def xwe hêma ye, ji bo bingehên helbestên nûxwazî helbestvan mifa ji vê çendê werdigre. Li gor efsaneyên neteweyan, ji xwe helbestvanên Kurd jî mifa ji van efsaneyan wergirtine eger em temaşeyî helbestên Hizirvan bikin dibînîn ku wî jî sûd ji van hêmayan wergirtîye.

Mewlud Îbrahîm Hesên bi vî rengî efsaneyê pênase dike “Efsane pir dewlemend û pir babetên nihênîyên mirovan e. Bi hemû mirovayetîyê û hemû çerxên jîyanê hemû netewan û astên jîyanê û rewşenbîrîya wan ve têkildar e” (Hesên, 2007: 34). Anko avakar û belavkerên efsaneyan mirov bi xwe ne loma normal e ku mirov rastî nişaneyên milletan bê.

“Girtina serpêhatîyekê ya li kevne zemanekî çêbuye kartêkirin li jîyana wan kirîye. Bi rengê çîrok hatiye gotin da ku bi hêsanî bê parastin” (Hesên, 2002: 29). Anko wek li berê da tiştê hatîye rûdan, li komelgahekê kartêkirin li jîyana wana dike ew jî bi rengê çîrokê wê vedigêrin ji bo yê duv xwe da.

Mînak:

Min dît. . Min dît

Pîrhevok ji kevlê dîya min hatin de

...

Min dît . . Min dît

Milet hejar û qelinder

Ejdeha bune sêzde ser

Roj li ezmanî weger ya

Heyv kevde ber... (Ebdullah, 1989: 21).

Di vê helbesta xwe de Hîzirvan Ebdullah hêmayên efsaneyî bi kar tîne. Wekî “Pîrhevok, Ejdehayê Sêzdeser” ku ev hêmayên di efsaneyên Kurdan de pîrhevok hêmaya xapandinê ye û ejdehayê sêzde ser hêmaya dirindeyê ye ku helbestvan ev hêmayên xapandin û dirindeyî ji bo zordariya hîzba “B'aahis û Saddam” bikaranîye ku ew xirabî û zordariyên beramber milletê wî kirine. Her wekî hate dîyar kirin, ew zordarî û nexweşî ya bi ser me înayî her di helbestê da peyva min dîtin dubare kirîye. Wate helbestvan ev nexweşîya bi çavê xwe dîtîye û rojên me kirine şevên tarî anko xweşîya me ew roja xweş li me kire şeveka tarî. Her li dawîya helbesta xwe dibêje millet hejar qelin der, roj li ezmanî wergera heyv kete ber. Anko milletê me hejar û bê çare ma nexweşî û zûlim bi ser de hat. Evê çendê bi hinek hêmayên efsaneyî dadirêje.

Mînak:

...

Kalê serê sêryan û kêrîya

bilbilekê dîn û gêje ... (Ebdullah, 2004a: 70).

Di vê helbestê de hêmayeke din efsaneyî hatiye bikaranîn. Ew jî “kalê serê sêryan û kêrîya” di efsaneyên Kurdî de hatiye ku ev kale kesekê bi salbeçû hêmanên xemgîn ji xema kal bûye. Her weha kesekî dil sax û baş, ew hêmaye bo bikaranîye ku dilekê paqij û xemgîn û rastgo bi vê hêmayî derbirîn ji dilê xwe kirîye, ev hêmanên efsaneyî bikaranîye.

3.7.2. Hêmanên Siruştî

Hêma yêk ji pêkhata helbestê ye her wekî me amaje pê kir di helbesta nûxwaza Kurdî de helbestvanan pena bo hêmayên siruştî jî birine. Bi taybetî hêmayên ciwan ên welatê xwe wek “çîya, şax, dar, bihar û keskatî hwd.” bi rêya van hêmanên siruştî helbestvanî vîyaye hizrikineka baş li dev xwendekarê xwe çêbike. Hizreke veşartî li piştra bêje dîmenekê siruştî yê ciwan bi serda bîne.

Rexnegir, nivîskar Kamûran Xelîl dibêje; deverên kurdan li bakura îraqê pirin ji xwezayeka delal helbestvanên me yên deverê di helbestên xwe de ev hêmayên xwezayî bikaranîne. Her weha Hizirvan Ebdullah helbestên xwe ji vê xwezaya delal bê behir nekiriye. Bêgûman nêrîn hestên helbestvan li jêr van hêmayan de zelal dibin” (Hevbeyvîn, Xelîl. 25. 7. 2019) Anko helbestvanên kurd yên devera behdînanê di helbestên xwe de hêmayên xwezayî bi awayeke cuda û nû bikaranîne. Ev yek hema bêje di gelek helbestvanî de ye ku pê re xwendevan hem rastî sazkirinên balkêş tê di helbestan de hem jî dibe reftarê poetîkaya wan helbestvanan.

Mînak:

...

Hey hu metîn

Evê carê dîsa me dîn

Hatin..Hatin swarên gulê hesêp reşên

Cilik reşin

Dev û dest qamçî direşên... (Ebdullah, 2004a: 66).

Di vê parçe helbestê de helbestvan, pena bo çend hêmayên siruştî birîye ku nixaftinekê bi ser helbesta xwe de danîye û têgihîştina wê zehmet kiriye. Hizra sereke li pişt bibe wekî “Metîn” ku bo hêmanên welatê xwe bikaranîye. Her wekî gazî dike “hey hu Metîn” ev çend sal bûn em jêk vebîne ku xerîbîya xwe di dil şewatîya xwe ji bo welatê xwe bi vî rengî radihêlîn. Bi vê hêmayî wêneyek ciwan jî daye helbesta xwe, bi dubarekirina “hey hu Metîn” hêma û tekrarkirin helbestê bi hêztir kiriye. Her weha “hespên reş, cilkên reş, dev û dest û qacîyên reş” ku eve hêmanên xirabkarîyane ji bo ser welatê wî. Ji layê rejîma ji navçûyîya Saddam bo ser cihê wan bi van hêmayan nixaftinek bi ser helbesta xwe kiriye, bi van hêmayan hest û sozên xwe darêşti ye.

3.7.3. Hêmayên Dîrokî

Di dîroka mirovan de gelek ji jêder bûyer û rûdanan hene ku pişt re ev bûne derfet bo folklor, edebiyat û çandê. Li vêrê helbestvanan mifa ji vê çandê wergirtîye, bo nixaftin yan perdekirina wate an jî peyamên helbestên xwe. Wek hêma ji bo helbestê sûd wergirtîye her wekî di destpêkê de me amaje pê kirî di helbestên nûxwazî de girîngî daye naveroka helbestê û mişawî û şelî bûn di helbestê de durist kirîye. Her dem vîyaye mecalê hizirkirina berfireh dev xwendevan çêbike ji bo ku ev tişte girîngî zanîye. Ewqas hêma girîngbûne di helbestê da, hêmayên dîrokî behsa bûyereka başî kiribe ya xirabî yan edaletekê bo wê hêma bikaranîye. Hem helbest pê rengîn kirîye hem bi arîkarîya hêma te'm û xweşîyek li cem xwendevan peydakirîye.

Sebaret hêmanên dîrokî Hizirvan Ebdullah dibêje; bi rastî jî dîrok pire li ser hatî qaremanên nav û deng, min jî weke helbestvan mifa ji vê çandê wergirtîye. Eger ez qaremanekê di nava helbesta xwe da bikarbînim, ew qaremane qûrbanîyeke mezin daye ji bo armanca başîyekê. Min jî di nava helbestê de bikaranîye da ku xizmeta helbesta min bike û ramaneka xûrtir bide halbestê” (Hevpeyvîn, Ebdullah 5.8.2019). Her derbarê vê çandê helbestvan xwastîye ku qaremanê wî bi rastî ew be yê ku qûrbanîyeke mezin dabe ji bo serkeftin bi ser zordariyekê.

Mînak:

Hê hevalo

Talan li rezên jara rabû

...

Kela dim dim zinçîrda bû

Xanê cengevanê cengê

Kewê rengê

Bi kuştin berdan

Mizgîn xuyn û

Xena bu (Ebdullah, 1989: 24).

Xwezaya herêma başûr pirin ji layên cihên dîrokî û kevnare va. Helbestvan Hizirvan Ebdullah helbesta xwe ji van serpêhatî û şûnwarên “dîrokî” bêbehîr ne kiriye. Her wekî di vê parçe helbestê de bi vegotina helbestekê bi dîroka welatê xwe çend rûdanên reş bo me dîyar kirine; “hê hevalo, talan li rezê me rabûn û kuştin”, ferman li welatê min rabû, xelkê hejar talan kirin.

Her weha di pirtûka nivîskar Nimetullah Nihêlî de li ser hêmanên dîrokî li ser helbestên koma Nûkirin Her û Her de hin fikr hene. “Kela Dimdim” weke hêmayeke dîrokî bo xweragirî û berxwedanîya gelê kurd hatîye karînan di nava helbestê de” (Nihêlî, 2013: 149). Kela “Dimdim” wek hêmayeke, di heman demê de derbirîne ji bûyera nexweşa serê welatê wî hatî. Xanê Lepzêrîn li vêrê hêmanên mêrxasîyê, cengawerîyê bikaranîye. Ku berevanî ji bo welat û xaka xwe kiriye, li vêrê helbestvan bi van hêmayan ciwanîyek daye helbesta xwe û xwendina helbestê bi te’ m xistîye.

3.8. Wêneyên Helbestê

Wêne ji kerestekê serekî û girîng e di lêkdan yan avakirina helbestê de û peywendîyeka yekser heye bi zimanê helbestê û şewazê avakinê ve. Helbestvanan pena bo wêneyan birîye di nava helbestê de, hind bo delal kirin û wateyên zêdetir bide helbestê hatîne.

“Wênê hunerîyêk ji regezên sereke yê pêkhêner in di avahîya helbestê de. Peywendîyeka rasterast ya bi zimanê helbestê û rengê avabûna wêneyê heye. Wênê hunerî wek zaravekê rexneyê nû ye û peyva wêne “Image” ya ji têgeh “Imagination” hatîye wergirtin. Bi lafînê dibêjinê “Imaginato” û bi Yunanî di gotinê “phantasêa” dibêjine têgeh wêne yan helbeste wêne” (Gerdî, 2004: 25). Anko sebarete têgehêan têgehên cûda cûda ji bo vê peyvê hatîne gotin.

Wêne di binyat de di aşopa mirovî de ye heye bi hestên xwe wan wêneyan derdixê ku cûda ne ji wênên cîwarî. Dişên bi wan amrazên zimanî û şarezayî ya xwe wênêkê nû biafrînin û wateyeka cur û cur dîyar bike lewma dişên bêjîn, her weha, Mohemed Bekir dibêje; “Rengeke ji rengên derbirîne, peywendîyeka asayî ye ji dîyardên cesteyî bi harîkarîya amrazên ciwan gotinê encam dide” (Bekir, 2004: 59).

Ku hesteke ji hestên helbestvana wênekê delal dide wan hestên xwe bi rêka zanist û teknîkên ciwan gotinê. Ku zanista ciwan gotinê vekoler li ser helbestên helbestvana şîrove û zelal dikin.

Avakirina wêneyan bi xwe jî bi serbor û şarezayê çêdibe. “Çunkî wêne ji gelek layenan pêk dihêt. Wekî “ziman, xeyal, bîr, soz û nest” zêdebarî evan layenan. Ew têkelîya bîyavê rêzimanê jî dike, gelek delaletan dirust dike. Wekî delaletên zimanewanî, derûnî, ciwan gotinê, hêmayê” (Nihêlî, 2013: 14). Anko ji bo avakirina wêneyê pêdivî bi şarezayîyê heye ku wêne ji pir layena pêk dihê ji ber vê yekê jî aşop, xeyal, bîr û soz hwd. têdaye.

Wêne di helbesta klasîk û helbesta nû de li ser binemayên nêzîkbûnê dirust dibûn. Bi rêya wan wêneyan ciwanîya gotinê dihate dirust kirin peywendîyeka nêzîkî di navbera wan de heye. Babetê lêk ciwandinê bi peywendîyên xwe yê tê de, beşdar bû mifa jê wergirtin. Di helbesta nûxwazî de hindê wekyekîya wan jê dûr be hindê wênekî bihêztir nîşan dide zêdetir hizr û hestên xwînerî diazrîne. Ev çende yaxîbûna helbesta nûxwazî li ser helbesta kevin berceste û aşkira dike. Avakirina wêne bi şewê çavlêkirin dihate dirust kirin” (Nûrî, 2011: 212). Anko wêne helbesta kevin wekî çavlêkirinek bû. Lê wêne helbesta nûxwazî wênekê bihêz dihate nîşandan zêdetir hizr û hestên xwendevanî diazrandin.

Mînak:

...

Sîngê min wekî bêdera henê

Lêdane gêran govenda hespa û xulamên axaya

... (Ebdullah, 2004b: 35).

Di helbestên Hizirvan Ebdullah da wêneyên cûra û cûr dihê bikaranîn ew jî bi rêya zanista ciwan gotinê mifa ji wêneyan wergirtîye. Weke navborî diyarkiriye wêne kakilka helbestê ye û helbest bê wêne nabe. Her weha di pirtûka Abdulqadir Nûrî de hatîye “weko berî niha hatîye dîyar kirin ku helbesta nûxwazî wek helbesta klasîk mifa ji hunera “ciwan gotinê” wergirtîye. Her weha di helbesta nûxwaz de çû peywendî di nava her du alîyên wêneyan de nîne (Nûrî, 2011, 212). Sebaret vê

mînakê helbestvanî lêkcûwandin bikaranîye her wekî “Sîngê Min” lêşibandin wekî amrazê lêşibandinê ye “Bêdera” pêşibandin “Henê” sîmayê lêşibandinê.

Li vêrê ji bo wênekê ciwan bide helbesta xwe hunerê ciwan gotinê bikaranîye. Em berê xwe bidine vê pêşibandina helbesta Hızırvan Ebdullah, dibînîn ku selîqa helbesta nûxwaz çî peywendî di navbera her du alîyên wêneyê de nînin. Di navbera “Sîngê Min” ku endamekê laşî ye “Bêder” ku erdekê hişk e bo genimî bikartînin. Her wekî me amajê pê daye durî di navbera wan wêneyan da heye, her dîsan şîyaye wênekê bihêz ciwan nîşan bide.

Mînak:

...

Xewna sibê ji min bigerhe ez ne fêrim

Hemû dehbe û hemû qehbe di bêdadîya elindê ra

Sor di bin ji xûnê mişt dibin ji kînê

Dê ser û bin nîrin, tev ser u bin

Min xur xwenêt xwe xweş divît

Min tim xewnêt keleş tivît... (Ebdullah, 2005: 148).

Di vê helbestê de bi arîkariya zanista ciwan gotinê çend wêneyek dîyarkirine, “Sêpî” mecaz bo xwe radest kirinê he rwekî bêje ez ne fêrim. “Dehbe” mecaz e bo tiştêkê dirînde tê bi kar anîn. “Sor” mecaze ji bo xwînrêtinê di hin cihan de jî bo evînê. Ser û bin wek hêma bikaranîye mirovê bi hemû leşê wî ve zelumê tamam. “Xur” mecazê avabûna rojeka nû û xweşe. Her weha veşartin di van wêneyan de hatîye bikaranîn “xewna sêpî ji min bigere ez ne fêrim” bi ramana layenê netewayetî hatîye û radest nekirinê. “Min xur xwenêt xweş da divêt” merem jê avakina rojeka nû û bi destpêkirina jîyaneka nû ye.

Helbestvan di helbestên xwe de bizav kiriye çendîn wêneyên hunerî bikarbîne. Pêxemet pexşîna xweşik û bihêzbûna laylê îstatîkî berhema xwendinên hemû reng ji bo helbesta xwe, wan gelek mifa ji hunerê ciwan gotinê wergirtîye. Da ku wêneyê kartêker ava bike, her wesa wêneyên hevdiş hene da ku xwendevanî berev

kûratîya wateyan ve bibe (Nihêlî, 2013: 215). Her wesa helbestvan Hîzirvan jî wekî helbestvanên din yê nûxwaz wêneyê hevdiyarî karîneyê da ku mecala hîzir kirinê li cem xwendekarî bi hêz bike. Ew jî bi rêya zanista ciwan gotinê weke li jor hate amajekirin helbestvan, bi rêya mecazê û rewanbêjîyê wêneyên helbestên xwe dike. Ew her du helbestên li jêr her bi rêya zanista ciwan gotinê û mecaz wêneyên wan hatiye avakirin.

Mînak:

...

Jinek li dur... dur... dur

Heskirina wê bi min ra ye

Guleka sor...sor...sor

Di nav destê min daye

Ew dijîtin bo dîdarek hêştaya em sax

Ev ya dimrît, di nav destê min da dibe ax... (Ebdullah, 2013: 168).

Di vê parçe helbesta nûxwazî de helbestvan Hîzirvan Ebdullah çend wênekê ciwan bikaranîne bi rêya zanista ciwan gotinê. Şîyaye helbesta xwe pê bi hêz û ciwan bike, dl dev xwînerî “Jin” mecaze ji bo jîyanê. “Gula Sor” mecaze ji bo rêtina xwîneke paqij wek şehîd. “Eva dimrît, di nav destê min da dibe ax” li vêrê ramana wê çendê dide ku ji nav çûna axê ye. Ji nav çûna netewê ye bi vî şeweyî helbest bi wênekê delal û peyamên kûr xemlandî ye.

Mînak:

...

Min nevît kore li çare nivêse xwe binêrim

Min nevêt ji neçarî

Evî xameyê xwe yê macîk

Digel wê tivenga rojekê heval

Min rewana xwe pê dikuşt, veguherînim... (Ebdullah, 2010:142).

Di vê parçe helbestê da helbestvan Hizirvan Ebdullah, çend wêneyên ciwan dide helbesta xwe “Kor” mecaze ji bo hindê ye tu çav li heqîyê bigirî. “Xameyê Macîk” bi ramana wê çendê dide bi peymaneka ji derew. Her weha veşartin di vî wêneyî de heye, “Tifenga rojekê heval” bi ramana hêmanên wefadarî û xebat ji bo welat dibe. “Naveguhêzin” anko bi soza xwe lê venabim. Bi van wêneyên veşartî yan veşartîna ciwanî ya helbesta xwe daye pêş çavê xwendevana.

3.9. Awazên Helbestê

Awaz yêk ji giringtirîn pêkhatên helbestê ye. Helbestvan hewl dide awazeka delal bide helbestê. Ji ber ku awaz te'm û xweşikbûnekê dide helbestê, hemû helbestvan hewla vê yekê dane. Vîyane helbesta xwe ji vê çendê bêpar nehiştine. Awaz dibin du beş.

3.9.1. Awaza Têgeh

Awazê gelek têgehî hemû cûr hene, li duv heme rengîya zimanî û dîyalêktan bi şewekê giştî di zimanan da cihê xwe girtîye. Her zimanekê digel gûncandina ziman û wêjeya xwe têgehek ji bo awaza helbesta xwe karîname. “Ji bo mînak di zimanê Îngilîzî de dibêjinê “Rhythm” û di zimanê ‘Erebî da jî dibêjinê “Elbeka'e” (Cemîl, 2009: 19).

Her wesa ti pirtûka Ezîz Gerdî de bi vî rengî behsa têgeha awazê kirîye. Awaza têgeh curbicur hene. Peyva “Rhythm” ya ji peyva “Rhythmos” hatîye wergirtin” (Gerdî, 1999: 71) li duv ziman û dîyalêktan her yekê peyvek li gor vî zaravî û zimanê xwe dest nîşan kirîye, ji bo awaza helbesta wêjeya xwe.

3.9.2. Awaza Derekî

Di helbesta nûxwazî de girîngî bi layenê Kêş û Serwayê nehatîye. Çi cûre kêş û serwayeka yêk kirtî rola xwe nabîne hindek car serwa bikarhatîye, lê merc nîne di helbesta nûxwazî de. Ku helbestên nûxwaz ji aliyê awaza derekî ve bê kêşan. Çûnko helbestvanên nûxwaz girîngî bi naverokê û hizirkinê didin û yaxîbûn li ser kêşa helbestê dikin.

Helbest awazê bi wê ramanê tê, ku dîyardek bi şewekê rêkxistî bide dubarekirin. Evca çî ew dîyarde wek keresteyekê zimanî be ji deng û peyv û risteyan. Di helbestê de awazê peywendîyeka yekser ya digel kêşê heye ta heta wê radeyê kêş dibe egerê duristkirina awaza helbestê bi taybetî helbestên kêşedar. Lê eve hemû şewên awaza navegire çunkî ne bi tenê awaze bi arîkarîya kêşê yan serwayê tê avakirin. Belkî awaze ji van her du regezan pêk tê parçeyek ji awazê pêk tê dibêjinê awaza derekî” (Nihêlî, 2013: 225). Anko kêş helbestê awaza derekî peyda dike, lê di helbesta nûxwaz de kêş nîne li mînakê jêr de, ev çende hatiye zelal kirin.

Ev helbesta em şîrovekirina awazê bo bikin helbesteka bê kêşe ye çunko ya nûxwazî ye. Her wekî me amaje pê da, girîngî layenê kêşeyê nahatîye dan. Lewra destnîşan kirina kêşeyê bo nayê encamdan lê tenê dê amajê bidine ewan “Yekeyên Awaz”ê ewên tê de tene bikaranîn. Ew jî bi rêya destnîşan kirina birgên wê bi vî rengî:

3.9.3. Ristên Helbestê, Hejmara Birga û Yekeyên Şî'rî.

Şe/vek/ta/rî/çi/ra/he/mî/ve/mir/yan/u/qet/geş/ne/bûn/ (16) birge (4+4+4+4)

Li/za/ro/kan/bû/gi/rî/u/qî/jî (10) birge (4+4+2)

Ji/bê/dev/mê/jî/ew/hiş/ne/bûn (9) birge (5+4)

Di/bê/jin/e/vê/şe/va/bi/ti/ris (10) birge (5+5)

Xur/a/lu/zî/ma/ne/bê/ti/ris (9) birge (4+5)

He/mî/dey/ka/hay/jê/ne/bûn (8) Birge (4+4)

Ji /xe/mên/gi/ran (5) birge (5)

Ji/xew/nu /xe/rî/bî/ya/u/mal/xu/wê/ya/na (13) birge (3+5+5)

Li/za/ro/kên/xwe/ra/ne/bûn (8) birge (4+4)

Şî/nu/gi/rî/bê/za/rî (7) birge (4+3)

Bi/bûn/re/şu/xê/za/şa/rî/u/e/wê/şe/vê (13) birge (4+4+5)

Wê/ta/rî/yê/gir/tî/ye/te/vê (9) birge (4+5)

Ji/ren/gê/çû/ren/ge/kê (7) birge (4+3) ... (Ebdullah, 2004a: 35).

Evan çend nîvrêzên vê helbeste, eger em temaşeyî hejmara birga bikin wekhev nînin. Lê eger berê xwe bidine yekeyên helbestê dibînin; 2, 3, 4, 5 ku gelek car yekeya 4 du car yan çar car hatîye dubare kirin. Dubarebûna van yekeyan bi xwe awazek ji bo helbestê çêkirîye. Sebaret awazên derekî yê helbestên nûxwaz. Dr

Nemetullah Nihêlî di pirtûka xwe de bo vê yekê wiha dibêje; bikarhatina yekeyên awazê û dubarebûna evan yekeyan bi xwe awazekê ji bo helbestê çêdikin” (Nihêlî, 2013: 233). Anko dubarebûna evan yekeyan bi xwe awaz ji bo helbestê çêkirîye.

Her wekî nivîskar û vekoler Şivan Qasim dibêje; di helbesta nûxwazî de pir girîngî bi naveroka helbestê hatîye dan. Lewra ji hêla şillî ve helbesta nûxwazî li gel helbestên berî xwe cudaye. Li alyê kêş û serwayê ve girîngîyaka pir pê nehatîye dan, helbestvanên nûxwaz zêdetir girîngî dane layenê naveroka helbestê. Mecalê hizirkirina helbestê li dev xwendevanan vekirye (Hevpeyvîn, Nêrweyî, 7. 3. 2019). Helbestvanên nûxwaz aliyê kêşa helbestê li cem wan girîng nebû her wekî di vê mînaka jor de dîyar dibe, hîç bihayek ji bo kêşê helbestê nedaye. Ku Hizirvan jî girîngî nedaye aliyê kêşa helbestê.

3.9.4. Ristên Wekhev û Hevdij

Helbet helbestvanê em li ser mînakên helbestê wî kar dikin, helbestvaneke nûxwaz e, her di derbarê vê çendê de, “dûbarebûna risteyên “Wek Hev” “Hev Dij” yek ji girîngtirîn bingeha nûxwazîyê ye, di helbestên nûxwaz de bingeheka bilind ji bo berz kirina bingeheên awaza derekî ye (Ziyab, 2005: 140). Her wesa helbestvanê navborî çûnko helbestvanekê nûxwaz e ev çende di nava helbestên wî de zelal derdikeve holê. Ev riste bi du awayan derdikeve.

- Ristên wek hev: ew ristene ku helbestvan birêka wan çend risteyekan dûbare dike, ji aliyê dariştinê weke yekin, ji aliyê semantîkê ve heman hizran zelal dike. Binyateka karîger e ji bo awaza helbesta mûwêxaz.

Mînak

...

Di nav rengan da hema tu çûy

Di nav bengan da hema tu çûy... (Ebdullah, 2010: 61)

Mînak

...

Hêza xwe ya jîyanê

Hêza xwe ya vêyanê... (Ebdullah, 2010: 195).

Her wekî me amajekirî di helbesta nûxwaz de, ev ristên hev terî bûne bingeha kêşa helbestên nûxwaz. Me jî mînakên Hizirvan bi van bingehên awaza nûxwaz anîye, wekî di van her du mînakên jor de bi zelalî awaza helbestê li jêr bingeha nûxwazîyê derdikeve holê.

- Ristên Hevdij: Her wekî ristê wekhev ji bo danana bingeha awazê dihê dúbare kirin ew ristên ji alîyê rengê dariştinê ve weke hev in. Ji alîyê sîmantîkê ve cûda ne û hevdijin, hev riste ji alîyê bingeha awazê ve ji ristê wekhev bihêztir û hunerîtirin. Ji bilî wek hevîya ristan hevdijî heye (Ziyab, 2005: 141). Anko ev hevdijîya risteyan ji bingehên awaza helbestên nûxwaze, di mînakên helbestên Hizirvan Ebdullah da ev bingeha awazê zelal dibe.

Mînak

...

Gerim tê were

Sar tê were... (Ebdullah, 2004b: 52).

Mînak

...

Ey rastirîn hebûn

Direwirrîn Aşop... (Ebdullah, 2010: 83).

Di van her du mînakên Hizirvan Ebdullah li ser bingeha awaza helbestên nûxwaz. Risteyên hevdij bi zelalî derdikevin holê. Eve jî bingehên awazên helbesta nûxwaze.

3.10. Awaza Navekî

Awaza navekî yek ji wan pêkhênerên girîng ên helbestê ne. Bi dema ewan valahîya radibe, ew ji encama awaza derekî durist dike. Bi taybetî di wan helbestên

bê kêş dy, ji bo dest nîşankirina awaza navekî ya helbestê em pêdivî bi çend mekanizmanên wekî dubarekirina “Deng û Peyvan” dibînin

Sebaret bingeha awazê di pirtûka Dr. Mohemed Bekir hatiye awaza fonêman “Rêkxistina Dengan” di asta awaza fonêmî de, fonêm beşdarîyê di rêkxistina hinek peyvên rista helbestê dike. Ev pêngave bi merema qerebûya hevdengîya serwayê dihête encamdan” (Bekir, 2004: 83). Ku bi van rengan dîyar dibe:

- **cût hevdengên yek girtî dema du fonem**, dû birgên hevdengê êkgirtî, wekî êk (A+B/A+B) yanjîk cûday wê (A+B/B+A) dîyar dibin (Mohemd Bekir,2004:83).

- **Wekeyek**

Mînak

...

Ew rojên bihên, tu bidomatan nakirî

Pencereyên xwe... (Ebdullah, 2010: 210).

(Ê+N/Ê+N)

Mînak

...

Li xwe geryan, berzebûnek diregê sor da

Şev bi serda dihêt (Ebdullah, 2010: 61).

(D+A/D+A)

- **Hevdij**

Mînak

...

Bo kuştina afrandina di birsîne

Gundê me, erê dîsanê gundê me... (Ebdullah, 1996: 31).

(N+A/A+N)

Mînak

...

Heyrana silo pê dibêjît xewnek reşe
Silo ji daybûye bi nezanî (Ebdullah,1996:84)
(E+Y/Y+E)

- **Cût hevdengên da jêkbebûy:** Dema du fonemên hevdeng, du birgeyên jêkve bûyî, wekî yek yan jî hevdijî yek dubare bibin” (Bekir, 2004: 86).

- **Wekeyek**

Mînak

...

Gişt hevûkên hevçandî... (Ebdullah, 2004d: 61).

(H+V/H+V)

Mînak

...

Serbûra sergerekê kurd... (Ebdullah, 2004d: 61).

(S+R/S+R)

- **Hevdij**

Mînak

...

Zerya û rezyan me nêgir û peya paxçe pênatok bû... (Ebdullah, 2004c: 77).

(Z+R/R+Z)

- **Dûbarebûna peyva “Asoy, Sitûnî”** di helbesta nûxwaz de pir caran hinek peyv û dûbarebûna wan beşdarîyê di rîtma helbestê de dikin (Ziyab, 2005: 139). Anko di helbesta nûxwaz de ev dûbarebûna peyvan bûye awaza helbestên wan. Me di vê teza xwe de ji bo vê yekê mînak ji helbestên Ebdullah wergirtine.

Asoy:

Mînak

...

Lî nav bera befrê û befrê her kuştine... (Ebdullah, 2004c: 58).

Di vê nîvrêza helbestê de peyva “Befrê” bi rengê asoy dûbare dibe.

Mînak

Befre, befre şeva tarî

Şeve, şeve befir barî... (Ebdullah, 2004b: 53).

Divan nîvrêzan de peyva “Befre” “Şeve” bi renekê asoy dûbare dibin

Sitûnî:

Demê peyv di risteyekê da yan di çendîn risteyên helbestê de bi renekê “Sitûnî” dûbare bît.

Mînak

Me dizanî, gi stranan virda, her asmane

Me dizanî, ji stranên wirda, her asmane

Me dizanî, qûrbane cejin bi karesa te... (Ebdullah, 2010: 176).

Di vê helbestê de peyva “Dizanî” bi reneke sitûnî sê caran dûbare bûye, peyvên “Sitêr” “Asman” bi reneke sitûnî her yek dû caran dûbarebûne.

Mînak

...

Li bin pencereyê kuştin

Li bişt pencerê dibine bikuş (Ebdullah, 2005: 150).

Di vê helbestê de peyva “pencere” bi rengê sitûnî hatîye dûbarekirin.

3.11. Serwa (Qafiye)

Di helbestên kevin de serwa yek ji bingehîya herî giring ya helbestê ye. Helbestvanên kevin li ser wan lazim bû serwayeka hev girtî di helbestê de hebe. Lê di helbesta nûxwaz de û helbestvanên nûxwaz bi dilê xwe serwa bikaranîne. Di helbesta nûxwaz da merc nîne, helbestvan dişên bikarbîne yan jî na.

Bi têgehên arûzê serwa bi vî rengî hatîye pênasekirin “Serwa pêkhatîye bi hevbeşkirina du beytên helbestê yan zêdetir. Li du herfan de anko ji du dêran yan zêdetir. Dumahîkê pîtek yan du wek yek bin” (Abdullwahîd, 2006: 124). Anko li pêy têgeha arûzê serwa bi vî şeweyî pênasekiriye ku du dêrbîn yan zêdetir herfa dumahîyê wek yek bin.

Dr. Marif Xeznedar di derbarê serwayê de wiha dibêje; bi vî rengî serwa pênasekiriye, ewe ku dêrên helbestê bi peyvekê dumahî be. Ew peyv ji layê kêş û awazê wek yek nebin. Bi binê her du herfên dumahîka wan wekî yêk bin, dibêjinê serwa” (Uremarî, 2004: 67).

Di nav helbesta klasîk de kêşa arûzî “Serwa Sitûnî” ya girîng e. Anko di nav helbesta kevin de serwa binemayekê herî girîng e, renga bi serwayê helbesta arûzî û yê din ji yêk bêne cudakirin. “Ev qafîye dumahî dêrên arûzî destnîşan dike, vêca çî curê hebe ya yêkgirtî be yan “Cot Serwa” be. Helbestvan neçar bû ew merema wî vîya derbirînê jî bike beramber sinorê serwayê, raweste zêdebarî hindê li gel serwa tefî’da helbestê bi dumahî bîne. Di helbesta nûxwazî de kar bi serwayê nehate kirin. Helbesta nûxwaz bi têgehên arûzî hate derkirin, ew tê nebe hinek car rêzên helbestê de derbikeve. Belê ne serwa ye ka hunerî û rêkevtîye û arîkare ji bo xemladin û arastekirina rîtma navxweyî û bi hizkirina wê” (Nûrî, 2011: 220). Anko di helbesta nûxwazî de bi temamî cudaye digel helbesta arûzî, helbesta arûzî bi kêş û serwayeka yêkgirtî hate nivîsîn. Lê helbesta nûxwazî girîngî bi layanê kêş û serwayê nedaye her wekî ji navê wê dîyar pexşane helbestê, yan helbesta serbest.

Serwaya bi rengê arûzî anko helbesta klasîk bikaranîye. Çunko di helbesta nûxwaz de serwayê çî rolê xwe nîne bi piranî li dumahîya helbestê herfên curûcur hatîne.

Mînak:

...

Were ey merig were (e)

Bê wê, direwe jîyan xewn direw (w)

Jan hene jan! bê wê (ê)

Di çin li pê wê teva tiştên rind û bedew (w)

Bê wê, hene birîn! birînên kur (r)

Li hindir, hindî devê xencerê (ê)

Kîjan robar ser evraz çû, ger ba te be (t)

Bê wê, birîn hene kevnar (r)

Temet kevnariya çaxên berê (ê)

Were ey merig! dê wer (r)
Li vir, hema bi xwe ra bibe canî (î)
Pelîn kîjan darê ji bejna darek din deweşît (t)
Ji bo zaxa axê bila birizît ceste (e)
Dizanim can dubare tê geverê (ê)... (Ebdullah, 2014: 155).

Mînak

...

Pişkek ji hebûna minî (î)
U ji ber te min derî vekir û hişt (t)
Ji ber gutinê (ê)
Di nava rûpelê xwe jê qurmiçî da (a)
Bêzarim (m). (Ebdullah, 2010: 92).

Di van her du helbestên Ebdullah de wekî ya dîyar çî bihayek ji bo serwayê nehatîye dayîn. Her di binyat da nebikaranîye belkî serwayeka rengawreng di nav helbestên xwe de bercestekirîye, helbesta nûxwaz berovajî ya klasîk layenê watayê li ser ciwanî formî baştir zanîye. Di pirtûka Abdullqadir Nûrî de di derbarê vê yekê de wiha tê gotin; helbestvanê nûxwaz cûda ji ya kilasîk alîyê wateyê li ser alîyê xweşîkbûnê xistîye (Nûrî, 2011: 222) ku di helbestên nûxwaz de giringî bi alîyê serwa û şiklê helbestê nehatiye dayîn. Belko nûxwazan giringî daye wateya helbestê û pirrwateyîyê li cem xwendekaran.

Mînak:

Şîrîn nubûn dêmê de da ya xuyaye u ya digehî (hî)
Gelek ji mêje min pir hewdan ji bo te kirin (rin)
Lê di tirsîyam aşkira kem (em)
Min gut ne ku di destên min da tu bi behî (hî)
Lê vê gavê min bawer, aşkira bûn gelek ya fere (re)
Çûnkî ji bo afrandina tu fêrgehî (hî)... (Ebdullah, 2004c: 55).

Mînak :

...

Ez neşêm ji bo her rudanekê bigrîm (îm)
Heta tîna min dawêşt (ît)
Lê şîyana min bi hêzeka efsaneyê (ye)
Ez hest bi xweşîyeka nihên dikem (em)
Bi evê berizbûna xwe bi serbestî (tî)
Paristgeha min pêtkeka vodkanê ye (ye)... (Ebdullah, 2005: 184).

Ji ber ku helbestvanên nûxwaz xwe bi formê ve girênedaye zêdetir mijûlî geheadina hizra babetî bûn. Lewma şiklê helbestê wek helbesta klasîk nebûye. Bi azadane li ser laperî helbestê dariştîye. Çi yasayeke qeytkirî li berahîyê nebûn. Helbestvanê nûxwaz vîyan helbesta wan bi hizirkirineka berfireh li def xwendevan durist bikin. Hizirvan yek ji wan helbestvanê nûxwaz e ku helbestên wî bi vî awayî bûn yê amaje bi wan hate kirin.

Her wekî amaje pê hatî kirin, di helbesta nûxwazî da serwa merc nîne. Lê ku di helbestên nûxwazî de bi girîngî ne wergirtin ya jî bi şewekê bêserûber bikaranîye. Lê zehmet e were gotn ku wî serwa qet bikarneanîye, çunko di hinek nîvrêzên helbesta Ebdullah da dîyar dibe.

Mînak:

Devê merê, deskê merê (ê)
Digel miruvî û digel zeverê (ê)
Eger ne bit êk digel axê nekin şerê (ê)
Berhemek nû nahêt gerê (ê) (Ebdullah, 2004c: 63).

Her wekî amaje pê hat kirin di helbesta nûxwazî de serwa merc nîne. Dişê bihê dişê nehînin, helbestvanê nûxwaz zêdetir girîngî bi layenê “Formê Helbestê” nedaye, vîyaye mecalê hizrkirineka berfireh li def xwendevanî durist bike. Layenê naverokê girîngtir bû ji yên şiklî. Her weha Ebdullah ku helbestvaneke nûxwaz e wî jî wek hevalên xwe girîngî daye naveroka helbestê.

Her sebarete vê çendê rexnegir, vekoler Şivan Qasim di derbarê serwaya helbestên Ebdullah de dibêje; di nava helbestên Hizirvan de girîngî bi alîyê serwayê

nehatîye dan. Girîngî zêdetir bi naverokê hatiye dayîn ku ev taybetmendiya herî berça ya helbestvanên nûxwaz e. Belê navborî di hinek parçeyên helbestê de serwa bikarîname, eve wê çendê nagehîne ku “Serwa” girînge di helbesta nûxwazî de. Belko merc nîne helbestvan li gor dilê xwe destkarîya Serwaya helbestê diki” (Nêrweyî, 25.7. 2019). Di hinek parçe helbestan de serwa bikarnameyê di hinekan de jî bi şêweyeke bê ser û ber cih daye serwaye. Lê di hinek parçên helbesta wî de serwa tê dîtîn. Raste li def helbestvan ya girîng nebû, lê hindek cihan tê dîyar kirin. Lê cudahî ya li vêrê di helbesta arûzî de helbestvan neçar bû bi serwaka rêkxistî di helbestê da serwa xwe darêjîn. Di ya nûxwazî de merc nîne, helbestvanê nûxwaz azad bike û bi bikarbîne, belkî jî ne.

3.12. Xalbendî

Eger em bi giştî temaşeyî helbesta nûxwazîyê bikin, bi taybetî ya Ebdullah em dişên helbesta nûxwaz cuda bikin ji helbesta kevin. Ew jî bi rêya xalbendîyê. Helbestvanê nûxwaz her dem bizav kirine ku helbesta xwe bi şêwekê wisa darêjin ku mecala hizirkirneka berfireh li def xwendevan durist bikin. Her dem birsyar û seyîrbûna tiştî li def peydakin, ew jî bi arîkarîya xalbendîyê ye.

Her sebarete xalbendîyê di nava helbestên xwe de Ebdullah dibêje; xalbendî di nava berhemên min de tamam kirina peyvê ye. Çûnko helbestê de eger bê raman be, nabe helbestvan bikarbîne. Pir caran jî min berhemên hevalan dîtine xalbendî danaye lê cihê xalbendîyê nîne, dê bo çi bihête danan eger çû merem li pişt nebin. Lê xalbendîya helbestên min li cihê wateyê hatene danan, eger raman di wan xalbendîyan de nebe çima dêdanim (Hevpeyvîn, Ebdullah, 20. 8. 2019). Anko di nava helbestên navborî de xalbendî li cihê ramanê hatîye danan, her wesa xwastîye mecala hizirkirinê li dev xwendekaran çêbike bi rêya van xalbendîyan, ev yek di vê mînaka jêr de dê pitir zelal bibe.

Mînak:

...

Di zêt û ve di zêt..!

Di kêt û ve di kêt...!

Têşka di înit...!

Mêşka di înit...!

Bîjî ya di înit...! ... (Ebdullah, 1996: 28).

Di van çend rêzên helbesta Hizirvan Ebdullah de, helbesta nûxwaz bi xwe mijawîya xwendevan naşê bi hêsanî, nagehe mebesta sereke ya helbestvan. Li vêrê bi rêya xalbendîyê bi taybetî xalbendî ya “Te'ecub û sê xalên li dûvhev” ku helbestvan vîyaye li mêjîyê xwendevan da valahîyekê çêke. Da hizir bike wekî“...!” xalbendîya “Te'ecub” ku ramanek ya li pişt. Bi vî rengî tê berçavê xwendevan, her yek bi rengekê hizir bike, eva li mêjîyê wî de tarêjît boçûna xwe li ser helbestê bide.

3.13. Topogirafi

Di helbestên kevin de helbestvan neçar bû li pêy hinek yasa û destûrên topogirafiya wê li ser binemayê qalibên çarîn, pêncîn hwd. biçe. Lê di helbesta nûxwazî de bi temamî cuda û cudatire ji ya kevin ku helbestvan tu yasa û destûrên taybet bi helbestê ve nîne. Topogirafiya helbestê bi şewekê azadane serederî gel kirîye, nîvrêzên wê û sitûnên wê bi keyfa dilê xwe rêzkirîye li ser rûpelê. Her wekî di vê nimûna Hizirvan Ebdullah da ji dîyar dibe.

Nivîskar û rexnegir Abdurehman Bamernî dibêje; di helbestên nûxwaz de “Topogirafi” ya helbestê girîng nîne. Giringî daye alîyê naveroka helbestê. Alîyê hizrî û yaxîbûn tê dê bihêz kiriye, ji ber ku wan naverok girîngtir didît ji şiklê helbestê (Hevpeyvîn, Bamernî, 2. 8. 2019). Anko şiklê helbestê li cem nûxwazan girîng nebû wan layanê hizrî bihêz kir. Helbestvanê ku xebata me li ser mînakên helbestê wî ye yek ji helbestvanên nûxwaz e, ewî jî sitûna helbestê şikandîye li ser çû yasayên helbesta kevin neçûye.

Mînak:

Karwan bîyav bire

Wê sala baran ne barî

Min bakir karwanî

Lezê

Berê karwanê avîndar

Min da bû wê rojadîndar
Ne roja ezê

Dînekê nû, neyê kevnar

Û lê pêşda çûn

Li bezê

Bû behîştê şaristanê

Evînistanê

Mirov êk peristinê

Me Sêtranek hulê digut

Evîn be tu

Da evîn ji te ra bibe heval

Şureşeka ji dil bike

Bi xebite li şeveka tarî...

Roja zelal

Umêdên xwe ne mirîne

Da bi gehî

Narîneka şûx û şepal

Em hû di bîbin

Em her diçin

Madem çûn ya berdewa me

Dê her gehîn (Ebdullah, 2004a: 59).

Eger em temaşeyî vê parça helbesta mamoste Hızırvan Ebdullah bikin, tê dîtîn ji hêla topogirafiyê ve ku helbestvan li duv çî yasa û destûrên taybet neçûye. Bi şêwekê azadanê serederî digel “Topogirafî û Sitûna” helbestê kirîye. Bi keyfa dilê xwe li ser rûpelê nivîsîye. Sitûna helbestê ji şikandîye wek “lezê, neroja ezê, li bezê, roja zelal, em her diçin, di her gehîn” bi vî rengî ev nîvrêze ji sitûnê ladane û sitûna helbestê şikandîye. Eve ji bi temamî cudaye digel “Helbesta Kevin Şikil û Sitûnî” ya helbestê girîng bû. Merc bû divîya peyrew kiriba. Lê di helbestên nûxwazî de merc nîne, her wekî ji navê wê jî diyare êdî dem dema “Helbesta Serbest” e.

3.14. Binyatên Hizrî

Di helbestên nûxwaz de, ji hêla hizirkirinê ve di helbestên wan de hizir an jî peyama sereke zelal nîne. Wekî berê amaje pê hatkirin di nava helbestên nûxwaz şêlî bûnek li ser hizira sereke ya babetê helbestê heye û xwendevan bi hêsanî nikare bigehe armanca serekî ya helbestvanan, eve yeke ji bingeha naveroka helbesta nûxwaz tê. Di helbesta berê de tenê fikrek an jî peyamek hebû ku hemû helbest li dor wê dihat sazkirin. Lê di ya nû de êdî tenê navendek nîne bo helbestê, helbestvan di helbesta xwe de dikare li dor çend fikr û peyaman here û were. An jî dikare qet li ser peyameke diyar jî nenivîse helbesta xwe.

Ne zelalbûna hizrê di helbestê nûxwaz de ev çend ji bo wê yekê ye ku xwendevanê helbestê beşdar bibe di avakirina hizra helbestê de. Eve ji ber tevlihevîya arîşeyên abûrî û sîyasî... hwd dibe sedema nûxwazîyê. Ji ber hindê zehmete helbestvan yan nivîskar tevlihevîyên zehmetiyên jîyanê bi rêk û pêk serrastke. Eger bi rengekê ne zelalnebe” (Hesen, 2001: 68). Anko di nava helbestên nûxwaz de ne zelalbûna teksta helbestê heye û ev yek bi zanetî wisa dibe, eve jî armanca nivîskarên nûxwazîn hertim xastîye mecala hizirkinê li cem xandekaran veke, eve dibe eger ji bo bihêzbûna berhemên wan.

Tekstên helbestê nûxwaz pîranî ne zelalbûn ji alîyê naverokê ve heye, nûxwaz sebarett peyvendîya tekstî û xwendevana dibêjin; alîgirêr nûxwaz sebarett xwendevanan dibêjin, ku xwendevanê kêmm rewşenbîr hêza hindê ya mêşkî nîne, bikaribin hizrên helbestên me bi rastî û zelalî bibînin, heya wateya peyvên helbestê têbigehe (Hesen, 2001: 68). Nivîskarên nûxwaz weha difikirin ku xwendevaneke jêhatî nebe nagehe merema nivîsîna tekstên helbestên wan yê ji her hêlê ve nûxwaz.

Mînak

Du aşqin, êk çîya

Dêw evrekê tingijîye

Roj bînerêk entîkeye

Çend derkevît

Bi halê wan evîdaran girmijî ye... (Ebdullah, 2004d: 84).

Divê parçe helbestê de wateya wê zelal nîne, xwendekar nikare bigehe hizra sereke ya helbestê, ew hizra nivîskarê nûxwaz helbesta xwe dadirêje. Sebarete vê mînaka helbesta Hizirvan weko hemû helbestvanên nûxwaz, ne zelalbûn xiste di nava teksta xwe de, hizreka fireh li ser xwendina berhemên xwe çêkirîye. Her sebarete helbesta nûxwaz "ta ku mirov hemû hizr û bîrên resen nexîne bazineka gûmanê de neşê wan tiştê bêxite livîneka berçav de" (Findî, 1997: 35). Anko helbestvanê nûxwaz xwastîye hizra naveroka helbestê bêxine di gûmanê de da ku helbesteka vekirî be pitir xwendevan hizir di avakina helbestê de bikin.

3.15. Yaxîbûn (Rikberî)

3.15.1. Civakî

Wek dîyare ji kevinde di nav civaka Kurdewar de "Axa û Derebeg" hebûne. Ev çîna ha di jîyaneka xweş û rihet de dijîyan, li ser milên xelkê feqîr û bindest. Ev çende jî bûye cihê rexnegirtinê û yaxîbûnê li def helbestvanê nûxwaz. Yaxîbûn dijî vî urf û 'edetên civakî, di helbestên wan de ciheke girîng digre.

Her sebarete yaxîbûna helbestên nûxwaz di derbarê civakê de Abdûlqadir Nûrî dibêje, eger em berê xwe bidine helbestên helbestvanên kurd yê nûxwaz dê yaxîbûnê bi aşkerahî li cem wan bînîn. Bi taybetî divnaveroka helbestên wan de, eve wê çendê derdixê holê ku yaxîbûn li ser şiklê helbestê nehatîye kirin. Ev yaxîbûn di gel giranî û zehmetîya jîyanê û nexweşbûna bihna civakî peyda bû (Nûrî, 2011: 162). Helbestvanên nûxwaz pitir nêzîkî civaka xwe bûne, arîşeyên civakî li ber çavê wan de derbaz dibe. Hest pê dikin civaka wan di kevnatîyan de toz girtî ye, hinek urfu û adet bûne cihê nerihetîya wan. Yaxîbûn li hember civaka xwe girtîne. Helbestvan Hizirvan Ebdullah yek ji helbestvanê nûxwaz e, ew jî yaxîbûna civakî di nava helbestên xwe de derxistîye holê.

Her sebarete yaxîbûna civakî helbestvan Hizirvan Ebdullah weha dibêje; yaxîbûna civakî di nava helbestên min de, min xwastîye civaka xwe hûşar bikim, ji hinek alîyên şaş û wan kevnatîyên bûne kirim di nava civakê de. Û wan urf û adetên şaş lê yaxîbûme, ji wê şaşîya kevin berev tiştê baş û serdemyane, di ger roja me hevbigre. Yaxîbûna helbestên min li ser civakê alîyên cûda cûda bi xweve digire

wekî yaxîbûna li dijî zûlma axa, derebegan û qat kirina açqeka pîroza navbera kiç û kuran de ...hwd pitirîya yaxîbûna civakî li ser van babetan bûye (Hizirvan Ebdullah, 20, 8, 2019). Helbestvanê navborî wekî hemû helbestvanê nûxwaz ji alîyê civakî yaxîbûnê di nava helbestên wî de rengvedaye. Li jêrê alîyê yaxîbûna civakî ya helbestên nûxwaz ya helbestên Ebdullah dê were zelal kirin.

Mînak:

...

Di serê min da rubarek û aşek avê

Ew çi mêrin, biwêrin hevranê xwe li dîkin

Ezmanê min peyvên ciwan yê ji bîr kirin

Çavên min di pasêda yê bûne neşter ... (Ebdullah. 2005: 142).

Di vê parçe helbestê de helbestvan yaxîbûna xwe li beramber civakê wek dijayetiya bo “urf û “edet û derebegan” dide nîşandan. Ew tiştên li civak û li bajarê wî dihêne kirin helbestvan yaxî dike. Her wekî sîstemê axa û derebegan gelek zordarî li ser xelkê hejar û belengaz kirine. Van kesan bi çîna hejaran bê beramber, ev hemû tiş helbestvan narihet dîkin û dîkin ku yaxî bibe li dijî nerîta civakê.

Helbestvan bankirina yaxîbûnê û guherîneka berdewam ji hemû alîyên civakî ve dîkit” (Ziyab, 2005: 112). Her wekî helbestvan derbarê yaxîbûna civakî dibêje; “Ew çi mêrin, biwêrin hevranê xwe li dîkin. Ezmanê min peyvên ciwan yê ji bîrkirin. Çavên min di pasê da yê bûne nişter”. Li vêrê behsa derebega dike, her di tişteke bixwazin dîkin, diwêrin bê ku hesabekê ji bo xelkê bikin. Dîyar dike “zimanê min peyvên ciwan jibîr kirin”. Anko axaftineka min nîne bêjim wan û zimanê min li ber wan nagere. Her wekî newêrim li gel wan biaxivim, dixwaze ew tîrsa li ser zimanê wî rabibe, yaxîbûna xwe li hember rewşa civakî derbike.

Wiha dîyar dike “çavêt min bûne neşter, min jî yê tîrs û westîyayîn” ku xelk newêrin zilma wan bidine dîyarkirin. Di vê parçe helbestê de bi vî şeweyî yaxîbûnê û rexneyê li beramber urf û ‘edetên civakî digre. Ew dixwaze komelga yeksan be, ev e’det nemînin, çîna navîn û navend û nizim bi yek rêz bêjin, bê ku neheqî li ser çîne xwarê bê sepandin.

Mînak:

Revîn ji sîbera xwe
Piştî min xandî çîroka Memê û Zînê
Min sond xaribû digel çu zerya ne bim sergêrê evînê
...
Li vêrê ezim ku disojim!!
Kanê ye tu. Şerme revîn sêrînê (Ebdullah, 2004c: 56).

Di vê parçe helbestê de, helbestvan derbirînê ji yaxîbûna civakî dike. Piştî ew zilma bi serê “Mem û Zînê” hatîye bi wê eşq û mihebetê hez hev du kirin. Negîhiştin hev du ji ber ’edetên civakî, birayê “Zîn”ê Mîr e. Axaftina wî nayê şikandin. Ew bi vê hêza xwe biryar dide û “Zînê” nade “Memo” ji alîye din ve fesadiya Beko tê nav. Ji ber van urf û ’edetên helbestvan “dibejin hindî ev çirok bîra min be, ez nakim evîne” “ez im disojim kanê tu ...hwd. Anko ez bûme qurbanîya van urfên civkî. Li vêrê beramber van tiştan yaxîbûye û rexne lê girtîye.

Mînak:

...
Birêya xwe diçûm
Te çeper li pêşîya min da na û vekirin ... (Ebdullah, 2012: 140).

Şirovekirina vê parçê, helbestvan di vê helbesta xwe de rexne û yaxî bûye li dijî rêgirtinên civakî û komelgehî. Her tiştê ku wî digo li naxê xwe bîne der, behs lê bike rêgirî lê tê kirin. Civak teqebûla nûxwazîyê nake, her wekî dibêje “li pêşîya xwe diçûm te rêgirî min kir û varêkirim”. Anko ya min dixwast li ser biçim rêgir li min tê kirin bi vî şêweyî derbirînê ji yaxîbûna dijî komelgehî û civakî dike.

Mînak:

...
Gundê me çar mal û nîvin
Pênc axa dihên û di pêçin
Çendî kirin, birin, xwarin
Jar li qada xwe bê şîvin ... (Ebdullah, 2004: 24).

Di vê helbestê de “hêma û ceveng” hatîne bikaranîn. Helbestvan êş û azarên milletê xwe û civaka xwe bikaranîne pêş bi hindêk hêmayan va û her weha yaxîbûye, ji axa ya ku di rojên dijwar destê hejaran bigrin.

Di van çen nîv rêzên helbesta Hizirvan de ev tişit bi aşkerahî zelal dibe. Yaxîyê ji axa dike, dibêje li “gundekî de çar mal û nîv hebin, pênc axa ne” ku axa li ser hesaba hejaran û feqîran dijîn nan û qutê wan dixwin. Hem dilsûtineke hember feqîran bo êş û azarên wan. Navborî yaxîbûnekê digre beramber “axa û desthilatdaran” digel çîne nizim harîkar bin û di rojên zehmet de wan ji bîr nekin.

3.15.2. Derûnî

Vekolîna li layenê derûnîya mirov ne hêsan e, çunkî mirov gîyandereke, vekolîn li ser girîng e. Mirovan du cîhan hene “cîhana hezpêkirinê û cîhana xwedî” anko di naxê xwe de. Pîta “Ne” di helbestên nûxwazan de nîşana yaxîbûnê ye ku helbestvan yaxîbûneka derûnî li def peyda dibe. Wê hesta derûnî ya xwe di hinek helbestên xwe de dane dîyarkirin. Ev çende bi xwendevan hêsan nabe bi temamî bigehêje wê çendê ya di nav naxê nivîskar de.

Li gor şîyanên xwe zanistî dê wê derûnîya helbestvan di nav helbestê de tîne şirovekirin wek “diltengî û hestên xemukî û dil narihetî weke tiris û turebunê û xemê hemû hilçûnên durist û vebirin”. Derbirîn ji wan alîyên bi rêyên şaş û nexweşîye peyda dikin” (Nûrî, 2011: 74). Helbestvanê nûxwaz hinek taybetî hene di nava helbestên xwe de bikaranîna wekî; hest, xemûkîya wî û dil narihetîya wî dibe gerê yaxîbûneka derûnî li cem helbestvan.

Mînak:

Kêvrûşkek di hesta min da hebû

Hezkirina min bû cîhaneka ciwan

Divêt tev cîhan aram bimînît

Da kêvrûşka min bête parastin

...

Da ku spêdahîyên qirmizî

Aram bi mînin... (Ebdullah, 2010: 80).

Di vê parçe helbestê de helbestvan çendek ji naxê xwe yan derûnê xwe behs bike wekî dibêje “kêvrûşka min” bi hêmanên derbirîna derûnê xwe bikaranîye. “Hezkirina min bu cîhaneke delale” ango dibêje ez dixwazim cîhan bi hezkirin be bi xweşikahî be, bi tenahî be. “Divê hemû cîyan aram bimîne ...hwd” em hemû xwe bi aram bigrîn da ku ev aramî ji bo me bimîne li vê nivîsandin wek çeveng bikaranîye ji bo aramîyê xweşî tenahîya jîyanê.

“Dilê min û hezkirina min her tim saza jîyanê dibeje da ku sipêdeyên qirmizî bi aram bimînin”. Hezkirina min ji bo jîyanê gazî dike û yaxîyê ji ne aramîyê digre. Da ev serpêhatîye bi rengê xwinê û nexweş bi hêmin bibin xelk bi xweşî û rihetî bijîn. Bi vî awayî ya di nav derûnê xwe de dîyar dike ku hezkirin e ji bo hemû cîhanê.

Mînak:

...

Bo min vexwand ser û sîmayê xewnekê

Got: kurê min. Şevêdî ne şevadî bû

Asman evir û nîvsahî bû

Li gundê me bédengî bû

Li bajarekê pirsêdare bû me mêvan

Li rojeka kore û tarî min kir giryan

...

Du ekteran perde kêşan

Çend demekê dur û dirêj axînkên min perde vedan

(Abdullah, 2004a: 29).

Helbestvan di vê parçe helbesta xwe da wisa vîyaye çendek ji êş û azarên kevin yê millet li nava sîngê xwe bike der. Yaxîbûneka derûnî ye, her wekî dibêje “dayka min ji bo min xwand ser û sîmayê xewnekê” behs li serpêhatî û tiştên borî bo min kirin.

"Li gundeke aram bûm li bajarekê pir sêdare bûme mêvan" anko em li gundekê aram û êmin dijîyan em ji ser gundê me rakirin şandin bajareke nexweş,

zêde zûlim li me kirin. Lê vêrê helbestvan yaxî bûye ji wan êş û azarên di naxê wî de derxistine. Her weha “du ekteran perde kêşan” li vêrê perde wek hêma û çevengê nexweşiyê bikaranîye.

Mînak:

Qey ji tirs a hindirê xwe

Tu bi dumatan na kirî

Prncerên xwe

Dibirî û havêye ber hetavê... (Ebdullah, 2010: 210)

Di van nîvrêzên helbesta Hizirvan Ebdullah de, yaxîbûn li derûna xwe girtî ye. Tirs li hember derûna xwe girtî ye, ew tişt a di hûndirê wî de, nikare bike de ji ber ko tirs li çend alîyan heye. Ev çende jî li dev helbestvan bûye cihê yaxîbûnê li hember derûniya xwe. Her wekî tamam dike ji tirs a hinek alîyan ewa ew dixwaze dikare bigehiyê. Eve jî dibe yaxîbûneka derûnî li hember wî bi xwe.

3.15.3. Sîyasî

Merem ji yaxîbûna sîyasî nerazîbûn û rexnegirtin e li desthilatê. Helbestvan wek kesayeteke ji nava civakê xwe ji rûdanên baş an jî yên xerab yên civakê berpirsyar dibîne lewre di helbestên wan de mirov rastî xem û kêfên civakî tê. Di helbestên nûxwaz de ev yaxîbûneka tê de derbaz bûye, lê bi şeweyek nixaftî yan perde kirî. Ev yaxîbûna me amaje pê kirîye di berî qonaxên serhildanê de bû, di wê demê xelk jîyaneka pir belengaz û zehmet diborand, zilmeke gelek zêde li ser Kurdên Îraqê hebû ji alîyê rejîma “Saddam”ve û gund hatin xirab kirin. Barê aborîya xelkê gelek nexweş bû mîlet koçberî welatên din bûn.

Evan hemû tişt karîgerî li helbestvan Hizirvan Ebdullah kirin ku yaxî bibe dijî wê zilma “Saddam” û hevalên wî li xelkê wî kirîye. “Ji ber ku mîletê Kurd li herêma Kurdên Îraqê dijîyan û rewşeka xirab û nexweş dijîyan. Rejîma wê serdemê bi hemû hêza xwe ve zilim li mîletî dikir, ji bo şilqadina her bizaveka azadîxwazîyê” (Nûrî, 2011:180). Anko hebestvanên nûxwaz yaxîbûna wan ya sîyasî, webû ye ew zilma li ser mîletê wan dihê kirin nemîne da ku bi aşî û hizûr bijîn, di nava yaxîbûna wan ya sîyasî de bizava gûherîna wê sîyaseta bi zûlim bi aşkerayî diyar dibe.

Mînak:

...

Cotîyar rêncber û zevî bûne xwindar

Ez ketin di nava tarîyê, min ne dîtin çû reng û deng ...

(Ebdullah, 2004c: 10).

Di parçe helbestê de helbestvan behs ji wan nexweşî û azarên bi serê welatê wî ve hatîne dîyar dike. Yaxîyeka sîyasî li hember vê rewşê bikaranîye her wekî dibêje; “cotîyar, rêncber û zevî bûne xûndar” ku miletê xwe bi şolker û xebatkar daye naskirin. Di vê risteyê de rewşa nexweş ya miletê bindest hejar ji neynika helbestvanî ve bo xwîneran diyar dibe. Li vir mebesta helbestvan ku rejîma “Saddam”, nahêle gund û bajar û xelk bi ewlehî bijîn, her dem gundîyan dikuşt û gundê wa talan kirine. Wê rejîmê wekî gurg dide dîyar kirin. Helbestvan serpehatîya wan êş û janên vegotîye li hember yaxî û aciz û dil nerihet bûye. Yaxîbûneka sîyasî li hember vê zordariyê girtîye. Ango peywira xwe ya civakî bi rêya nûnertiya civaka xwe aniye cih.

Mînak:

Ho Maryana perîya bîyaban û çîya

Xewna hajara, xewna bajarî û gundîya

Bûka germê û bûka bagerê

Şenge şuxa Espanîya

Perîya xûn reng

Tu şoreşa paşpezûxa

Dê were û zû bikeve rê

...

Ho Maryana piriç dibin kêl

Kevir dibin karîte û bejin di bin rêl

Rengên tarî

Ewan rengên xûn jê barî ... (Ebdullah, 2004b: 81).

Helbestên nûxwaz tevlihev in, raman û armancên gelek caran, nediyar, nîvco û tarî ne. Hizirvan Ebdullah ev helbesta xwe di sala 1987an de li Duhokê nivîsîye. Di wê demê de Kurdên Îraqê rastî nexweşî û zilim û zordarîyeke mezin tî. Her weha koçberî û awareyîyê karîgariyeke gelek mezin a xerab li jiyaan civakî kiriye, li vêrê helbestvan yaxîbûne dijî sîyaseta wê serdemê dike.

Di derbarê vê helbestê Hizirvan wiha dibêje; “Marîyana jineka qareman û çelenga Îspanîya bû, li dijî desthilata sitemkâr xebat kirîye. Paşî hatîye sêdaredan. Helbestvanê mezinê Îspanî “Lorkay” şanogerîyek bi navê “Bûka Xwunê” li ser nivîsandîye wek sîmbol ji bo xebata dijî zordarîyê karhatîye di nav helbestê da” (Hevpeyvîn, Ebdullah, 20. 8. 2019). Her dîsan yaxîbûn li hember sîyaseta cîhanê ku bêdeng dimîne. Çinko cîhan li hember şer û zilma li îspanyayê rû da bêdeng û bêhis ma. Her wekî bibêjîn “ho Marîyana hatina we fere”. Anko pêwîste bo hewla vê jinê em bêdeng nebin li ser vê zilma li wê û yê din tê kirin. Peyva “Ho Ho” di helbestê da dubare dibe, ev jî nîşana gazîkirineka dirêje ji bo dengê azadîyê bilind bike, ji bo hemû cîhanê.

ENCAM

Nêrînên cuda cuda li ser pênaseyên nûxwazîyê hene. Ji ber ku li gor hizr û bîra civakî, felsefî, mirovî hwd. Tê çespendin. Her kesek li gor hizr î zanîna xwe ya civakî û wêjeyî û felsefî û hwd. Pênaseyek jê re pêşkêş dike. Em dikarin bêjin ku nûxwazî li gel borîna jîyana mirovî û li gel borîna serdema di geşekirin û pêşveçûn û pêşkevtinê de ye.

Di vê lekolîna xwe de me qederek behsa edebiyata nûxwazîye kirîye û di destpêkê de pênase û nîqaşa li ser peyva modêrnîzm anko nûxwazîyê kirîye ji alîyê edebiyatê ve. Her weha di vê xebatê de tarîxa edebiyata nûxwazîye jî hatîye zelal kirin. Li cihê derketin û peydabûna wê ya li Ewropa û di nav ‘Ereban de jî hatîye zelal kirin.

Di tezê de hemû komên nûxwazîyê yên li deverên Kurdên Îraqê hatie nasandin û li ser wan agahî û nîqaş hatiye kirin. Yekem gruba edebî ya kurdan gruba Kerkûk Kifrî bû ku di sala 1970an de ava bû, divê were gotin ku gruba Rewange jî piştî wan bi çend mehan û di heman salê de ava bû û dest bi xebatên xwe kirin. Ji bilî van her du grubên destpêkê, gruba Wêran di sala 1994 û Nûxwaza Akrê û Nûkirina Her û Her di sala 1994an de hatîye damezrandin, li devera Behdînan li bajara Duhokê hatinê danasîn.

Helbesta nûxwaz ji helbestên beriya xwe ji gelek hêlan ve cudatir e. Her ji layê şiklî ve zimanekê nû paqij e û peyv û destewajên teze bikarhatîne, lêbelê di helbestên berî wê de ev tişt nehatine dîtin. Ji hêla topogirafîye û situna helbestê hatîye têkdan û wêne û rîtma awazek teze bû helbestê kêşaye. Ji hêla naverokê ve babetên helbesta nûxwazî tevlihev e ku mecalekê fireh bo xwendevan hêlaye pêdivî bi hizirkirineka zêde heye bo ku bigehêje armanca sereke ya nivîskar. Her weha yaxîbûn (rikber) di helbesta nûxwazî de bi şewekê berçav tê dîtin û yek ji binemayên wê ev yaxî ye çî ya şexsî çî jî ya civakî, derûnî, sîyasî be. Di helbesta nûxwazîyê de helbestvan yaxî û rexneyê li van layenan digire.

Helbesta nûxwaz rêxweşkerek e û paldereke ji bo berfirehkirina rexneya edebî. Pêşxistin û zêdekirina asta rewşebîrî “Nivîskar û Xwîner” zîndîkirin û berfirehkirina ewî zimanî di helbestê de tê nivîsîn.

Nivîskarên nûxwaz zimanêke natam û tevlihev bikartînin. Xwendevan nikare bi hêsanî ji armanca wan fêhm bike. Ji hêla bikaranîna peyvên de azad in û hemû awayên peyvên bikartînin yên wekî peyvên sade, ciwan, peyvên remzî hwd.

Li ser helbesta Hızirvan Ebdullah mirov ji bo encama binemayên nûxwazîyê dikare wiha bibeje.

Bikaranîna zimanê helbestê di nav helbestên Hızirvan Ebdullah de, bi şewekê serincrakêş û hunerî bûye, zêdetir helbesta xwe ber bi Kurdîyeke resen biriye û bo vê yekê hewl daye. Peyvên kêmnas bikaranîne û zimanekê mijdar e ku delaleta bihêzbûna zimanî ye. Her weha dana ber hevdana peyvên ku peyvên ciwan derêxistî ye û derfetê wan zimanê helbestên xwe xiwantir kiriye anko kiraseke cûda û bedew li helbestên xwe kiriye.

Di helbestên nûxwazî yên Hızirvan Ebdullah de wêneyên helbestî û hunerî di nav helbestê de bi rengekê ciwan û balkêş rakêşbûye. Her wekî me di nav teza xwe de dîyarkiribû wêne bi rêya zanista rewanbêjî çêkirine û helbest pê rengîn bûye.

Aheng û awaz di nav helbestên Hızirvan Ebdullah de bi şeweyeke ciwan û balkêş hatiye amade kirin. Her wekî di vê tezê de me ev awazê dîyar kiriye ku helbestên nûxwazî yên mamote jî bê kêşin, awaza derkî me nivîsîne û yekeyên şîrî aşkere kirye. Bi rêya dubarebûna van 3, 4, 5 yekeyan helbestvan awazeka derekî ya ciwan daye helbestên xwe bi rêya tek û cot fonemên asoyî û situnî awazeka navekî daye halbestên xwe ciwanî pexşan daye helbestê.

Hêma di helbestên Hızirvan Ebdullah de cihekî gelekî girîng digire. Gelek girîngî daye hêmayê û hêmayên delal dane helbestên xwe, gelek cureyên hêmayê hene wekî; efsane, siruşt û folklor hwd. Ev hêma bûne egerê mijdarîya zimanî û berfireh kirina xwandinên hemereng ji bo tekistê helbestê. Helbestvan bi arîkarîya van hêmayan helbesta xwe bi hêz û dewlemed kiriye li berçavên xwendevan ku pêdivî bi hizirkirineke berfireh dibe. Heta ku bigêhêje armanca sereke ya helbestê.

Wekî me di helbestên Hizirvan Ebdulah de dît helbestvan jiyaneke pir bi zehmet û nexweşî derbaz kirîye û li hember wan nexweşî û derdeserîyên bi serê miletê wî hatine. Ew xem kovan hilgirtîne pê êşa ye, yaxîbûye ev yaxîbûne di nav helbestên wî de rengvedaye. Li rewşenbîriya devera xwe de bizavên berçav hebûne û yek ji damezrînerê koma nûkirina ‘Her û Her’ bû yaxî ji tiştên kevin ji girtîye.

Di helbesta nûxwaz de yaxîbûn yek ji binemayên wê ye bi şeweyeke nixaffî yaxîbûna li hember derûnê wî, ji hinek tiştê aciz dibe, yaxîyê ji dike. Yan jî ya civakî yan sîyasî, ew tiştên dibine egerê diltengîyê li dev helbestvanî di nav helbestên xwe de yaxîyê û rexneyê li wan digre. Hez nake ev kirdare dubare bibe, divê bê guherîn bo başîyê û baştir lêkirinê.

Li def Hizirvan Ebdullah yaxîbûn bi tenê ladan û ji navbirin û retkirina tiştê kevin bo ya nû nîne. Bo çakirina hizrên kevin pîrozkirina tiştê baş bû. Ewan hezin di nav derûnê wî de hene bo derbirînê jê bike bi rêya guherîna wan bo hezeke wisa ji layê civakê ve bihê pesend kirin.

Hizirvan Ebdullah yaxîbûneke civakî ya tund dijî bo wan nerîtên asteng in li hember guherînên pêwîst. Çinko nêrîtbi hêza xwe û karîgeriya xwe ya li ser civakê ve bi awayeke jixweber bûye eger ku civak pêşnekeve. Her weha kêmkirina bihayê mirovî zengînbûna cîhana bilind a derebegan û desthilatan li ser hisêba xelkê hejar jî mijarên ku Hizirvan rexne û yaxîbûn li wan girtiye. Her weha Hizirvan Ebdullah wekî her helbestvanekê nûxwaz helbestên xwe bi awayekê nû û şewekê nû nivîsandîye. Zimaneke hemreng û dewlemend, awazeka ciwan û wêne û hêmayên delal bexşandiye helbestên xwe, helbesta kevin li hêlekê hiştiye û helbesta nûxwaz avakiriye.

ÇAVKANÎ

1. Çavkanîyên Eslî

Ebdullah, Hızırvan (1989). *Ez û Agir*. Duhok: Çapxana Hewadis.

Ebdullah, Hızırvan (1996). *Di Kavlanê Xencerê Da Mirin Tê Ji Bîr Kanin*. Duhok: Pirojê Çapkirina Kitêbê Yê Zêrînê P.D.K.

Ebdullah, Hızırvan (1997). “Dîtineka Rîyalizmî Yan Zivrîn Berev Nizmîyê.” *Kovara Metîn*. (65): 31-41

Ebdullah, Hızırvan (2004a). *Pir Tiştên Berzebuy I*. Duhok: Çapxana Zana.

Ebdullah, Hızırvan (2004b). *Pir Tiştên Berzebuy II*. Duhok: Çapxana Zana.

Ebdullah, Hızırvan (2004c). *Pir Tiştên Berzebuy III*. Duhok: Çapxana Zana.

Ebdullah, Hızırvan (2004d). *Pir Tiştên Berzebuy IV*. Duhok: Çapxana Zana.

Ebdullah, Hızırvan (2005). “Kurtîyek Li Dûr Rewşenbîr û Rewşenbîrîyê”. *Kovara Metîn*: (136): 95-100

Ebdullah, Hızırvan (2005). *Azrandina Bendemanê*. Duhok: Çapxaneyê Hewar. Ji Weşanê Yekîtiya Nivîskarê Kurd.

Ebdullah, Hızırvan (2006). “Melayên Mizgeftan Ne Dibêdengin”. *Kovara Metîn*. (144): 46-55

Ebdullah, Hızırvan (2007). “Kartêkirina Peywendîyên Xêzanî Li Ser Asta Berdewamîya Nivêsinê”. *Rojnameya Behdînan*. (28):

Ebdullah, Hızırvan (2008). “Sitanderbûn Yan Jêkvebûn”. *Kovara Metîn*. (175): 158-162.

Ebdullah, Hızırvan (2009). “Dîwan”. *Kovara Peyv*. (Kovareka Rewşenbîrîye Yekîtiya Nivîskarê Kurd Tayê Duhok). (51): 194-195.

Ebdullah, Hızırvan (2010). *Firîn Di Pencere Da*. Duhok: Çapxana Hawar.

- Ebdullah, Hızirvan (2011). *Şûpên Rodika*. Duhok, Çapxana Hewar.
- Ebdullah, Hızirvan (2012). “Dîwan”. *Kovara Peyv*. (Kovareka Rewşenbîriye Yekîtiya Nivîskarên Kurd Tayê Duhok). *Hejmara Kovarê*. (59): 139-141.
- Ebdullah, Hızirvan (2013). “Dê Niştîmana Xwe Nazînim”. *Kovara Çavdêr*. (123): <https://en.calameo.com/read/00082123586500c749fd4>
- Ebdullah, Hızirvan (2013). “Dîwan”. *Kovara Peyv*. (Kovareka Rewşenbîriye Yekîtiya Nivîskarên Kurd Tayê Duhok). (64): 168-170.
- Ebdullah, Hızirvan (2014). “Dîwan”. *Kovara Peyv*. (Kovareka Rewşenbîriye Yekîtiya Nivîskarên Kurd Tayê Duhok). (67): 154-155.
- 2. Çavkanîyên Nivîskî**
- Akireyî, Şemal Ismaîl (2010). “Erê Helbesta Nûxwaz Ya Veqetîyaye Li Civakê Yan Berewajî”. *Kovara Bîyav*. (2): 172 -179
- Bamernî, Abdulrehman (2014). *Têkist û Şirûvekîrnêt Rexney*. Duhok: Çapxana Duhok.
- Bamernî, Abdulrehman (2015). “Rexne Li Ser Romani 13: Beşek Ji Dimenên Enfalê di Roman Şopên Rondikan da”. http://ebdulrehmanbamerni.blogspot.com/p/blog-page_20.html (Dîroka wergirtinê: 27. 8. 2019).
- Bêkes, Şêrko (2006). *Dîwanî Şêrko Bêkes*. Bergê Yekem (1980-1969). Çapa Duyem Silêmanî Kurdistan.
- Bekir, Muhemmed (2008). *Pexşane Şîrî Kurdî*. Hewlêr: Kitêbxaneya Berêwerayetî Giştî Roşenbîrî û Hunerî.
- Berwarî, Hîvî (2010). *Rêbazên Edebî*. Duhok: Weşanxaneya Hawar.
- Bradbury Malcolm-Macfarlane James (2008). *Modêrnîzim*. (Wergêr: Behzad Hewêzî). Hewlêr: Weşanxaneya Rojhilat.

- Camus, Albert (1983). *El-însan El-mutemerrîd*. Beyrut, Çapa 3 (Wergêr: Nehad Reza) Çapxana, El Menşûrat U'yodat.
- Camus, Albert (2011). *Mirovê Yaxî*. (Wergêr: Erselan Erdelanî). Silêmanî: Çapxaneyaya Genc.
- Cemîl, Mesûd Reşîd (2009). *Mêjûya Kêşnasîyê Di Hozana Kurdî De*. Duhok: Teza Lîsansa Bilinda Çapnebûyî). Duhok: Zankoya Duhokê.
- Cihanbeglu, Ramîn (2002). *Modernîte, Dêmkraî, Rewçenbîrî*. Hewlêr: Çapxana Wezareta Perwerde Hewlêr.
- Crockshank John, (1986). *Albert Camus we el-edeb el-Temerrûd Elqahîre*. (Tercume celal Eleş'irî). Qahîre. El-heyet El- Misrîye Elamet Lî-l-Kîtab.
- Dirûşma Komê, (1994). *Wêram*: (1): li ser bergê kovarê.
- Doskî, Tehsîn Îbrahîm (1998). “Nûxwazî Di Terazûyê De”. *Vejn*. Hejmar 11: 18-20
- Duhokî, Xelîl (2008). *Çend Estêrekî Geş Di Asmanê Helbesta Nû Ya Kurdî De*. Duhok: Hewar.
- Ehmed, Newzad (1994). “Wêran”. *Kûrdistanê Nûwê*. (859) : 3
- Elqazî, Faroq (1993). *Afaq el Temerrûd Qirait Neqdîyet fi-l tarîx el-Ewropî we-l 'Erebî El-Îslamî*, Beyrut: Dar el- Ereb.
- Eltikrîtî, Cemîl Nisîf (1990). *El Mezahîb el-Edebîye*. Bexdad: Dar Elşûun el Seqafîye.
- Emîn, Ebdulqadir (2005). *Du Çemkên Havîbûn û Yaxîbûnê Di Hozana Nûxwaz Ya Kurdî De*. Duhok: Weşanxaneyaya Hawar.
- Findî, Emîr (1997). “Livandina Eqlê Mirovê Kurd Berev Xandinaka Rexney”. *Kovara Metn*. (71): 33-37
- Gerdî, Ezîz (1999). *Kêşî Şî'rî Klasîkî Kurdî Û Berawrid Kirdin Li Gel Arûzî 'Erebî Û Kêşî Şî'rî Farisî Da*. Hewlêr: Wezareti Rewşenbîrî.
- Gerdî, Hesên (2004). *Binyatê Wênayê Hunerê li Şî'rî Kurdî da (1970-1991)*. Silêmanî: Dezgehê Serdem.

- Gulî, Ebdulqadir Nûrî (2011). *Yaxîbûn Dinav Hozana Nûxwaz A Kurdî De*. Duhok: Weşanxaneyê Xanî.
- Helmet, Letîf (1970). *Dîwan: Xûwa û Şare Biçukekeman*. Kerkûk: 47-48
- Helmet, Letîf (1973). *Dîwan: Helbesta Ledaykbûnêkîtir*: Silêmanî: 7-8
- Helmet, Letîf (1996). “Hevpeyvînek”. *Kovara Raman*. (3): 33-38
- Heme, Kerîm Heme Seîd (1986). *Dîdarî Şî'rî Klasîkî Kurdî*. Begdad: Dezgahî Rewşenbîrî û Belawkirina Kurdî.
- Hesen, Şadiman Qadir (2001). *Bizûvtinevey Riwange Le Şî'rî Nuwêy Kurdî De*, Silêmanî: Dezgeha Çap û Pexşa Serdem.
- Hesen, Şêrzad (2001). *Sitayîşî Edeb Komelê Gutar*: Hewlêr: Weşanxana Mardîn.
- Hiseynî, Seyid Riza (2006). *Qotabxane Edebîyekan*. Hewlêr: Çapxaney Wezarefî.
- Hîto, Arif (2012). *Stranên Koberhemê Şî'rî*. Hewlêr: Weşanên Mekteba Melbendîya Yekîtiya Nivîskaran.
- Hîto, Arif (2013). “Palewanê Revê Di Romana Şopên Rondika Da”. *Kovara Metîn*. (217): 176-205
- Hîto, Erşed Ebdulrehman (2012). *Dadaîzm Di Hozana Nûxwaza Kurdî De (1985-2003)*. Duhok: Weşanxaneyê Hawar.
- Hornby, A. S. (2010). *Oxford Advanced Learners Dictionary*. Oxford: Oxford University Press.
- Husên, Hîdad (2007). *Rêbaze Edebîyekan*. Hewlêr: Çapxaneyê Dezgeha Araz.
- Hûsên, Hîdad (2011). *Bizûtneweyî Rewange Şî'rî Havtekan û Heştekanî*. Hewlêr: Çapxaneyê Karû.
- Huseyn, Elî Tahir (2000). “Rêgey Riwange Le Nûwêgerî Şî'rî Kurdî Da”. (Nameya Masterê ya Çapnebûyî) Silêmanî: Zankoya Silêmanî.

- Îbrahîm Hesên, Mewlud Îbrahîm (2007). *Pêkhatayê Efsaney Kurdî*. Silêmanî: Çapxana Renc.
- Kerîm, Azad Abdullwahîd (2006). *Nûkirin Li Şî'rî Kurdî Da*. Kerkuk: Leqa Kerkuk Ya Yekîfîya Nivîskaran.
- Mîre, Ehmed Reşîd Mohemed (2008). “*Gorûp û Bizûtnewey Rewşenbîrî û Edebî Kurdîyekan Li Ser Komelgeha Kurdên Başur (1970-2003)*”. (Teza Masterê ya Çapnebûyî). Bexdad: Zankoya Bexdad.
- Mostefa, Rêzan Osman (1999). “Berawirdêk Le Nîwan Cumuculî Kovarî Rewange: Wêran û Raman”. *Kovara Raman*. (40):
- Nasir, Îman (2007). *Qesîde el Nesir Erebi el Texîr we'l-ixtîlaf*. Beyrût: Dar el-Întîşar el-Erebî.
- Navîşkî, Tehsîn (2002). *Dîwan*. Duhok: Çapxaneye Xebat.
- Nazê, Bavê (2012). *Ferhenga Têrmên Wêjeyî*. Duhok: Weşanxaneya Hawar.
- Necmedîn, Abdulselam (2011). *Zimanvanîya Tîor*: Hawlêr: Çapxaneya Hecî Hasên.
- Nêrweyî, Şivan Qasim (2018). *Mijar û Rêbazên Edebî*, Silêmanî: Weşanxaneya Genc.
- Nihêlî, Nîmetullah Hamid (2009). “Nûkirin Her û Her Ji Bilindahîyê Ber Bi Gûrê”. *Kovara Peyv* (51). 45-51 <https://en.calameo.com/read/0003445764a92b50f1f18>
- Nihêlî, Nîmetullah Hamid (2010). *Deravek Ji Rexnê Rexne û Vekolîn*. Duhok: Çapa Yekem, Weşanxaneya Hawar.
- Nihêlî, Nîmetullah Hamid (2013). *Piraktîzekirina Rexna Nû Ya Englo- Emrîkî Li Ser Têkstên Grupa Nûkirina Her û Her*. Duhok: Weşanxaneya Bedirxanîya.
- Nîpaledîn, Fazil (1990). *Estêrey Geş. Ferhengêkî Kurdî- 'Erebî Ye*. C. 2. Metbei El-Funûn.
- Nûreddîn, Hesên Cefer (2003). *Şiir et-Temerrud fî Esr el Ebasîyet*, Beyrût: Dar El Tabî'e Şirket Reşad Beris.

- Pîrbal, Ferhad (2005). *Pênc Kitêb û Nîv*, Silêmanî: Navenda Çapaxana Rojhelat.
- Pîrbal, Ferhat (2002). *Abdurehman Rehmî Hekkarî, Tazekirina Ş'ri kurdî û Dahênani Şano Le Edebî Kurdî De*, Duhok: Çapxana Wezaretê Perwerde.
- Resûl, Yadgar (2005). *Sîmayên Tazegerîyê*. Hewlêr: Weşanxana Wezaretê Perwerde.
- Reûf, Loqman (2009). *Binemakanî Moderne Le Şîrekanî Şêrko Bêkes Da*. Silêmanî: Çapxaney Dezgay Pexşî Serdem.
- Se'îdullah, Selam (1998). *Qamûsa Selaheddîn, Îngilîzî-Kurdî, Cild 1*. Çapxana Dareltehrîr.
- Sutan, Abdulxaliq (2005) "Romana Hêlên Sor Li Jêr Keçûça Rexnê". *Kovara Peyv* (29): 31-40.
- Şeleş, Elî (1994). *Et- Temerrûd el- Edeb Ed-Dîraset Fî Tecrubet Seyîd Qotb*. Beyrut: Darû'l-Şerq.
- Şurekayî, Ebdulwehab Elkeyalî (1979). *Mewzoe't el- Sîyaset*. C. 1. Merkez El-Hedise.
- Tehsîn Navişkê, (2012). "Qaramanê Hinêrber û Tiştên din Di Romana Şûpên Rondika". *Waar* (628):14
- Touraine, Alain (1998). *Al-Hadase* (Wergêr: Hatim Elcasim). Dimişq: Menşûrat Dar Elseqafet.
- Uremarî, Nizar (2004). *Xuwîn Di Hembêza Befrê Da*. Hewlêr: Çapxana Wezaretê Perwerdê.
- Weysî, Îmad (2003). "Çeveng Di Hozana Reyâlî De". Master. (Teza Masterê ya Çapnebûyî). Kolêja Adabê
- Xeyrî, Hanî (2006). *Bedir Şakir Sîyab Sewret E'şir û Merat El Mewit*. Dîmeşq: Dar El-Selam.
- Yusêf, Rêzan Şiwan (2012). *Hiyomanîzm Di Hozana Nû Ya Kurdî De*. Duhok: Weşanxaneyê Hawar.

Ziyab, Ebu Ubeyd Abdullah (2005). *Hozana Nûxwazî Li Dewera Behdînan*. Hewlêr: Çapxana Wezaretê Perwerdê.

Hevpeyvînên Rûbirû

Dr. Abdulqadir Nûrî, (Li Mala Wî). 17. 9. 2018.

Hizirvan Ebdullah, (Li Baregaya Kovara *Metîn*). 24.10. 2018.

Hizirvan Ebdullah, (Li Baregaya Kovara *Metîn*). 11. 11. 2018.

Hizirvan Ebdullah, (Li Baregaya Kovara *Metîn*). 5. 7. 2019.

Hizirvan Ebdullah, (Li Avahîya Pertûkxana Bedirxanîya). 5. 8. 2019.

Hizirvan Ebdullah, (Li Avahîya Pertûkxana Bedirxanîya). 20. 8. 2019.

Hizirvan Ebdullah, (Li Baregaya Kovara *Metîn*). 10. 7. 2019.

Dr. Kamuran Xelîl, (Li Avahîya Zankoya Zaxo). 16. 1. 2019.

Sivan Qasim, (Li Avahîya Zankoya Zaxo). 16. 1. 2019.

Abdullrehman Bamernî, Li Baregaya Kovara *Metîn*). 2. 8. 2019.

Sivan Qasim, Li Avahîya Zankoya Zaxo 7. 3. 2019.

Dr. Kamuran Xelîl, (Li Avahîya Zankoya Zaxo) 25. 7. 2019.

Sivan Qasim, (Li Avahîya Zankoya Zaxo) 25. 7. 2019.

Arif Hito, (Li Baregaya Kovara *Metîn*). 11. 7. 2019.

3. Bernameyên Televizyonî

Abdullah, Amanc (2018). “Ezmonî Qelemêk: Li Ser Romanê Hizirvan Abdullah.”

(Pêşkêşka: Amanc Abdullah). *Kûrdîstan Tv*. (10. 12 .2018). (Dîroka

Wergirtinê: 20. 08. 2019). <https://www.kurdistantv.net/ar/node/32859>

Abulrehman, Şîlan (2014). “Pirofile : Li Ser Jîtana Hizirvan”(Pêşkêşkar: Şîlan Abdulrehman). *Waar Tv*. (10.04.2014). (Dîroka Wergirtinê:17. 08. 2019).https://youtu.be/viF_GG79ZpM

Jasim, Ehmed (2016). “Dîdarên Nivêseran: Li Ser Hûnerê Taybetîyên Hizirvan”. (Pêşkêşkar: Ehmed Casim). *Waar Tv*. (13. 03. 2016). (Dîroka Wegirtinê: 17. 08. 2019). <https://youtu.be/easTXHmfeig>

Qehar, Helgurd (2018). “Sêryan: Li Ser Jîyana Hizirvan Abdullah.” (Pêşkêşkar: Helgurd Qehar). *Duhok Tv*. (23. 01. 2018). (Dîroka Wergirtinê: 2. 09. 2019).<https://youtu.be/TRIBTNFVAJU>

Qur’ana Pîroz

Komisyon (2010). Qur’ana Pîroz. (Amadekar: Süleyman Feyzullahoğlu). Bajêr: İstanbul. Weşanxane.yeni asya Gazetecilik Matbaacılık A.Ş.



VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü

LİSANSÜSTÜ TEZ ORJİNALLİK RAPORU

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
Yaşayan Diller Enstitüsü



14/10/2019

Tez Başlığı / Konusu

RENGVEDANA BINEMAYÊN NÛXWAZÎYÊ DI HELBESTÊN HIZIRVAN EBDULLAH DE

Yukarıda başlığı/konusu belirlenen tez çalışmamın Kapak sayfası, Giriş, Ana bölümler ve Sonuç bölümlerinden oluşan toplam 137 sayfalık kısmına ilişkin, 14/10/2019 tarihinde şahsım/tez danışmanım tarafından % 0 intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtreleme uygulanarak alınmış olan orijinallik raporuna göre, tezimin benzerlik oranı %0 (Yüzde Yedi) dir.

Uygulanan Filtreler Aşağıda Verilmiştir:

- Kabul ve onay sayfası hariç,
- Teşekkür hariç,
- İçindekiler hariç,
- Simge ve kısaltmalar hariç,
- Gereç ve yöntemler hariç,
- Kaynakça hariç,
- Alıntılar hariç,
- Tezden çıkan yayınlar hariç,
- 7 kelimedenden daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç (Limit match size to 7 words)

Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi Lisansüstü Tez Orijinallik Raporu Alınması ve Kullanılmasına İlişkin Yönergeyi İnceledim ve bu yönergede belirtilen azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içemediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Gereğini bilgilerinize arz ederim.

14/10/2019

Ramadhan Ameen Mohammed BANKI
Adı, Soyadı, İmza

Adı Soyadı : Ramadhan Ameen Mohammed BANKI
Öğrenci No : 17950001021
Anabilim Dalı : Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı
Programı : Örgün Eğitim
Statüsü : Y. Lisans Doktora

DANIŞMAN
Doç. Dr. Seyit Battal UĞURLU

14/10/2019

ENSTİTÜ ONAYI
UYGUNDUR

14/10/2019
Doç. Dr. Seyit Battal UĞURLU
Anabilim Dalı Başkanı